
# Ansîklopediya Zarokan



# Ansîklopediya Zarokan



apec forlag

# Ansîklopediya Zarokan

apec förlag

**Ansîklopediya Zarokan**

| Amadekarên orjînala vê pirtûkê | Amadekarên kurdiya vê pirtûkê |
|---|---|
| Sven Lidman | Alî Çîftçî |
| Tord Pramberg | Hesenê Metê |
| Hardy Hedman | Mahmûd Lewendî |
| Sten Pettersson | Amed Tîgrîs |
| Tord Nygren | Seyidxan Anter |
| | Lêhûrbûna zimên: Remzî Kerîm |

**Weşanxaneya APECê**
©Apec Förlag AB
Îdê: Sven Lidman
Wêne: Tord Nygren
Nivîs: Lars-Gunnar Larsson
Hardy Hedman
Pergala berg û rûpelan: APEC
Çap: Narayana Press / Danmark 2004
ISBN: 91-89675-32-0
©All foreign rights handled by
BonnierCarlsen Bokförlag, Stockholm
Lidman Production AB, Stockholm

## ÇEND GOTINÊN ME

Ev karê weke karên ansîklopediyan, karê dezgeh û nemaze dezgehên dewletan e. Dema ev kar ji bo zarok û xortan be, berpirsiyarî û hesasiyeta li ser jî girantir dibe. Bêguman ev Ansîklopediya Zarokan jî berpirsiyarî û hesasiyeteke welê di xwe de diguncîne. Em pê dizanin û me hay jê hebû.

Bi gotineke din heta ku ji destê me hat, me pedagojiya zarokan, etîmolojiya peyvan, hêsanî û estetîka hevokan dan ber xwe û ev kar welê pêk hanî.

Zanebûna tiştên di ansîklopediyekê de û faktayên li ser wan, ne tenê tiştên li welatê me an jî di zimanê me de ne, herweha tiştên dunyayî ne jî. Zehmetiya ku di karê vê ansîklopediyê de derket pêş me, ew tişt bûn ku belkî ne li welatê me hene û ne jî di zimanê me de.

Di amadekirina Ansîklopediya Zarokan de, ji bilî hemû ferhengên zimanê kurdî me ferhengên erebî, farisî, tirkî û ewropî jî dan ber xwe ku em nekevin çewtiyeke faktayî. Me li gor gotinên zimanê kurdî peyva herî hêsan hilbijart ku biçûkên me jî bi hêsanî bi lêv bikin. Weke agahiyeke zêde jî di hevokên dawîn de me da zanîn ku li hinek navçe û deverên welatê me jê re tiştekî din jî dibêjin û me ew tişt jî nivîsand.

Ev Ansîklopediya Zarokan îro wergeriyaye gelek zimanên din jî. Însîyatîfa hemû kar, çap û weşandina Ansîklopediya Zarokan, weşanxaneya APECê û xwediyê wê Alî Çiftçî xwe daye ber. Weke redaksiyon me jî karê wê da ber xwe. Di karê Ansîklopediya Zarokan de me peyv bi peyv rasterast wernegerandiye. Me mijara peyv û gotinên di ansîklopediyê de bi zarekî kurmancî raxistiye û ji nû ve nivisandiye. Herweha me çend nav û gotinên xwe yên kurdî jî lê zêde kirine ku reng û lezeteke kurdî bide biçûkên me: weke Newroz, kew, bilûr, sîsalekên gurî, ala kurdî û hinek tiştên din. Ji ber ku ev tişt di orjînala Ansîklopediya Zarokan de tunebû û ev kar me bi destûra amadekarên wê yên eslî kiriye. Bi baweriya me, bi vê Ansîklopediya Zarokan, biçûkên me ê:

- Di warê ziman de jîriya têgêhîştin û vegotina xwe xurt bikin û xwe bi pêş bixin.
- Di van salên xwe yên ter û teze de bibin xwediyê gotinên ji nava malê der û dûr ku ev jî di jiyana wan de gelekî giring e.
- Tekst û wêneyên ku di Ansîklopediya Zarokan de hene, ew ê bihêlin kuagahî zû têkeve hişên wan.

## ANSÎKLOPEDIYA ZAROKAN

Ji wê gava ku zarok bi bîr dibin û pê de, ew bi baldarî û enerjiyeke xurt bi ser tiştên derdora xwe ve dibin. Her tiştên ku ew dibînin ji bo wan nû ye.

Zarok bi mezinbûna xwe re dibin xwedîtecrube, hin bi hin sînorên bal û meraqa wan zêdetir dibe. Bala wan diçe ser mijarên dûr û kûr.

Ma ji me kesên mezin kê ji pirsên zarokan, yên ku li dû hev û li ser hev para xwe nestendiye?

**Bal û mereqa zarokan tiştekî xwezayî ye**

Zarok birçiyên çîrokên li ser rastiyê ne. Ji ber vê ye ku hertim pirsan dikin. Lê gava dibînin mezin guh nadin wan, wê çaxê bêdeng dibin û mecalên dan û sitandinê jî di navbera mezin û biçûkan de namîne. Herweha gelek mijarên din, mijarên ku ji bo zarokan ne konkret in, bi rêya TV, radyo û komputeran bi deng û wêne digêhîjin zarokan. Giring e ku kesên mezin vê lehiya wêne, term û hestan bi zarokan bidin zanîn ku zarok karibin wan ji hev derxin.

Ji bo zarok têbigêhin û serwext bin, ji wan re alîkariyek pêwist e. Zarok li gor zimanê xwe bersivan dixwazin.

**Biçûk û mezin bi hev re**

Di dema îro de wexta dê û bavan bi zarokan re kêm bûye. Loma jî zarok piraniya wextên xwe li ber TV û komputeran dibihurînin. Û ev jî dibe sedem ku dan û sitandineke jîndar di navbera dê û bav û zarokan de pêk neyê. Dan û sitandin, gotûbêj û afirandinên di nav piçûk û mezinan de giring in, lê gelek caran meriv pê re nagêhin.

Lêkolînerên mejînas, kapasîteya fêrbûna dema zaroktiyê bi têra xwe baş nimandiye. Çiqas guneh e ku meriv li vê yeka ha xwedî dernekeve. Sersariyeke mezin e ku meriv berî dibistanê hin bi hin tîp, peyv û hejmaran bi zarokan nede naskirin.

**Nasîna hacet û aletan**

"Nasîna hacet û aletan" tiştekî welê ye ku meriv bi nasîna van hacet û aletan re bi ser zanîna tiştên din ve jî dibe û rê li ber zanîna meriv vedibe. Nemaze tîpên alfabeyê û peyv, hejmar û jimartin, jîrbûna xwendin û nivîsandinê... Di dawîya dema beriya dibistanê de ji bo gelek zarokan tîp û sembol balkêş in. Zarok hêdî hêdî hin gotinan nas dikin, gotinên ku li ser lewheyan, sernivîs û anonsan hene. Girêdana navbera tîpan, term û wêneyên ku di vê pirtûkê de hene "dilbijiya tîpan" li ba zarokan xurttir dike.

Ev ansîklopedî bi rêya tîp û alfabeyê alîkariya zarokan dike ku ew tiştan nas bikin û bizanin. Çi bi rêya komputeran be û çi bi pirtûkan be, zanîn û nasîna tiştan gelekî giring e.

**Ev pirtûk berê xwe dide kîjan grûpan?**

Ya rast ew e ku meriv bi hêsanî nikare bêje ka ev berhem ji bo zarokên kîjan grûp û temenî ye. Lewra zarok roj bi roj bi pêş dikevin. Lê em berî hertiştî berê xwe didin van grûpên zarokan:

**Serdema beriya dibistanê**

Ev serdem, di jiyanê de serdemeke welê ye ku meriv bêtir bîra tiştan dibe û tişt baştir dikevin serê meriv.

Beriya ku zarok bikarin bixwînin normal ev peryod dest pê dike.

Gelek caran wêneyek mereqdariya zarok gelekî xurt û zêde dike. Dema ku zarok pirsan dikin, mezin, bi alîkariya tekstê dikarin wêneyan ji wan re rave bikin.

**Peryoda daxwaza xwendina pêşîn**

Piştî demekê xwendin hin bi hin hêsantir dibe, tîp û peyv hevokên bi wate saz dikin. Pisporekî xwendinê, xwendin şibandiye texmîna di lîstikeke pêşketî de. Ji bo ku meriv di lîstikê de bi ser bikeve, divê meriv gelek gotinan bizane. Ji şîrovekirina gotinan re wêne dikarin bibin alîkar.

Ji bo zarokên ku ji xwendinê hez dikin û baş dixwînin ev Ansîklopediya Zarokan destpêkeke giring e.

**...pirtûkek ku zarok û mezinan bi hev re tevdigerîne!**

Ev Ansîklopediya Zarokan, ji zarokan re dikare bibe alîkariyeke baş ku zarok li zanîn û nasîna tiştan bigerin û herweha kêfxweşiya wan zêdetir bike. Lê meriv dixwaze dilgeşî û serpêhatiyên xwe bi kesên din re parve bike. Di nîgartin, ravekirin û formulekirina tiştan de ev dilgeşiya hevbeş û handana ziman ji bo zarokekî tiştên gelekî giranbuha ne. Zarokên ku ji diyalogan bêpar in, di têgêhiştin, rêziman û gencîneya peyvan de rastî kêmasiyan tên.


Divê meriv wek hogirekî bi zarokan re tevbigere. Lê wek kesekî mezin divê meriv bêtirs diyar bike ku meriv nikare bersiva her pirsê bide. Li ser me mezinan erkek e ku em mereqdariya zarokan biparêzin!

## Hûn ê çawa Ansîklopediya Zarokan bi kar bînin?

Di evê Ansîklopediya Zarokan de nêzî 500 peyv û gotin hene ku li gor rêza alfabeyê hatine rêzkirin. Hemû peyv û gotin jî li gor cîhan û fantaziya zarokan hatine hilbijartin. Di her rûpeleke vê ansîklopediyê de rêza alfabeya kurdî heye û tîpa aktuel li ser vê rêzê bi rengekî din hatiye nîşankirin.

Ev jî ji bo zarokan hêsan dike ku tîpa alfabeyê baştir bibîne û nas bike. Girêdana wêne, peyv û tîpan alîkariyê dike ku zarok zûtir serwextî zanînê bibin.

Weke nimûne em bibêjin peyva *dil*: Tu ê di ansîklopediyê de di beşa **D**yê de li peyva *dil* bigerî. Piştî ku te *dil* dît, tu ê bizanibî ku dil di sînga merivan de ye, ji masûlkan pêk hatiye. Meziniya dilê herkesî bi qasî kulma wî ye. Gava dil lê dide, ew xwînê dişîne her aliyekî laş ku oksîjen û adanê bistîne... Ger tu mereq bikî ku bi zimanekî din ji *dil* re çi dibêjin, tu dikarî li dawiya vê ansîklopediyê li ferhengoka kurdî, swêdî, îngilîzî, almanî û tirkî binerî.


**dêw**
Di gelek çîrokan dêw hene. Ew ji merivan geleki mezin û dirêjtir in. Dêw pirî caran din û xirab in. Di rastiyê de dêw tunene. Lê meriv bawer dikin ku dêw hene û hinek kevirên mezin yên ku li erd û ciyên rast hene, dêwan ew avêtine.

**dibistan**
Li gor peymanên navneteweyî divê her zarok biçe dibistanê û zimanê xwe bixwîne. Dibistana seretayî di navbera 8 û 10 salan de ye. Wek mînak, li Swêdê 9 sal e. Li gelek welatan şagird di 7 saliya xwe de dest bi dibistanê dikin. Piraniya zarokên kurdan, ne bi zimanê xwe lê bi zimanê biyanî dixwînin: bi zimanê tirkî, farisî û erebî.


**dil**
Dil di sînga merivan de ye û ji masûlkan pêk hatiye. Meziniya dilê herkesî bi qasî kulma wî ye. Gava dil lêdide, ew xwînê dişîne ku her aliyekî laş oksîjen û adanê bistîne.
Xwîn ji laşê meriv di "lûlikan" re diçe dil û tê, em jê re dibêjin rehê xwînê.



## abc

Pirtûka şagirdên dibistana pêşîn ABC ye. Berê, meriv li gora rêza alfabeyê hînî tîpan dibû. Îro, şagird ne bi vî rengî fêrî xwendinê dibin lê dîsa jî carina ji pirtûka xwendinê ya pêşî re dibêjin ABC.








Dayê
Dayê! dayê!
Mar!
mîro!
mişk!

Lawo, binere!
Gul!
gustîl!

## agir

Pirî caran dema meriv nexweş dikeve, agirê meriv çêdibe. Laş germ dibe û bi zêdebûna agir re meriv diweste.
Bi termometreyeke taybetî meriv agirê xwe dipîve. Heger termometre ji 37,5 dereceyî bêtir be, wê demê agirê meriv heye.



## agirkujî

Dema ciyek dişewite agirkuj tên hawarê û agir vedimirînin. Agirkuj bi tankerên xwe tên û bi pompeyên avê û aletên xwe yên din agir vedikujin, meriv û ajelan rizgar dikin. Dema agir bi ciyekî bikeve û şewate çêbibe meriv telefonî ciyê agirkujiyê dike.

Li stasyona wan alarm lê dixe, agirkuj çekên xwe yên taybetî li xwe dikin û li wasîteyên xwe siwar dibin. Ji bo ku zûtir bigihîjin cîyê şewateyê sîrenên xwe vêdixin. Dengê sîrenên wan pir bilind e û bi lampeyeke şîn vedijene.




Temo telefonî 112an dike

Telofonîst wî bi stasyona agirkujiyê ve girêdide.

agirkuj diçin hawarê

## ajel, li rûpelên 12 û 13an binere

## akordiyon


Gelek kes hene ku ji muzîka akordiyonê hez dikin. Meriv pê li bişkokên akordiyonê dike û lê dixe. Di hundurê wê de hin zimanok hene, tonên dengan ji wir derdikevin.



## akvaryûm

Meriv dikare di akvaryûman de masiyên biçûk xwedî bike. Piraniya masiyên akvaryûman ji welatên germ in. Loma divê germahiya ava akvaryûmê ji ya hundurê malê hinekî zêdetir be.

Ji bo ku masî oksîjenê bigirin, di akvaryûmê de giyayên avê pêwîst in. Meriv dikare bi pompeyekê oksîjena akvaryûmê zêde bike û bi fîltreyekê jî ava wê paqij bike.




## al

Al parçeyeke caw e ku meriv bi sitûnekê ve dadileqîne. Her welatek aleke xwe heye. Gelek caran bi keştiyên bazirganiyê ve alên taybetî hene.
Ala kurdan li ser panayiyê: sor, sipî û kesk e û rojeke zer li ser xeta navîn e.



## ajel

Babetên ajelan nêzî mîlyonekê ne. Gelek ajelên ku di dewra berê de hebûn nuha nemane: Bo nimûne, gumgumokên pir mezin ên ku sed mîlyon sal berê hebûn. Gelek ajelên din jî hene ku nuha li ber talûkeya tunebûnê ne. Ji ber ku xelk diçin nêçîra wan, an jî jîngeha wan xera dikin.


Ajel hem di avê de û hem jî li reşayiyê li her deverê dunyayê hene.

Şiklên wan li gor cî û awayê jiyana wan diguhere. Masî bi guhik in, ji ber ku di avê de dijîn divê bikaribin bi alîkariya wan guhikan bêhna xwe bidin û bistînin. Pirça ajelên ciyên sar, pir û gur e. Ajel bi giya û pelên daran an jî bi goştê ajelên din dijîn. Jiyana wan gelek zahmet e, divê hertim xwarinê peyde bikin û hay ji xwe hebin ku nebin xwarina hinekên din.

Li vir li ser nexşeya dunyayê tu hin cureyên ajelan û ciyê jiyana wan dibînî. Hin ji wan di parkên ajelan de jî hene.




fok
hir a si î
rovî
ren
roviyê sipî
ker
bakur
gur
hêştira
dumilk
kurebeşk
hêştir
tonmasî
hêştirmel
babîyan
çûka
afrîkî
hespê
semasî
çûkmasî




## ajelên kedî

Bi hezaran sal in ku ajel tên kedîkirin. Xelkê ji bo fêda xwe, ajel xwedî kirine. Dibêjin kûçik ajelê herî pêşîn e ku kedî bûye. Kûçik dikarin malê bipên, nêçîrê bikin, kerî û garanan li hev ragirin. Wek nimûne, meriv dikare gerdûman bavêje pey hespan, lê siwar be û pê kar bike. Meriv mange, mîh û bizinan jî ji bo goşt, şîr, çerm û hirîyê xwedî dike. Mirîşk hêkan dikin. Merivan mêşhingiv jî "kedî" kirine. Hin ajel jî ji bo kêf û xweşiyê hatine kedîkirin. Piştî kedîkirinê hin ajel hatine guhartin û hin cinsên nû peyde bûne. Wek nimûne, ger meriv kûçik û tajiyan bigêhîne hev, cewrikê ku ji wan çêdibe cinsekî nû ye, em jê re dibêjin toltajî. An jî ger ker biçe ser hespê, hêstir ji wan çêdibe ku ew jî dibe cinsekî nû.


**ajelên malovî**

Li jorê tu çend ajelên malovî dibînî ku li gelek welatan hene. Piraniya wan li welatên germ dijîn.




**ajel û lawirên nav malê**

Hin ajel û lawirên nav malê bi piranî di hundurê malê de ne. Hin ji wan ne kedî ne, ger meriv wan berde der, diçin û venagerin. Ajelên navmalê, bêtir ji bo hogiriyê tên xwedîkirin. Piraniya wan di qefes û akvaryûman de tên xwedîkirin. Wek nimûne, bi piranî çûkên evînê, mişkê hindî û masiyên akvaryûman in.




Gamêş li Hîndistan û li gelek ciyên din hene. Ew ajelên barkêş in, lê meriv wan ji bo şîr jî xwedî dike. Li gelek welatên Asya û bakurê Afrîkayê hêştir hene. Hêştir ji bo kar û barkêşiyê tên xwedîkirin, lê meriv dikare li wan siwar be jî. Ker, bêtir li derûdora Deryaya Sipî û Rojhilata Navîn hene.



**ajelên derveyî malê**
Hin ajelên kedî, normal li derveyî malê dijîn. Wek nimûne, bi qasî ku sebra kerguh, kûçik û pisîkan li hundurê malê tê, hewqas jî kêfa wan ji derveyî malê re tê. Pisîk li gor kêfa xwe diçe der û tê hundur. Di wêne de hûn cotek hamster dibînin ku derketine derveyî malê.

## alerjî

Bi bêhnstandinê re toza dar û ber û kulîlkan ketiye gewriya vî zarokî. Qirik dişewite, çav û poz diherikin. Ew pêwrî bûye. Pêwrî bi xwe alerjiyek e. Dema meriv li hember tiştekî pir hesas be, alerjiya meriv jê çêdibe. Alerjiya hinekan ji xwarinê çêdibe, wek mînak, ji çîlekan. Ya hinan jî ji tozê, ji pirça lawiran û ji madeyên kîmyayî çêdibe.



## alfabe

Ji bo nivîsandinê meriv tîpan bi kar tîne. Ji temamê van tîpan re dibêjin ALFABE. Alfabeya kurdan formek ji ya latînî ye. Beşek ji kurdan bi alfabeya erebî dinivîsin. Rûs û hin gelên din alfabeya kirîlî bi kar tînin. Yunanî, cihû, hindî û çînî, her yek ji wan alfabeyeka xwe ya taybetî heye. Alfabeya hin zimanan, mîna ya erebî ji destê rastê ber bi destê çepê ve tê nivîsandin.

ABCÇDEÊFGHIÎJKLMNOPQRSŞTUÛVWXYZ

tîpên latînî



ا ب ت ث ج ح خ د ذ ر ز

tîpên erebî

АБВГДЕЖЗИЙКЛМ

tîpên kirîlî


## amanên ji axê (pîrotkarî)

Ji axa sor aman û firax tên çêkirin. Navê kesê ku vî karî dike pîrot e. Navê vî karî jî pîrotkarî ye. Yek li jor û yek li jêr du çerxên dezgeha pîrotkariyê hene. Çerxa mezin li jêr e û meriv bi lingên xwe dizivirîne, meriv girikek herî datîne ser çerxa jorîn, bi dest û tiliyên xwe jî formekê dide wê heriyê. Kerxik, dîzik, vazo, den û kûzên ji axê hene.



## ampûl

Ampûl ji şûşeyeke gilover û bê hewa pêk tê. Di hundurê wê de têlek heye ku bi ceryanê germ dibe û pêdikeve.
Burxiyên ampûlan ciyê ciyê ne û li gor babetên wan têne guhertin. Lê babetên ampûlan standart in.





## amûret

Bê amûret meriv nikare karekî bike. Gelek senetkar amûretên xwe yên taybetî hene. Kêr, çakûç, kertik, xardos, kilîta îngilîz amûretên herî nas in.
Li malê sendoqeke amûretan hebe baş e. Meriv dikare amûretên xwe tê de veşêre û di demên pêwîst de derxe û bi kar bîne.




## anfîkator

Anfîkator aletek e ku cîhazên elektronîk bi hêz dike. Bêtir ji bo bilindkirin û xurtkirina deng kar tê. Anfîkator di televîzyon, stereo û di hoperloyan de hene.



## anons

Herkes dikare perê xwe bide û di rojnameyekê de anonsekê belav bike.
Buhayê anonsê li gor meziniya wê ye. Ne rojname, lê xwediyê anonsê biryarê dide bê di anonsê de ew ê çi were nivîsîn.



**Ajelên firotinê**
Min çêlpisîkek Wanê heye.
Çavekî wê kesk û yek şîn e.
2 mehî ye.
[illegible] e.

**Ajelên kirînê**
Ez dixwazim du tûtiyan bikirim.
Baş re ku yek dîk û yek jî marî be.

[illegible]
Em pispo[illegible] masiyên malê ne.
Ji roja duşemê heta roja îniyê saxîxana me vekirî ye.
Di navbera 8:00 sibê heta 16:00 paşnîvro kerem bikin

## asansor

Meriv dikare bi asansorê hilkişe jor û dakeve jêr. Herweha tu dikarî tiştan jî bi asansorê bibî jor û bînî jêr. Li jora xanî çerxeke mezin datînin, bi zencîr an jî kindirên polayî selika asansorê bi çerxê ve girê didin. Asansor bi motoreke ceryanê kar dike. Bi qasî giraniya selika asansorê parçeyekî giran heye, dema ev giranî dadikeve jêrê, selika asansorê hildikişe jor. Gava selik dadikeve jêrê, îcar jî ew parçe hildikişe jor.





## asîd

Asîd aveke tirş e. Gelek babetên asîdê bi jahr in û ciyê ku ew lê dikevin dişewitînin û diherifînin.
Hin ji wan li sirûştê û di xwarinên me de jî hene.
Tirşa ser dil jî babeteke asîdê ye ku di ûrê me de çêdibe.



## astronot

Ev astronotê ha bi cil û bergên xwe yên taybetî, li ser hîvê ji xwe re digere. Astronot an jî gerokên gerdûnê, pîlotên jêhatî ne ku wan perwerdeyeke taybetî dîtine.
Navê pîlotên gerdûnê yên amerîkî astronot û yên rûsî jî kosmonot in.



## aş

Meriv bi aşê bayî, aşê avê û aşê makîneyê genim dihêre û dike ard. Di dîrokê de aşê pêşîn destar e û ew ji du kevirên gilover pêk tê. Piştre merivan aşê bayî û aşê avê saz kirin. Êdî di nav herdu kevirên aş de genim hêrandin û kirin ard. Îro her çiqas aşên avê hebin jî lê êdî bi makîneyan genim dihêrin û dikin ard. Kurd ji van aşên makîneyê re dibêjin palûke.



**aşît**

Li çiyayên bilind pirî caran berfeke zêde dibare û dibe bêsûyên berfê. Ev bêsûyên berfê ji ciyê xwe diqirpin û ber bi jêr ve diherikin. Di vê herikînê de çi têkeve ber wan: dar, kevir, ajel, însan yan xanî... bi xwe re dibin.
Ji vê herikîn û gindirîna berfê re dibêjin aşît. Carina hin gund jî di bin aşîtê de dimînin.



**aşpêj**

Karê aşpêj ew e ku xwarinê bipêje. Ciyê karê aşpêjan aşxane ne. Û ew ciyên ku ji bo gelek kesan xwarin tê çêkirin, ew jî aşxane ne.
Ajpêjî jî huner û zanînekê divê. Wek nimûne: Li Swêdê aşpêjek divê piştî dibistana seretayî û navendî du salên din jî here dibistanê û hînî çêkirina xwarinê bibe.



**atolye**


Atolye ciyek e ku hunermend karê xwe li wir dikin. Li vê atolyeya di wêneyê de resamek kar dike. Boyaxên ku jê re pêwîst in, li ser paletê ne. Li ser maseyê firçe, tubên boyaxê û tiştên din jî hene. Ew wêneyê jinekê çêdike. Jin modela wî ye. Ew ciyên ku foto lê tab dibin, meriv ji wan re jî dibêje atolye.



## av

Av ji bo jiyanê giring e. Jiyan bê av nabe. Di xwezayê de av xwe dewr dike. Herdem ji derya, gol û heta ji ax û hêşînahiyan hilm û gulm ber bi asîman ve hildikişe. Ev hilm û gulma avê bi awayekî nependî tim hildikişe jor. Dema hewa sar be, ew hilm û gulm dibe ewr. Ji ewran av dîsa wek baran û berfê dibare, di çeman de diherike û dikeve gol û deryayan.
Wek nimûne, gava ku ava çaydan germ dibe, hilm û gulm di bilbilînga wê re derdikeve der. Dema ku ew hilm û gulm sar bibe, dibe dilopên avê û tê xwarê.

Sê formên avê hene: hilm, qeşa, av.




Dema meriv hûyî eynikê dike hilma meriv dibe dilop. Dema tu nefesê didî jî ji devê te hilm derdikeve.

## ax

Ax ji bermayiyên nebat û hêşînahiyên hişk û rizî pêk tê. Di nav axê de dikare qûm û kevir jî hebin.
Kokên nebat û hêşînahiyan di nav axê de ne. Gelek lawirên biçûk ên wek kurmikan jî di nav axê de dijîn.



**axtapot,** li rûpela 24an binere

## axur

Di vî axurî de gelek ajel hene. Li vir beşê mangeyan, tewlên hespan, koza golik û berazan, goma mîhan û koxika mirîşkan hene. Bêguman pisîk jî gelekî giring e. Ji ber ku ew bi dû mişkan dikeve û digire. Ajelên malovî di hin demsal an jî rojan de nikarin li derve bin û loma di axur û goman de dimînin.
Axurê ku hûn di wêne de dibînin hejmara wan roj bi roj kêm dibe. Li gelek axurên îroyîn, wek mînak, bi tenê mange dijîn. Beşekî mezin ji karên ku bi destan dihatin kirin, êdî bi alîkariya makîneyan tê kirin. Li hinek welatan hin ajel ji demên berê bêtir di axuran de dimînin. Û ji xwe hin ajel jî qet ji axuran dernakevin.

**êm û alif**
Navê xwarina ajelan êm û alif e. Ji bo temamê zivistanê têra ajelan bike, meriv kadînê tije ka û rêsî dike.


**embara şîr**
Li vir şîr di sîtileke mezin de tê parastin. Ji bo çêj û tama wî xera nebe divê şîr tim sar bimîne.



**tankera şîr**
Di hefteyekê de çend caran tankera şîr tê, şîr digire û dibe şîrxaneyê. Li şîrxaneyê qatixên ji şîr çêdikin, wek: şîrê pastorîze-kirî, to, mast, penîr, nivîşk û hwd.

**mîh**
Li hin axur û goman mîh jî hene. Mîh bêtir ji bo şîr, goşt û hiriya xwe tê xwedîkirin. Bi piranî meriv salê du caran hiriya wan dibire. Ji hiriya mîhan doşek, lihêf û balîf çêdibe. Herweha hiriya wan dirêsin, jê rîs çêdikin. Bi wan rîsan lepik, kum, gore û tiştên din dihûnin. Ji çêleyên mîhan ra dibêjin berx.

**hesp**
Hesp di tewlan de dimînin. Divê meriv wan her roj tîmar bike. Ango wan bi firçe û qeşawînê paqij bike. Berê herkes an her malek divê xwedî hesp bûya, hesp ji bo gelek karan bi kar dihanîn. Lê îro li şûna hespan makîne û traktor derketine. Hesp jî bi piranî tenê di sporê de an jî di pêşbirkan de bi kar tên.




**mange**
Li vir mange di axurê xwe de ne. Li nîvê din yê axur golik di kozan de ne. Rojê du caran mange tên dotin. Şîr di guhanên wan de kom dibe. Meriv ji bo goşt jî mangeyan xwedî dike.

**axurên îro dişibin fabrîkeyan**
Îro li axurên modern gelek makîne hene. Ew mîna fabrîkeyekê ne. Ji bo ajel kêm an jî zêde xwarinê nexwin, êm û alifên wan otomatîk dikeve afirên wan. Di axuran de makîneyên şîr, penîr û rûn hene.

## axtapot

Heşt an jî deh piyên axtapotê hene. Axtapot hov e û bi piyên xwe nêçîra xwe digire.
Kurka wê tijî aveke mîna hibrê ye. Li dijî êrîşekê, ji bo ku xwe veşêre, vê "hibrê" dipijiqîne.



## babîyan

Babîyan cureyeke meymûnan e. Li Afrîka û li hin welatên ereban hene. Dema bi çarpêyan diçin, ew dişibin kûçikan. Babîyan, bêtir bir bi bir bi hev re dijîn.



**bajar,** li rûpelên 26-27an binere

## bakterî


Bakterî li her derê hene. Hingî biçûk in nayên dîtin. Ji bo meriv wan bibîne mîkroskopek divê. Bakterî bi ruh in lê ne lawir û ne jî giya ne. Hinek bakterî bi fêde ne. Ji beşeke mezin ya bakteriyan nexweşî peyda dibin.

Bakterî, di mîkroskopê de weha dixuye.



Birîna xwe pak bişo! Heger tu birîna xwe pak neşoyî, bakteriyên ziyandar dikarin têkevin laşê te.

**balafir,** li rûpelên 28-29an binere




## bale

Bale awayeke dansê ye. Babetek ji şanoya musîkal e. Ji bo dansa baleyê, divê meriv cansivik û nerm be. Loma jî bale gelekî antremanê dixwaze û divê meriv di temenekî biçûk de dest pê bike.
Di baleyê de, meriv li gor livên diyarkirî dansê dike. Hinek ji wan tu di wêne de dibînî. Ji ber ku bale li Fransayê bi pêş ketiye, loma navên livên wê jî bi fransî ne.

## balon

Balona biçûk bi gazeke sivik tê dagirtin. Vêca ji hewayê siviktir dibe. Loma jî balon dikare ber bi jor ve bilind bibe. Di balona mezin de hilma germ heye. Hilma germ ji ya sar siviktir e. Di selika bin balonê de meriv dikare rûne û bifire.






## bajar

Li bajaran pir meriv dijîn û kar dikin. Li bajaran avahiyên kevin û nû, nizim û bilind, mal, dikan, dibistan, nexweşxane, daîre, dêr, mizgeft û kenîşte hene. Li piraniya wan stasyonên trênê û benderên keştiyan peyde dibin.
Bajarek dikare wusa xuya bike, wek ku di wêne de. Lê bajar li gor serdeman tên guhertin. Bajarên pêşîn bajarên bazirganiyê bûn. Ev bajar li warên nêzî benderan û li ser xaçerêyên giring dihatin avakirin. Gelek bajarên kevin li dora birc an jî kilîseyan ava bûne. Berê, bajaran xwe bi xwe îdareya xwe dikir.
Di nav gund û bajaran de gelek ferq hebû. Gundiyan tiştên xwe dibirin li bajêr difirotin. Mîna tu ji welatekî biçî welatekî din li bajêr baca xwe didan.
Di van sedsalên dawîn de, li der û hundurê bajaran fabrîke hatine avakirin. Gelek merivan ji bo ku kar bikin, ji gundan koçî van bajarên îndustriyê kirine. Loma jî bajar zû mezin bûne. Piraniya şêniyên cîhanê li bajaran dijîn û bajar zêdetir dibin. Li hin bajaran bi mîlyonan meriv bi cî bûne. Hejmara şêniyên New York an jî Tokyoyê du caran li ya Swêdê ye.
Bajarekî modern li gor planekê ava dibe. Lê ew hertim nû dibe. Avahiyên kevin tên hilweşandin û yên nû tên avakirin. Trafîka bajaran roj bi roj zêde dibe, çareserkirina wê jî pirseke mezin e. Bi vê armancê hin kolan ji trafîkê re têne girtin û li hinan jî trafîk yekalî ye.






## balafir

Berî ku balafir hebin, gelek kaşif diketin xewn û xeyalên çêkirina makîneyekê ku ew bikare mîna çûkekê bifire. Lê di wê demê de ji bo makîneyeke weha motor tunebûn. Ev nêzîkî 80 salan e ku balafirên bi motor saz bûne.
Gelo balafir çawa dikarin bifirin? Formê baskên balafiran weha ne ku dema ba li wan dixe, ew balafirê ber bi jor ve hildidin. Herwekî ku meriv kevirekî pahn li ruyê avê bixe û bi alîkariya avê ber bi jor bilind bibe.
Ji bo ku balafir bikaribin rabin û bifirin, divê ew pir bi lez û pît herin.




balafireke yekmotorî





Concorde balafireke îngilîz-fransiyan e û ji bo rêwiyan e. Concorde ji deng zûtir diçe.



## bank

Bank peran deyn dike û bi deyn dide. Heger tu pereyên xwe têkî bankê, ew pereyan ji te deyn dike. Hinek pereyên zêde jî dide te, ji wê re dibêjin fayîz. Lê heger ji te re pere pêwîst be û tu jê deyn bikî, îcar tu fayîzê didî bankê.





## barkêşer

Meriv bi barkêşerê li ciyên weke fabrîke û stasyonan bar û tiştên giran radike û bi cî dike. Gelek barkêşer xwe bi xwe bar radikin. Hinek ji wan wek lokomotîveke biçûk vagonan li pey xwe dikişînin. Gelek ji wan bi elektrîkê dixebitin. Ji ber ku hinekên wan li ciyên sergirtî jî kar dikin, divê bê gaz be ku jehrî çênebe.



## bask


Baskên çûk, mêş û balafiran hene, ew hêzê didin wan ku bifirin. Lê ew ne wek hev in. Bask divê sivik bin. Him baskên ajelan û him jî baskên balafir û firokan sivik in lê „skeletên“ wan xurt in.



Di hundurê baskê balafirê de sistemeke skeletî û sivik heye.

## baterî

Ji bateriyan elektrîk saz dibe. Bateriyên lampeya destan qutiyek zînk e ku hundurê wê tijî tiştên kîmyayî ne. Di nava wê de jî pîjekî rejiyê heye. Bateriyên otomobîl û aletên elektrîkê ji nû ve dikarin bêne dagirtin.
Herweha ji bo aparatên guhan bateriyên mîna bişkokan hene.




## beq


Beq him di nav avê de û him jî li bejahiyê dijîn. Dema hîn kurmik in bi berkurkê û dema mezin dibin jî bi pişikên xwe bîhnê didin û distînin. Biharan beq xerzên xwe datînin. Di nav xerzeke beqê de bi hezaran hêk hene.

Ji hêkên wan kurmik çêdibin. Heta ku ew dibin beq çend caran formê xwe diguherin. Lingên wan ên paş bi hêz in ku xwe baş çeng bikin. Ew kurm û kêzan dixwin. Ew nêçîra xwe bi zimanê xwe yê dirêj digirin.



## beqbejî

Beqbejî ji malbata beqan e. Ew dişibe beqa normal û lingên wê kintir û çermê wê balûkî ye.
Ne baş hildipeke û ne jî baş ajnê dike.
Beqbejî mêş, megez û kurmikan dixwe.
Temenê wê ji 30 heta 40 salan dirêj e.
Beqbejî cî û warê xwe naguhere.



## beqerî

Masiyê beqerî di gol û çeman de dijî.
Masiyekî hov e. Masiyên biçûk dixwe.
Beqeriyekî qert dikare ji du kîloyan girantir be.
Goştê wî xweş e lê tijî dasî ye û xwarina wî zehmet e.



## beraz

Merivan bi hezaran sal berê beraz kedî kirine. Ji beraza mê re madek, ji yê nêr re yekane û ji çêlikên wan re jî dibêjin kudik.
Çêja goştê ran û parsûyên berazan bi nav û deng e.



## berazê kovî

Berazên kovî ajelên bi hêz û xurt in. Ew dikarin heta metre û nîvekê jî dirêj bibin. Berazên kovî dikarin bi pozê xwe axê biqelêşin. Diranên berazên nêr mezin in. Goştê berazên kovî bi çêj e û ji bo goşt nêçîra wan dikin.
Berazên kovî zerareke mezin didin rez û baxçeyan. Berê li çiyayên Kurdistanê berazên kovî gelek bûn lê anuha kêm bûne.



Madek kudikên xwe dimijîne. Pişta kudikan şivşivî ye.


## berf

Formên krîstalên berfê gelek xweşik in. Li vir tu çend krîstalên mezinkirî dibînî.



Çîroka kuliyên berfê dûr û dirêj e. Hilma ku ji erd û deryayê bilind dibe bi çavan nayê dîtin. Ev hilm li jor sar dibe û dibe ewr. Ger ew hilm têra xwe hebe û sariya wê bikeve bin sifirê, wê demê krîstalên qeşayî pêk tên. Ev krîstal bi sitêrkên biçûk dimînin.
Dema ku ev krîstalên qeşayî digêhîjin hev, dibin kuliyên berfê û datên xwarê, wê demê meriv dibêje berf dibare.
Ger tu qenc bala xwe bidî kuliyên berfê, tu ê bi hêsanî krîstalên wan bibînî.






## biharat


Biharat ji pel, giya û kulîlkan çêdibin û dema meriv dike nav xwarinê xweş dikin. Li Kurdistanê biharatên weke îsot, rihan, pûng, nane, cahter, simaq û hwd hene.




## bilbil

Bilbil bi dengê xwe yê xweş bi nav û deng in. Gelek cureyên wan hene. Hinek ji wan di qefesan de tên xwedîkirin. Ji cî û warên germ hez dikin.
Di edebiyata klasîk de bilbil sembola xweşikî, kubarî, ciwanî û bengîtiyê ye.







## birc û keleh

Ji bo ku xwe li hember êrîşên dijmin biparêzin, xelkê keleh ava kirine. Keleh avahiyên mezin in. Dora wan bi sûr û kend e. Piraniya sûran bi birc in. Di hundurê bircan de embarên xwarinê û embarên tiştên din hene. Bi xêra wan meriv demeke dirêj dikare xwe biparêze. Berê, gelek kes jî di bircan de diman.

## birek

Di birîna dar, metal û plastîkan de meriv birekê bi kar tîne. Li gor ka meriv çi tiştî dibire, cureyên birekan hene. Birekên li fabrîkeyan bi makîneyên elektrîkî kar dikin.



## birinc

Nîvê însanên dunyayê birincê dixwin. Birinc li gelek ciyan, herî zêde jî li Çîn, Japonya û Hîndistanê tê çandin. Tayê birincê ji metreyekê bilindtir dibe. Birinc zêde ji avê hez dike. Ji zeviyê birincê re dibêjin medreb. Li Kurdistanê birinca Qerejdaxê bi nav û deng e. Li hin deverên welatê me ji birincê re dibêjin riz.



Libên birincê di [illegible] wê de ne.

## birûsk

Birûsk ji elektrîkîbûna ewran pêk tê. Ewrê bi elektrîkê dagirtî vala dibe û dibe birûsk. Gelek caran ev birûsk di nav tilpên ewran de diçin û tên. Carina jî ji tilpên ewran ber bi erdê ve tên xwarê, wê demê em dibêjin birûskê veda. Dengê birûskê nîşan dide ku çirûska wê çiqas germ û xurt e.



Dema ku birûsk vedide pirî caran li ciyên bilind dixe.

## bisiklêt

Berê, merivan bi lingan bisiklêt dahf dida û ew dajot. Dûre pedal li tekera pêşiyê siwar kirin, ji ber ku tekera pêşiyê hewqasi mezin bû, xelkê ji wan bisiklêtan re "tekerbilind" digot. Bisiklêtên anuha yên modern in û temenê wan nêzîkî sed salan e. Xusûsiyeta van bisiklêtan jî ew e ku zencîrek bi tekera paşiyê ve ye.




bisiklêteke modern

## bizin

Qiloçên bizinan ber bi paş ve tewandî ne û mûyên wan dirêj û zîx in. Ji yê nêr re nêrî dibêjin û rîha wan heye. Ji biçûkên wan re dibêjin karik. Bi hezaran sal berê însanan bizin kedî kirine. Meriv ji şîr, çerm û mûyê bizinan fêde dibîne.
Li welatê me, em li gor reng û şiklên wan navan jî li hinek bizinan dikin. Wek nimûne, bizina kol, bizina xez, bizina bel, bizina taq hwd.




## bîr

Bîr cureyeke ji çalan e. Meriv erdê dikole û ji binê erdê avê derdixe.
Berê, li ciyê ku av ne kûr bûya, devê bîran vekirî bûn û bi dewlan av ji wan dikişandin.
Îro jî bêtir pompeyan bi kar tînin.
Ava bîran aveke xwezayî ye.



## burxî

Piraniya burxiyan mîxekî bi serik û kertik kertikî ye. Di serê burxiyê de jî kertikek heye ku meriv bi tornavîdayê wê badide û dişidîne. Gava meriv burxiyan di textan de bi cî dike, diranên kertikan di text re derbas dibin. Hinek babetên burxiyan sitûr in û serê wan şeşparsû ne, ji wan re dibêjin cîwate.
Cîwate bi xwe bi somineke re li hev siwar dibe ku hundurê wê jî bi kertik e.
Ji burxiyê re vîda jî dibêjin.



**bûkik**
Ji dema herî kevnare ve zarok her bi bûkikan dilîzin. Bûkikek dikare pir hêsan be, herwekî darek û potikeke lê pêçayî. Bûkikên xweşik berê ji ferfûrî û porselenê dihatin çêkirin. Nuha gelekên wan plastîk in. Hinek ji wan dikarin çavên xwe bigirin û bibêjin "mamma".




**cadûkar**
Berê merivan bawer dikirin ku cadûkar hene û bi sihrê dikarin gelek xirabiyan bikin. Herweha merivan bawer dikirin ku di cejna hêkesorê de cadûkar bi sivnika xwe difirin, diçin kavilên xwe û li wir şahiyê dikin.
Îro jî gelek zarok di cejna hêkesorê de xwe reng dikin û weke cadûkaran xwe dixemilînin.



**canbaz**
Li sîrkê keçik xwe ji trapetsekê berdide. Zilamê ku bi loliba trapetsa din ve daliqîye, wê li hewa digire.
Herdu jî canbaz in. Hin canbazên din jî hene ku li ser têlê dilîzin, xwe qulopanî dikin.
Ji bo ku canbaz hunerên xwe pêşkêşî xelkê bikin, divê bi hêz bin û laşên wan jî nerm û sivik bin.




## canbazê ser têlê

Canbazê ser têlê govendeyê sîrkusê ye. Li ser têlekê radiweste ku ew ji erdê bilind e. Carina dimeşe û pêre jî çemberan davêje û digire.
Divê canbazê ser têlê tucarî balansa xwe wenda neke.



## canî

Navê kuriyê hespê canî ye. Piraniya mehînan caniyekê tenê tînin.
Pîştî çêbûnê di demeke kurt de canî radibin ser lingan û dimeşin.
Ji diya caniyan re mehîn û ji bavê wan re jî hesp dibêjin.



## ceps


Ceps ardekî gewresipî ye. Heger meriv avê berde ser dibe hevîr. Zû zuwa û hişk dibe. Meriv dikare ji cepsê peykeran jî çêke. Dema ciyekî meriv bişikê heta rehet bibe, wî ciyî bi cepsê dipêçin, girêdidin û welê dihêlin.



peykerekî ji cepsê

**cil û berg**

Ji bo ku meriv xwe ji serma û tiştên din biparêze, meriv cil û bergan li xwe dike.
Ji bo xweşikbûnê jî em cil û bergan li xwe dikin. Li gor deman cil û berg têne guhertin û her modeyeke cil û bergan dîrokeke dûr û dirêj heye.




**cil û bergên gelêrî**

Berê, xelkê cil û bergên rengîn û sipehî li malê bi destan çêdikirin.
Her herêmek xwediyê cil û bergên xwe yên xas bû.
Ji wan re dibêjin cil û bergên gelêrî.
Îro meriv bêtir di cejn û şahiyan de wan li xwe dike.




**cin**

Cin figurên çîrokan in. Di zemanên berê de merivan bawer dikirin ku ew hene. Digotin ew li çiyan, di binê erdê de û carina jî bi malbatî dijîyan.
Li gor gotinan, cinên mezin, cinên biçûk û yên bi hêz hebûne. Wan ajel û meriv direvandin.
Lê îro gelek kes bi hebûna wan bawer nakin.



**cirdon**

Cirdon ji malbata kurebeşk û mişkan e. Ew ajelekî kojer û palaxî ye ku hertiştî dixwe. Cirdon bi piranî di nav gemar û sergoyan de dijîn.
Cirdonek dikare di salekê de 100 çêlikan bîne.



**çakûç**

Çakûç aletekî gelekî kevin e. Gelek cureyên çakûçan hene ku meriv ji bo karên cuda cuda bi kar tîne. Çakûçê dudevî çakûçê herî naskirî ye.
Meriv bi vî çakûçî him mîxan dikute û him jî mîxan radike.




**çam**

Çam darek ji wan daran e ku xozan digirin. Dareke dirêj e û dikare heta 50 metreyî jî bilind bibe. Di îndustriyê de berhema wê zêde ye. Dara çamê di avahî, mobîlya û çêkirina kaxizê de jî bi kar tê. Li hin deverên Kurdistanê ji bo dara çamê kaj jî dibêjin.



## çama zer


Çama zer ku li hin deveran dibêjinê kaja zer jî, ji malbata çamê ye û li seranserê Skandînavyayê heye. Çama zer dareke pelderzî ye û herdem hêşîn e.
Çama zer dikare bi qasî 30 metreyî dirêj bibe û 300 salî jî bijî.
Textên wê di avakirina xanî û çêkirina mobîlyayê de bi kar tên.





## çav



Çav wek du kamerayên biçûk in, di navbera enî û hinarikan de ne. Ronahî di bîbikên çav re derbas dibe û diçe hundur. Di çav de nîske heye ku tîrêjên ronahiyê dişikîne û wêne dibe tora çav. Li tora çav gelek şanên bînahiyê hene ku bi rêya rehên bînahiyê sînyalan dişînin mejî.
Meriv bi alîkariya masûlkên biçûk dikare çavên xwe bilivîne.



Wêne di tora çav de serejêr e. Mejî wî sererast dike. Binere ka keçik û bûkika xwe di wêne de çawa ne. Lê mejî wêne sererast dike.



Çavên me weha bi cîh bûne ku em bi tenê pêşiya xwe dibînin.
Dema em bixwazin paş xwe bibînin, divê em serê xwe bizivirînin.
Çavên gelek ajelan li kêlekan in. Ji ber wê yekê ye ku bêyî ew serê xwe bizivirînin, dikarin derdora xwe bibînin.

**çay**
Ji tayên çayê, pelên wê yên şîn jêdikin û dûre hişk dikin.
Çay normal rengê wê reş an jî qehweyî ye. Pelên wê reng didin. Tayên çayê li zevî û mişarên mezin tên çandin.
Çay bêtir li Hîndistan û Çînê tê çandin.
Tayê çayê bi qasî metreyekê bilind dibe.



Salê çend caran pelên çayê tên çinîn.

**çeleng**
Çeleng ji bo rojên şîn û şahiyê tê çêkirin.
Gul û kulîlkan li çemberekê dipêçin û dixemilînin.
Meriv dikare ji gul û kulîlkan çelengekê çêke û di şahiyan de bide serê xwe.
Di zimanê kurdî de gotina çeleng tê wateya rind û jêhatî jî.




**çiraxe**
Çiraxe şivdarek e, seriyek jê bi don e û agir pê dixin. Di zemanê kevin de, dema dunya tarî dibû, ji bo ronahiyê tenê çiraxe hebûn.
Îro çiraxe di rojên şahî û cejnan de bi kar tên. Ew nemaze di xwepêşandanan de têne vêxistin.



## çiya

Erda em li ser in ne ewqasî şidyayî ye. Qateke tenik e. Qata di binê wê de ron û bi herk e. Ev herka di binê erdê de li hev digere, dikeve nav hev û formeke xwaromaro digire. Loma jî ruyê erdê ne rast e û çiyayên li pey hev lê peyda dibin.

Meriv çiqasî bi çiyê ve hilkişe jor hewa jî ewqasî sar dibe. Li kopên serê çiyayên bilind havînan jî berf heye.





## çîlek

Çîlek ji malbata dirîreşkan e. Çîlek ji Amerîkayê li dunyayê belav bûye û 300 sal berî nuha anîne Ewropayê.
Li gor reng, mezinî û çêja xwe gelek cureyên xwe hene. Li Swêdê di destpêka meha tîrmehê de digêhin.
Li welatê me di meha hezîranê de çêdibin.



## çîlekên bejî

Çîlekên bejî bêtir li qiraxên rê û li goncalan, qontara çiyan û li berwarên germ û têrtav şîn tên. Hin ji wan li baxçeyan tên çandin û navê wan tûtfiringiyên mehane ne. Meriv dikare wan berhev bike û weke moriyan bi tayekî giyê ve jî bike.




## çûk

Çûk ajelên bi skelet in. Hestiyên wan tenik in. Di laş û lingên wan de hejmarek berkurk hene. Bi alîkariya van berkurkan çûk bi hêsanî difirin. Li şûna lingên pêşîn baskên çûkan hene. Laşên çûkan bi per in. Ev per fira çûkan hêsantir dike û nahêlin laşên wan sar û germ bibe. Çûk çêlikan nayînin lê hêkan dikin. Ew kurk dikevin. Heta çêlik ji hêkan derkevin çûk wan germ digirin.



skelet



çûk dixwîne

çûk, hêk û hêlîna wê

hêk germ dibin

çêlik xwarinê dixwazin

## çûkên biçûk

Dema ku meriv dibêje çûkên biçûk, ne ji ber taybetmendiyeke xweser e, ew tenê biçûk in û nêzî mal û şêniyan in, loma ev nav li wan bûye.
Li jor, tu çend babet ji van çûkên biçûk dibînî, dengê wan pir xweş e.
Piraniya wan çûkên koçer in.
Li jêr jî çend babetên çûkan hene ku meriv hertim wan li derûdora xwe jî dibîne.
Gabelek çûkeke naskirî ye. Çûka deviyan zêde bala merivan nakişîne lê çûkeke xweşik e û dikare bi zarê gelek çûkan bike.
Çûka mêşan pir biçûk e û bi lez dilive.
Bi çirpîna baskên xwe ew dikare li hewa raweste û bireqise, bêyî ku ji ciyê xwe bilive.




Bilbil bi awaza xwe ya bilind, zelal, cuda û xweş navdar û ew bêtir bi şev dixwîne.

Zilore, yek ji wan çûkan e ku li seranserê Swêdê hene.

boxsor



çûka dengbêj



Xwendina çûka dengbêj, mizgîniya hatina biharê ye.

çûka malan



Boxsor, yek ji wan [illegible] herî sipehî ye. Ne tenê li daristanan lê li nav bajaran jî meriv rastî wan tê.

Çûka malan, di nav devî û diriyan de dimîne. Lê ew bêtir hez ji xwendina ser guliyê daran dike.

**textê xwarina çûkan**
Zivistanan ji çûkan re zehmet e ku ew xwarinê peyde bikin. Yek ji şêweyê arîkariya wan ew e ku meriv ji çûkan re ciyekî ji [illegible] çêke.




parûs

**çûken qefesan**

Li malan hertim çûkên qefesan hebûne. Hin ji wan sipehî ne û hinek jî deng û awazên wan xweş in. Meriv hertim dixwaze temaşe û guhdariya wan bike. Loma jî xelk wan xwedî dike.
Qefesên wan divê li gor wan bin û bi hêsanî bêne paqijkirin. Divê xwarin û ciyê wan xweş be.




**dans û govend,** li rûpela 49 û ji bo **dar** jî li rûpela 50î binere

**dara zeytûnê**

Dara zeytûnê bêtir li welatên dora Derya Sipî heye.
Dara zeytûnê sal duwanzdeh meh şîn e. Ji berê zeytûnan rûn çêdibe. Him zeytûnên şîn û xav û him jî yên reş û gêhîştî di soravkê de tên dagirtin û piştre jî meriv wan dixwin.



## dans û govend

Dans û govend di tarîxa merivan de herdem hebûye. Gelek babet dans û govend hene. Dansa ku weke çerxekê bi destên hevdu digirin hêsan û xweş e. Lê dans û govendên din ên wek vals, fokstrot û govendên gelêrî divê meriv fêr be. Bi dansa şer meriv dixwaze bi halanan cesaretê bide xwe. Dansên dînî jî hene, weke sema, cizb û yên mabedan. Bale jî cûreyeke dansa taybetî ye.





## darkutok

Darkutok çûkên daristanê ne. Pencê wan gelekî bi hêz e, du bêçî berpêş û du jê berbaş ve ne. Loma pir bi hêsanî bi daran ve hildikişin. Nikulên wan jî dirêj û xurt in. Bi nikulên xwe ew kêz û kurmên di nav qaşilên daran û darên rizyayî de derdixin û dixwin. Herweha bi nikulên xwe qalikên bihîv û gûzan qul dikin û kakilên wan dixwin.




## dar

Dar ji reh, gonc, qurm û guliyan pêk tê. Ferqa dar û deviyê ew e ku qurmê darê yek e, ji erdê bilind e û bi gulî ye. Qurmê wê êzing e, ango şaxên wê hişk û bi qaşil e. Darên bi pel û pelderzî hene. Yên pelderzî li welatên sar şîn tên.
Li dunyayê darên herî dirêj li Kalîforniyayê hene û jê re dibêjin darên Mammûtê. Dareke Mammûtê dikare 100 metreyî dirêj be û firehbûna wê jî bi qasî kolanekê be.





## darmazî

Darmazî dareke welê ye ku gelek salan dijî, temendirêj e.
Li Kurdistanê pir hene. Temenê wê dikare bigêhîje 1000 salan. Mazî û berû berên wê ne.
Text û êzingên wê gelekî hişk in.
Textên darmaziyê di çêkirina mobîlye, keştî û qeyikan de bi kar tên.



## darpêk

Gava meriv bi darpêkan diçê, divê meriv balansa xwe wenda neke. Di wêne de xuya dike ku meriv çawa dikare cotek darpêk çêke.
Darpêkek ji darekî dirêj û pêlikekê pêk tê. Divê bilindiya pêlikê ji erdê zêdeyî 50 cm nebe. Dema ku jê bilindtir be zehmet e ku meriv pê biçe.




## debançe


Debançe çekek e ku meriv bi destekî bi kar tîne. Debançeyên kevin tenê bi fîşekekê dihatin dagirtin. Lê piştre a şeşfîşekî derket. Ji bo wê jî bi kurdî jê re şeşderb dibêjin. Şeşderb 150 sal berî nuha hatiye çêkirin.
Debançeya nûjen li ser hev dikare 7-8 fîşekan bavêje.




## dedektîf


Dedektîf li sûc û sûcdaran digerin. Bi piranî polîs in lê kincên polîsan li xwe nakin. Dedektîfên prîvat jî hene. Dedektîfekî modern, ji bo karê xwe laboratûwar û teknîka nûjen bi kar tîne.





## delfîn-yûnis

Delfîn curemasiyek e ku di deryayê de dijî û zayok e, ango dizê û guhandar e.
Tu di wêne de pêvajoya zayîna wê dibînî. Yûnis pir şareza ne. Bi fîkandinê dikarin bi hev re "bipeyivin" û alîkariya hev bikin.
Yûnis her weha pir ji lîstikê hez dikin û bi hêsanî kedî dibin.




## demokrasî

Maneya demokrasiyê "desthilatiya gel" e. Di demokrasiyê de herkes beşdarî biryardanê dibe. Li ser pirsekê meriv deng dide lê biryar dibe ya piraniyê.
Swêd yek ji wan welatên demokratîk e. Her kesê ku 18 salê xwe tijî kiribe, ji bo hilbijartina birêveberiya welêt, mafê xwe heye ku beşdarî dengdanê bibe.



## deqandin

Dema meriv ciyekî xwe bideqîne, derziyê di boyaxê de dike û pê çerm kun dike. Ew boyax di binê çerm de bi xwînê re dikele û dibe deq. Îro deqandin bi makîneya elektirîkê dibe.
Di demên berê de piraniya deryavanan laşê xwe deq dikirin ku bêne naskirin.



## deqîqe

Di saetekê de 60 deqîqe hene. Nîşandeka deqîqeyan li ser saetê nîşan dide ku deqîqe çawa derbas dibin. Heger tu baş lê binerî, tu ê bibînî ku ew çawa hêdî hêdî digere. Di deqîqeyekê de 60 sanîye hene. Nîşandeka sanîyeyê di deqîqeyekê de gera xwe temam dike. Di demên berê de nîşandekên sanîyeyê û deqîqeyan tunebûne, bi tenê nişandeka saetan hebûye.




## dergûş

Di demên berê de zarokên biçûk dikirin dergûşê û dihejandin. Nuha di şûna dergûşê de bi piranî textê zarokan bi kar tînin. Dergûşeka normal ji text dihat çêkirin.
Lingên wê nîvgilover bûn û dema ku meriv ew dihejand hêl dibû û zarok tê de radiket.




## dermanxane

Li dermanxaneyê derman tên firotin. Gelek derman tenê bi reçeteya doktor tên kirîn.
Di zemanê berê de kêm zêde hemû cureyên dermanan li dermanxaneyan dihatin çêkirin.
Îro piraniya dermanan li fabrîkeyan tên çêkirin.



## derzî

Derzî aleteke gelek kevin û giring e. Meriv bi derziyê cilan didirû û cil û qumaşan kêl dike. Derzî di neqişandinê de jî tê bikaranîn. Merivên demên berê, derzî ji hestî an jî ji qiloçan çêkirine. Derziyên nuha ji metal in.




## dest

Dest parçeyekî laşê me ye ku em pir bi kar tînin. Meriv bi destan digire, davêje, rêj dike, li çepikan dixe û hwd. Di destekî de 27 hestiyên biçûk hene û ev hestî bi alîkariya masûlkan dilivin. Lepên meymûnan jî dişibin destên merivan.




## dêr

Ciyê ku xirîstiyan lê îbadetê dikin jê re dibêjin dêr. Xirîstiyan li dêrê dua dikin, guhdariya axaftinên keşîş û metranan dikin, mehra xwe li wir dibirin û zarokên xwe vaftîz dikin. Mîmariyên dêran hemû ne wek hev in. Piraniya dêran ji kevir hatine avakirin. Kumbetên wan hene û xaç li ser kumbetan e.




## dêw

Di gelek çîrokan de dêw hene. Ew ji merivan gelekî mezin û dirêjtir in. Dêw pirî caran dîn û xirab in. Di rastiyê de dêw tunene. Lê meriv bawer dikin ku dêw hene û hinek kevirên mezin yên ku li erd û ciyên rast hene, dêwan ew avêtine.



## dibistan


Li gor peymanên navnetewî divê her zarok biçe dibistanê û zimanê xwe bixwîne. Dibistana seretayî di navbera 8 û 10 salan de ye. Wek mînak, li Swêdê 9 sal e. Li gelek welatan şagird di 7 saliya xwe de dest bi dibistanê dikin. Piraniya zarokên kurdan, ne bi zimanê xwe lê bi zimanê biyanî dixwînin: bi zimanê tirkî, farisî û erebî.



## dil

Dil di sînga merivan de ye û ji masûlkan pêk hatiye. Meziniya dilê herkesî bi qasî kulma wî ye. Gava dil lêdide, ew xwînê dişîne ku her aliyekî laş oksîjen û adanê bistîne.

Xwîn ji laşê meriv di "lûlikan" re diçe dil û tê, em jê re dibêjin rehê xwînê.



## dingil

Her tekereke otomobîla vî zarokî li ser dingilekî ye. Hemû teker û parçeyên ku di makîneyan de dikarin bizivirin, li dingilan siwarkirî ne.
Ji bona zîqezîq ji wan neyê, germ nebin, teker û dingil xirab nebin, divê meriv wan rûn bike.





## diran

du caran diranên me derdikevin, pêşiyê 20 diranên şîr derdikevin. Dema meriv dibe 6 salî, diranên şîr dest pê dikin yeko yeko dikevin. Lê di şûna wan de yên nû dertên û ew êdî heta dawiya jiyanê dimînin û li ser hev 32 diran in. Karûbarên diranan cuda cuda ne. Diranên pêşiyê xwarinê jêdikin, yên kêlekê jî digrin û hûr dikin.


Diranên tûj û yên kursî xwarinê dihêrin. Divê meriv li diranên xwe baş mêze bike. Tiştên şîrîn ji bo diranan ne baş e.
Berî raketinê, divê meriv diranên xwe firçe bike.






ji jor ve diran bi vî awayî xuya dikin

hundurê diran:




**dirîreşk**

Dirîreşk devîdiriyeke bejî ye. Berên wê mîna tûyên sor û reş in. Meriv dikare bi xwe jî wan li nav baxçeyan biçîne.
Deviyên dirîreşkan nêzî metreyekê bilind dibin.
Dirîreşkên bejî ji yên baxçeyan biçûktir û şîrîntir in.




**dînosaur**


Dînosaur gumgumokên pir mezin in. Ji malbata ajelên kaşok in.
Sed mîlyon sal berê li dunyayê jiyane. Beriya peydabûna merivan qeliyane û êdî nemane. Hin ji wan gelekî gir bûne.
Brontosaurus ji gişan mezintir bûne.
Giraniya wan 30 hezar kîlo û dirêjayiya wan jî digêhîşt 20 metreyan.
Hin dînosaur hov bûn û hinek ji wan jî aram bûn û tenê giya dixwarin.



**doktor**
Gava ku em dibêjin “doktor” berî hertiştî “bijîşk” tê bîra me, dema ku em nexweş dikevin me kontrol dike, derman dide me, me baş dike. Ji bilî bijîşkiyê gelek cureyên din ên doktoriyê hene. Li unîversîteyê dereca herî bilind doktorî ye. Ew kesên ku di îmtihana doktoriyê de bi ser dikevin, kumekî taybetî didin serê xwe.



**doktor–bijîşk**
Heger kesek nesax bikeve, divê ew here ser doktor. Doktor nesaxan baş dikin.
Lê wek mînak li dibistanê jî carina doktor li şagirdan dinerin.
Bi vî awayî rê li ber nexweşiyan digirin.




**domptor**
Domptor ji wî kesî re dibêjin ku ew ajelan kedî dike. Wek nimûne: şêr, piling û gelek ajelên din fêrî hin huneran dike. Hem domptorên jin hem jî yên mêr hene û divê di karê xwe de netirsin.



## dorînckar


Pixêrî û rojin gelekî tenî û dorîncê digirin. Ger meriv paqij neke, piştî demekê teniya wê dibe mîna qîrê û pixêrî dixetime. Herweha ev tenî dikare bişewite jî. Loma divê meriv pixêrî û rojinan hertim paqij bike. Kesê ku karê paqijkirina pixêrî û rojinan dike, jê re dibêjin dorînckar.

Di wêne de dorînckarek rojinê paqij dike.



## dûrbîn

Meriv bi alîkariya dûrbînê dikare tiştên dûr bibîne. Dûrbîn tiştên dûr nêzîk dike. Di dûrbînên normal de du mercek hene, yek li pêş û yek jî li paş e:
Okuler û objektîv. Prîzma jî wêne sererast dike.





## dûvmeqesk

Dûvmeqesk çûkeke xweşfir e. Bi piranî li hewayê dimîne. Xwarina dûvmeqeskan mêş û megez in. Meşa li erdê ji bo wan zahmet e. Loma jî ew hêlînên xwe li ciyên bilind yan jî di siryaxên xaniyan de çêdikin.
Gelek caran dûvmeqesk ref bi ref dijîn. Dûvmeqesk li payîza paşîn koçî Afrîkayê dikin. Li hinek deverên Kurdistanê ji bo dûvmeqeskê hechecik jî dibêjin.




**ejdiya**
Ejdiya cinawirek e ku tenê di çîrokan de heye. Lê di demên berê de gelek kesan bawerî bi hebûna ejdiyan dihanî. Di çîrokan de bi piranî ejdiya ne baş in. Yan nobedarên xezîneyan in, yan jî prensesan direvînin. Tenê prensek an jî siwarekî mêrxas dikare wan bikuje.



**elok**
Elok ji malbata mirîşkan e. Ser û qirika wan zilût in. Çermekî dirêj bi nikulê wan ve heye.
Elok ji Amerîkayê li dunyayê belav bûne û îro li her deverê hene û peyda dibin.




**emeliyat**
Rodiya kor a Merwan kul dibe. Pêwîst e ku ew here nexweşxaneyê û emeliyat bibe.
Pêşîyê ew Merwan dixewirînin ku bi tiştekî nehese. Doktor zikê wî diqelêşe, ciyê kul jêdike û davêje. Û dîsa zikê wî didirû û baş dibe.



## e-name

Zînê bi komputerê ji Temo re nameyekê dinivîse. Ew vê nameyê bi e-postê dişîne. Name xuya nake û bi sînyalên elektronîkî diçe "qutiya posteya" komputereke navendî. Ji ber ku hemû komputer bi navê " înternet"ê mîna torekê bi hev ve girêdayî ne, loma dema Zînê, e-nameya xwe dişîne navnîşana Temo, ew name rasterast diçe dikeve "qutiya posteyê". Temo dikare vê nameyê ji qutiya posteya komputera navendî bigire û di komputera xwe de bixwîne.





## endazyar

Kesê ku ji aliyê teknîkî ve perwerde û hîndekariyê dibîne, dibe endazyar. Endazyar pêwîst e ku bikaribe plan û projeyan çêbike û di pratîkê de bi kar bîne. Endazyar plan û projeyên rê, pire, makîne û gelek tiştên din çêdikin.



**epîdemî**
Gava ku gelek kes di heman wextê de bi nexweşiyeke têger (nexweşiya ku ji hev digirin) nexweş dikevin, ew epîdemî ye. Nexweşiyên epîdemîk ên herî belav nexweşiyên zarokan in, herwekî sorik, mîrkutok, kuxik. Gelek caran meriv bi epîdemiya bapêşê jî dikeve.



**erdgilor**
Erdgilor wek gogekê nexşeyeke gilover e. Hemû nexşeyên welat û deryayên dunyayê li ser in. Ji ber ku dunya bi xwe gilover e, meriv rastiya dunyayê li ser nexşeya erdgilorê baştir dibîne.



**eskîmoyî**
Eskîmoyî li seranserê peravên Gronland û peravên Derya Qeşayî dijîn. Eskîmoyiyan berê nêçîrvanî û masîgirî dikirin. Wan pirê caran bi qeyik û kelekên ji çermên fokan masî digirtin. Ew di îglo, kozikên qeşayî û konên ji çermên fokan de diman. Îro piraniya eskîmoyiyan di xaniyan de dimînin.



**ewliya**

Di gelek dînan de ewliya pîroz û xwedî giram in. Ewliyayên mêr û jin hene ku wan tevayiya jiyana xwe dane rêya Xwedê. Bi gotineke din li gor rê û rêbazên dînî jiyane.
Li dêrên katolîkan, li ber wêne an jî peykerên ewliyan meriv findan pêdixin.




**ewr**

Ewr ji xunav û pişrûgên berfa hewayê pêk tê. Xunav û pişrûg di nava hewayê de hene û digerin. Dema tav li ruyê erdê dixe, hilm û gulm ji ava suriştê radibe û ber bi asîman hildibe.
Dûre ew hilm û gulma li hewayê sar dibe û dibe ewr. Piştre ew ava ku di nav ewr de ye dikare bibe baran, berf an jî zîpik û bibare.




**eylo**

Eylo di nav çûkên laşxur de xwediyê baskên herî mezin in. Li serê zinarên bilind hêlînên xwe çêdikin. Gelek cureyên eyloyan hene. Eylo nêçîra çûk û heywanên biçûk dikin û dixwin. Ji ber jehriya dermanên ziraî hejmara eyloyan kêm dibe. Li hinek ciyên Kurdistanê jê re dibêjin qertel jî.



## êlekê avê

Heger kesek avjeniyê zanibe jî, dema ew li nav avê li kelek an jî keştiyeke biçûk siwar be, divê êlekê avê li xwe bike.
Di keştiyeke mezin de jî pêwîst e êlekên avê hebin. Ger qeza û belayek derkeve, êlekê avê bi kêr tê. Mezinbûna wan li gor giraniya laşê merivan e.



## fabel

Fabel, çîrokek kin e ku meriv tiştekî jê hîn dibe. Piraniya fabelan li ser ajelan e, wek mînak:
Hestiyek di devê kûçikekî de bû.
Kûçik hat ser pireyeke biçûk. Çaxa ew di ser pireyê re çû, siya hestiyê devê xwe di nav avê de dît.
Kûçik got qey hestiyekî din e ku di nav avê de ye û ji bo siya hestî bigire, yê di devê xwe de avêt. Herweha kûçik bê hestî ma û tiştek bi dest nexist.




'ji bo pariyekî keriyek da'

Gelo meriv ji vê çîrokê çi hîn dibe?

## feqîr

Feqîr derwêşên hîndî ne, bi hunera livbaziyê laşê xwe fêr û amadeyî êş û azarê dikin. Wek mînak ew dikarin sîx, şûjin û xiştikan di laşê xwe re kin an jî wek di wêne de xuyaye, li ser gelta bizmaran rûnin.



## firfirok

Firfiroka herî hêsan weha çêdibe: Du darikan wek xaçekê bide ser hev û girêde. Bi benekî jî serê wan bi hev ve girêde. Kaxiz, pel an jî potikekî tenik pê ve bizeliqîne. Bi benekî guliyekê çêke û pê ve ke, ew jî dibe boçika wê. Gulokek ben bigire, serê ben bi firfirokê ve girêde û firfirokê bifirîne.



## firina elektrîkî

Di piraniya firinên elektrîkî de hem firin û hem jî sêlikên germkirinê hene. Li ser wan sêlikan meriv dikare xwarinê çêke û avê germ bike.
Di hundurê firinê de meriv dikare nan bipêje û xwarinê çêke.




Di firinên elektrîkî de li jêr û jor şîşik hene. Dema elektrîk tê ev şîşik disincirin.

**firingî**
Firingî sebzeyek e û ew û kartol ji malbatekê ne.
Li Kurdistanê firingî pir tên çandin. Hema hema di çêkirina her xwarinê de firingî heye. Zivistanan jî li welatên sar firingî di camekanan de tên çandin. Firingî tijî vîtamîn e. Li hinek aliyên welatê me ji firingiyê re dibêjin, bacanê sor an jî şamik.



**fîl**
Fîl di nav ajelên reşayiyê de yê herî mezin e. Giraniya fîlekî dikare heta 7 tonî be. Fîl li Afrîka û li Hîndistanê hene. Fîlên Hîndistanê bi piranî tên kedîkirin û wek ajelên barkêşiyê di karên daristanan de bi kar tînin.





**fîlê avê**
Fîlên avê ku jê re dibêjin ’walrus’, li bakurê Gronlandê, li derûdora Derya Qeşayî bi garanî dijîn. Fîlê avê ji malbata fokan e. Fîlê avê dikare ji çar metreyî dirêjtir be û nêzîkî 2000 kîloyî jî giran be.
Fîlê avê bi qîlên xwe mîdye û şeytanokên binê deryayê radike û dixwe.



# flût

Flût amûreke pifbar e, gelekî kevin e. Piraniya wan ji dar tên çêkirin. Fikra çêkirina hemû flûtên ku îro hene ji hebûna paneflûtê hatiye. Paneflût ji gelek lûleyan pêk tê ku dirêjahiya wan ne wek hev e. Piştre xelkê flûta adetî bi kar anî. Îro di orkestrayan de bi piranî flûta berwarkî ya metalîk tê bikaranîn. Cureyeke wê ya kin jî heye ku jê re dibêjin kurteflûta berwarkî.




# fok

Fok li gor jiyana nav avê kemilîne. Ew guhandar in, ango dizên, lê laşê wan dişibe yê masiyan. Gelek cureyên fokan hene: şêrê deryayê, fîlê avê û hwd... Li peravên Swêdê sê cureyên wan hene: fokê gewrik, fokê bazink û fokê gupişk.




# fotbol

Fotbol spora herî bi nav û deng e. Lîstika fotbolê di sedsala 18an de li Îngilîstanê dest pê kir û li seranserê dunyayê belav bû. Her hêlek ji 11 lîstikvanan pêk tê. Her maçek du dewre ne. Her dewreyek jî 45 deqîqe ye.




## gakoviyê bakur

Ajelên herî mezin li Swêdê gakoviyên bakur in. Ew ji du metreyan bilindtir in.
Gakoviyên bakur li nav daristanê dijîn, giya û pelên daran dixwin.
Gakoviyên nêr bi şax in.



## galaks

Li ruyê asîman gelek komên sitêrkan hene. Ji van koman re dibêjin galaks. Yek ji van galaksan Kadiz e û roja me jî di nav de ye. Dema tu li asîman binerî tu ê li her deverê sitêrkan bibînî. Heger te bikaribûya tu bi mîlyonan mîl biçûya jor te ê ev wêne bidîta.




## gamasî


Gamasî ne masî ne, ew heywanên guhandar in. Ew çêlikan tînin. Gamasî di avê de dijîn û bi pişikên xwe hewayê digirin. Hinek ji wan diranên wan hene û hinek jî diranşehî ne. Gamasî yek ji wan ajelên herî mezin e. Li hinek deverên Kurdistanê ji gamasî re dibêjin, hûtê avê.



**geometrî**

Geometrî karê xêz, xal, cismên rûber û avahiyan e. Wek tiştên sêgoşe, çargoşe, çarçik û hwd. Mînak ji bo rûberên rast, kûbîkî û gilover. Ji zû ve xelkê erd û zeviyên xwe pîvane. Zanyariya geometriyê di avakirina xaniyan û di gera nav deryayê de gelekî giring e.





**gezgezok**

Gezgezok bêtir li koncal û derê malan şîn tê. Pelê wê bi pirç e. Ev pirç bi jahr e. Heger meriv dest bide wê an jî li devereke tazî ya laşê meriv bikeve, wir sor dike û dişewitîne. Lê dîsa jî gezgezok tê xwarin.

Biharê meriv dikare bistiyên wan yên teze bikelîne û jê şorbeyê çêke.



**gêlaz**

Du cureyên gêlazan hene: gêlazên şêrîn û yên tirş. Darên gêlazan biçûk in û guliyên wan firk in.
Yên tirş bi çêj û lezet in.
Ji bilî xwarinê mirov dikare şerbet û rîçala wan jî çêke.



**gêzer**

Gêzer ji bo laşê meriv gelek bi kelk e. Bi navê karotîn madeyek di gêzerê de heye û ew rengekî porteqalî dide wê. Dema em gêzeran dixwin, karotîna ku tê de heye di laşê meriv de dibe vîtamîn-A. Însanan ji serdema kevirî û vir ve gêzer çandine.




**gindor**

Ji kuna hirçê re gindor dibêjin. Hirç zivistanê dikeve gindora xwe, radikeve û heta biharê dernakeve. Qula hirçê dikare di bin zinarekî de be an jî hirç bi xwe axê dikole û çêdike. Dikare li bin darekê be jî. Kurd dibêjin hirç 40 rojan dikeve xewa zivistanê, xwarinê naxwe û tenê binê lingên xwe dialêse.



**girêk**

Meriv dikare bi ben, benê sênîx û bi têlan tiştan bi hev ve girêde an jî bi alîkariya girêkê bişidîne.
Gelek cureyên girêkê hene.
Di wêne de tu dibînî meriv çawa benê solan girêdide.



**girî**

Dema meriv şiyar e, di kaniya çavê meriv de aveke şor kom dibe. Ev av çav diparêze û di kanalên rondikan re diherike pozê meriv.
Dema meriv hêrs bibe, kêfxweş bibe an jî çavê meriv bixure rondik ji çavan dirijin. Êdî meriv digirî. Li hin deverên welatê me ji bo rondikan dibêjin hêsir.




**gîtar**

Gîtar amûreke têldar e. Şeş têlên wê hene. Meriv bi tilî an jî bi mizrabê li têlan dide. Ev amûreke spanî ye.
Bi taybetî li Spanyayê xelk gelek jê hez dike. Di muzîka popê de elektro gîtar bi kar tê.




**gog**

Çi biçûk û çi jî mezin herkes ji lîstika gogê hez dike. Ji hezar salan û vir ve ye ku merivan gog çêkirine. Awayên lîstikên gogan gelek in: fotbol, basketbol, tenîs, golf hwd.




**golf**


Golf lîstikeke gogê ye. Meriv bi kaşoyê li gogê dixe ku bikeve çalokê. Taybetiya vê lîstikê ew e ku kî di kêm derban de gogê dixe çalokê.
Gelek cure kaşo hene. Hin ji wan ji dar û hin jî ji hesin in. Di qada golfê de 18 çalok hene.




**gorîl**

Nêzîktirîn xizmê însanan gorîl e. Ew dikarin du metreyan dirêj û ji 200 kîloyan jî girantir bin. Gorîl gelek bi hêz in. Herçiqas hov xuyabin jî lê ew aram in. Gorîl şînahî û meyweyan dixwin. Ew li Afrîkayê bi tenê li herêmekê hene.







## guh

Guh ji sê beşan pêk tê: guhê derve, guhê navîn û guhê hundur. Pêlên deng di kerika guh re diçin û li perdeya guh dikevin. Perde bi deng re dilerize.
Lerz li hestîka bihîstinê ya navîn dikeve. Ew jî şeytanoka guh dilivîne.
Şeytanok jî deng vediguherîne sînyalan, sînyal bi rêya rehê bihîstinê diçin mejî.
Guhê derve dikare bi çend babetan xuya bike.
Kûçik dikarin guhên xwe yên derve bel û biçûk bikin ku dengê sist û nizim bibihîsin.
Guhê fîlan yên derve gelek mezin e. Guhê beqan yê derve tuneye, tenê kerikek e.







**guhandar,** li rûpela 74an binere

## gul

Xelk gelekî ji gulan hez dikin. Gul nîşana xeml û evîniyê ye. Bi hezaran cureyên wê hene. Şax û guliyên wê bi dirik in. Rengê gulan sor, sipî, zer û hwd in. Bîhneke xweş ji wan tê. Gulên bejî jî hene û şîlan jî yek ji wan e.



## guhandar

Çêlikên guhandaran şîr dimijin. Ango piştî ku ew çêdibin, diya wan şîr dide wan. Guhandar ji hemû ajelan kamiltir in. Hemû jî çêlikan tînin. Çêlikên wan di zikê diya xwe de mezin dibin û tên der. Bi gotineke din ew dizên. Piraniya ajelên kedî guhandar in. Mêr bi xwe jî guhandar in.











## gulmêxik

Gulmêxik tê çandin û gelek rengên wê hene. Bîhna gulmêxikan xweş e. Gulmêxik bi şax e û piştî ku meriv jêdike, divê meriv wê bixe nav guldanka avê. Li hin deverên welatê me ji gulmêxikê re dibêjin qerenfîl.



## gumgumok

Gumgumok wek maran ajelên kaşok in lê bi ling in û gelek cureyên wan hene. Ew kurm û mêşan dixwin.
Piraniya gumgumokan li navçeyên germ dijîn. Gumgumokên bejî û avî hene.





## gur

Gur dişibin kûçikên xurt. Pirça wan zer û gewr e. Gur mişk, cirdon û çûkan dixwin. Gur revde bi revde digerin, nêçîra bizin, mîh û ajelên din dikin.
Li Kurdistanê gur gelek in. Zivistanan dema zêde berf dibare, gur êrîşî gund û bajaran dikin û ji bo merivan jî dibin talûke.



## gurçik

Gurçik di laş de organa paqijkirina xwînê ye. Tê de bi mîlyonan gilokên ji tayikên xwînê hene ku wek fîltre dixebitin. Piştî ku xwîn paqij dibe, qirêja mayî diçe mîzdankê.
Dema mîzdank tijî dibe, mîza meriv tê.



## gurêx

Ew cinseke ji kûçikên almanî ye. Di destpêkê de bi şivanan re li ber pez bûn. Keriyên mîhan ji guran diparastin. Nuha bêtir wek kûçikên polîsan bi kar tên û rêberiya kesên kor dikin.



## halet

Meriv bi halet cot dike. Beşê ku erdê diqelêşe û diqûlibîne, ew parçe hesinek e ku jê re gîsin dibêjin. Meriv dikare bi halet şûv, pirêze û erdê zibilkirî jî serobino bike. Berê haletê cot davêtin pey ga û hespan, lê îro bi traktorê cot dikin. Li hinek deverên welatê me hîn jî cotê bi ga û hespan heye.



## hamburger

Hamburger xwarineke amerîkî ye û îro li her deverê dunyayê belav bûye. Goştê dewaran hûr dikin, dikin wek kulor, dibirêjin û dixin nav du parçe nan.
Meriv dikare xas, xiyar û ketchupê jî têxe nav.




**hamster**

Hamster ajelekî kojer e. Ji malbata mişk, cirdon û simoreyan e. Ew qût û xwarinê kom dike û vedişêre.
Cinsekî wan heye ku jê re dibêjin hamsterê zêrîn. Ew gelekî populer e û bêtir ev cins di malan de tên xwedîkirin.




**hejîr**

Hejîr bi daran ve çêdibin. Darhejîr li welatên germ şîn dibin. Tu dikarî hejîran ter an jî hişkirî bixwî. Hin hejîrên ter reş in, hin sor, hin zer û hinek jî şîn in.
Rengê hejîrên hişkirî jî qehweyî ye û gelekî şêrîn in. Hejîra hişkirî ji nîvî bêtir şekir e. Dendikên wan pir biçûk in. Di hejîrekê de gelek dendik hene.



**hejmar**

Bi hejmaran meriv dikare tiştan bijmêre, bizanibe tiştek bi çiqasî ye, çiqas giran e, çiqas dirêj e.
Li vir ji (0)ê heta (9)an hejmar hatine nivîsîn. Wekî ku tu di wênê de dibînî ev (0) bi serê xwe ne tiştek e, lê dîsa jî di jimartinê de hejmareke girîng e.



**helalûk**
Helalûk bi hêsanî tê naskirin. Tayê wê kin, berê wê sor, pelên wê mîna çerm û şayîk in. Meriv rîçala helalûkan çêdike.
Heger meriv şekir bi helalûkan werke, dikarin heta demeke dirêj xera nebin.



**helîkopter**
Helîkopter cureyek balafiran e ku ew dikare ber bi pêş û paş, bi jor û jêr ve bifire. Ew dikare li hewa li ciyê xwe raweste. Helîkopter bi alîkariya perwaneyan li hewayê difirin û radiwestin.
Du perwaneyên wê hene. Yek bi jora helîkopterê ve ye, ya din jî bi dûvika wê ve ye.




**hemşîre**
Hemşîre li nexweşxaneyan kar dikin. Li nexweşan dinerin û wan derman dikin. Hemşîre ji doktoran kêmtir dixwînin. Herçiqas îro li nexweşxaneyan hemşîreyên mêr hene jî lê li Ewropayê dîsa jî ji wan re dibêjin “syster” ku tê maneya xwişk.




## hesinger

Hesinger ji metalan alav û tiştan çêdike. Pêşiyê parçe hesinekî dike hêtûnê û bi pifa kûreyê agir gur dike. Hesinê di agirê hêtûnê de sor dibe û dibe mîna bizot. Paşê wî hesinê germ dide ser sindanê, bi çakûçekî giran wî hesinî dikute û formekê didiyê. Hesinger kilît, çengal, kêr, das, bivir, nalê hespan û hwd çêdikin. Ji vî karî re dibêjin hesingerî.





## hesp

Beriya 5000 salan hesp hatiye kedîkirin. Berê hesp bi piranî ji bo siwarbûnê, di şer û nêçîrê de bi kar dihat. Piştre, bi hespan bar kişandin, cot kirin û gerdûm avêtin pey wan. Li gelek welatan hespan beşdarî spor û pêşbirkan dikin. Navê yên nêr hesp, yên mê mehîn û çêlikên wan jî canî ne. Gelek cinsên hespan hene.



## hespê avê

Hespên avê ajelên kovî ne, mezin û nelihev in. Du cinsên wan hene. Hespên avê normal dikarin 4 metreyan bilind û bi qasî 300 kîloyan jî giran bin. Giraniya hinek cinsên wan nêzîkî 200 kîloyan e. Ew li ber çem û golên Afrîkayê dijîn. Hespên avê baş avjeniyê dikin û piraniya jiyana xwe di nav avê de dibuhurînin.



Hespên avê bi giya û hêşînahiyên nav avê dijîn. Devê wan fireh û gepên wan mezin in. Çaxa avjeniyê dikin, bi tenê firnik, çav û guhên wan di ser avê re ne.

## hevris

Hevris bi piranî devî ne, lê carina jî dibin dar. Sitriyên hevrisê tûj in. Berên wan reş û şîn in. Ji berên wan biharatê çêdikin.
Meriv ji darên wan kêrika rûn, hesk, çoçik, kevçî û tiştên weha çêdike.




## hewa

Hewa nayê dîtin. Lê dema ku tu pifî tiştekî dikî, tu dizanî ku hewa heye. Hewa ji gelek gazên cuda pêk hatiye. Ji pêncan yekê hewayê oksîjen e ku pêwîstiya hemû jîndaran pê heye, yên mayî jî hîdrojen û gazên din in.



## hezimkirina xwarinê

Ji bo ku laşê meriv adanê bigire, divê xwarin hûr bibe û bibe weke hevîr. Ev rêyeke dûrûdirêj e. Xwarin ji dev dest pê dike, di lûleya xwarinê re derbasî asikê dibe, diçe rodiya zirav. Li vir adana ji laş re pêwîst li laş belav dibe. Yê mayî jî li wir dikeve rodiya sitûr û di wir re jî dibe gû û tê der.




## hêlekan

Gelek cureyên hêlekanê hene. Meriv dikare darekî dirêj li ser tiştekî dayne û du kes, her yek li aliyekî rûne û xwe hêl bike. Ji viya re dibêjin zirnezîq. Meriv hêlekanê jî bi ben an jî bi zencîrekê çêdike. Ben an zencîrekê weke du seriyan bi du aliyên jora derekê ve dadiliqîne û xwe têde hêl dike.




## hêştir

Hêştir dikare demeke dirêj bê av bimîne. Ew di milikê pişta xwe de gelek adanê berhev dike. Hêştirên dumilik li Asyayê ji bo bar û siwarbûnê bi kar tînin. Hêştirên yekmilik jî li Erebistan û bakurê Afrîkayê hene. Ji hêştirê nêr re dibêjin lok û ya mê re jî dibêjin meye.




## hêştirmel

Hêştirmel balindeyeke gir e û piraniya wan li Afrîka û Erebistanê dijîn. Ew dikarin bi qasî du metre û nîvan bilind bin. Giraniya wan jî dikare heta 135 kîloyan be. Hêştirmel nikarin bifirin lê dikarin ji hespekî zûtir bibezin.
Ew ref bi ref dijîn.




## hilm

Dema lawik di hewayeke sar de diçe der û piştre vedigere jûra germ, berçavika wî hilmê digire. Li her ciyekî di nav hewayê de hilmeke nexuyayî heye. Heger hilm sar bibe wek berçavika vî lawikî xwêdan dide û dilopên avê pê dikeve. Ji vê re dibêjin hilm.



**hilû**
Pelên dara hilûyê gur e. Hilûyên zer, sor û reş hene.
Hilû ji klîmata germ hez dikin. Li welatê me Kurdistanê hilû gelek in û li hinek deveran ji hilûyan re dibêjin încas.




**hirç**
Hemû hirç hov û kovî ne. Piraniya wan bêzerar in. Hirç gûz, findiq, mêwe, kêz û mûran dixwin.
Ew zivistanan dikevin gindoran û di qulan de radikevin.



**hirça sipî**
Hirçên sipî li Cemsara Bakur dijîn. Ew gir in, yên nêr û mezin dikarin du metre û nîvan dirêj û ji 700 kîloyan girantir bibin.
Pirça wan sipî û gewr e. Hirça sipî baş ajnê dike. Nêçîra wan masî û fok in.



**hirmî**

Hirmî jî wek sêvê ji zû ve hatiye çandin û gelek cureyên wê hene. Hirmî payizê digêhîjin. Ji ber ku dara hirmiyê hişk e, darên wan di karê mobîlyayê de jî bi kar tînin.






Rûberê hîvê tijî krater in.



**hîv**

Hîv li gerdûnê peyka dunyayê ye. Ew di mehekê de li dora dunyayê digere. Herdem heman ruyê wê ber bi dunyayê ve ye. Ruyê wê ronahiya xwe ji rojê digire. Carina em hîva nîvşevî û carina jî têrşevî dibînin. Li hîvê av û hewa tuneye. Ji ber vê yekê jiyan jî lê tuneye. Li hin deveran ji hîvê re dibêjin heyv.



Di 1969an de cara pêşîn meriv çûn ser hîvê.

## hokirin

Gava ku meriv hin ajelan hoyî liv û tevgeran dike, jê re dibêjin hokirin. Wek mînak meriv dikare ajelan ho bike ku bi rengekî taybetî biçin. Heger meriv hercar bi wan şa bibe û tiştekî xwarinê wek xelat bide wan, wê demê ajel baştir ho dibin.
Hin ajel zû ho dibin, bi taybetî jî hesp û kûçik.

Hokirina hespan bi xwe re pêşbirkên spora olimpiyadê jî aniye. Di pêşbirkê de diyar dibe ku meriv hespê xwe hoyî çi kiriye.



meş — loq — çargavî



bimeş — rûne — bikeve — werîne

## holik

Holik mîna kozekê ye, xaniyekî sivik û sade ye. Holikên her welatî cuda cuda ne. Wek nimûne: îndîyanî holikên xwe ji çerm çêdikin, lê eskîmoyî ji qeşayê çêdikin û jê re dibêjin îglo. Û li Afrîkayê holikan ji zil, pûş û palaxê çêdikin.
Li Kurdistanê jî bêtir ji dar, çilo, qirş û pejikan çêdikin.




holika çermîn

## hoqebaz

Ew kesê ku dikare çend gog û tiştan bi hev re bavêje û bigire, jê re hoqebaz dibêjin.
Hoqebaz hunermendê gogan e.
Hoqebaz bi piranî di sîrkusan de xwepêşandanan pêk tînin.



## huner

Dema em dibêjin huner, wêne, tablo û peyker tên bîra meriv. Hunermendek dikare bi firçeyê wêne çêbike. Hunermend dikare pêşî li ser kevir, text, cebs, bronz an jî platekê wêneyekî çêbike û dûre wê li ser kaxizekê çap bike. Ji hunerê weha re dibêjin grafîk.




## îbadet

Di hemû olan de îbadet heye. Li gora dîn dema ku meriv nimêj û dua dike, meriv sererast bi Xwedê re dipeyive. Bi dua û niyazan meriv daxwaz, hêvî an jî dilxweşiya xwe dide der. Xiristiyan destên xwe dixin nav hev. Musliman li ser secadê li ser çogan destên xwe ber bi jor vedikin û ji Xwedê lava dikin.




## îglo


Bi zimanê eskîmoyiyan îglo xanî ye. Îglo ji berf û qeşayê tê avakirin. Navdera îgloyê bi piranî bi tunelekê dest pê dike. Eskîmoyiyan berê di zivistanan de xaniyên xwe weha ji berf û qeşayê çêdikirin. Nuha di dema me de eskîmoyî jî di xaniyên normal de dijîn.



## înfeksiyon

Sedema gelek nexweşiyan înfeksiyon e. Ev tê wê wateyê ku înfeksiyon ew e ku bakterî û vîrusên jîndar dikevin nav laşê meriv. Ev hewqas biçûk in ku meriv ancax dikare bi mîkroskopan bibîne. Dema ku meriv bipişke, hilma xwe bide û bistîne an jî destê xwe bide hev, dikare bakterî û vîrusan ji hev bigire.







**pîşekarên jêhatî**
Gelek îndîyanî pîşekarên zîrek bûn. Îndîyaniyên Amerîka Bakur gelek tiştên sipehî ji perik û tiştên din çêkirine.
Çekên baş saz kirine. Îndîyaniyên Amerîka Navîn û Başûr ji kevir, kremît, metal û zêr gelek tiştên xweşik çêkirine.

## Îndîyanî

Dema cara pêşîn însanên sipî çûn Amerîkayê, guman dikirin ku çûne Hîndistanê. Ji ber vê yekê ji xelkê wir re gotin hîndî. Lêbelê berî ku însanên sipî biçin Amerîkayê bi hezar salan îndîyanî li wir dijiyan. Ew ji bakur heta başûr bi kom û eşîrî dijiyan.
Ewropiyên ku çûn Amerîka Bakur, îndîyanî bi darê zorê ji wir derxistin. Heta sedsala berî nuha jî di navbera ewropiyên ku çûn Amerîkayê û îndiyaniyan de şer hebû. Her ku hejmara îndiyaniyan kêm bû, bi darê zorê jî ew li hinek herêman hatin komkirin.

**li herêma çiyayên Andê**
Çiyayên Andê li Başûrê Amerîkayê zencîreçiyayên herî mezin û giring in. Li wê herêmê ji hezar salan ve împaratoriyeke mezin hebûye.
Navê vê împaratoriyê Înka bûye. Nuha jî li wê herêmê bi qasî 10 mîlyonî îndîyanî dijîn. Piraniya wan yan gundiyên feqîr yan jî kar-kerên kanên rejiyê ne.






**li deşt û çolên Amerîka Bakur**
Îndîyaniyên ku li deşt û çolên Amerîka Bakur dijiyan nêçîra gamêşan dikirin. Ew koçer bûn. Wan kon û malên xwe li ser darbestekê girêdidan, davêtin pey hespan û dikişandin. Tekerên darbestê tune bûn. Ji îndîyaniyên deştî re “sioux” û “apachî” digotin.



**li cengelên Amazonê**
Li Amerîka Başûr, li cengela derûdora Amazonê nuha jî gelek îndîyanî dijîn. Debara wan li ser nêçîr û masiyan e. Cot û cobariyeke demên berê dikin.
Piraniya çandiniya wan lazût e. Îro jî ji ber merivên sipî ber bi herêma çiya ve diçin û li wir dimînin.



## înstrumentên pifbar

Înstrumentên pifbar dikarin mîna bilûr û klarnetê ji dar an jî mîna trumpet, tuba û basonê ji paxir bên sazkirin.
Navekî din yê van înstrumentan "aletên kêmdeng" e.




## îshokey

Li dunyayê yek ji wan lîstikên populer e. Li ser qeşayê tê lîstin. Lîstikeke bi lez û dijwar e. Tîma wê ji şeş kesan pêk tê. Sê lîstikvan li pêş, dudu li hêla paş, qeleyê diparêzin û yek jî qelecî ye. Sê peryodan tê lîstin û her peryodek jî 20 deqîqe ye. Divê lîstikvan bi kaşoyan gogê bavêjin qeleya hember.



## jeans

Jeans cureyek pantorê dirêj û ji pembû ye. Bi piranî rengê wî şîn e. Qumaşê wî zexm e. Berê wek şemedan dihat bikaranîn. Bi sed sal beriya nuha cara pêşîn kowboyên amerîkayî li xwe kirine. Lê îro herkes li xwe dike, hem ciwan û hem jî kal.



## jeep

Cureyek otomobîlan e, ne bi tenê li ser rêyên rast, herweha meriv di rê û ciyên kert û kort de jî dikare bajo. Motora wê her çar tekeran jî digerîne. Cara pêşîn eskerên Amerîkayî jeep bi kar anîne. Jeep û makîneyên araziyê di ciyên daristan û çolan de bi kar tînin. Jeep ji bo rêyên gund û çamûr, kert û kort gelek baş e.



## jenîn

Her cara dil lêdide, xwînê pompeyî laş dike. Ji vê tevgera xwînê re jenîn dibêjin. Meriv li aliyê hundur yê zenda xwe lêdana jenînê baştir hîs dike. Lêdana jenînê divê herdem wek hev be. Dema zor li laş tê, lêdana jenînê jî zêdetir dibe.
Li hinek deverên welatê me ji jenînê re dibêjin nebiz.



## jockey

Ew kesên ku karê wan ajotina hespan e û beşdarî pêşbirka hespan dibin, jockey in. Jockey divê bi kîloya xwe sivik be. Cil û bergên jockey ev in: cîzme û şalwarê siwarî, îşlik, mîgfer û kum. Bi wan tiştan re qemçiya ajotinê jî heye.
Peyva jockey di zimanê me de weke jokey bi lêv dibe.



## jojo

Jojo meqereyek e ku li dora wê kertikekê vedikin û benê sênîx lê dipêçin. Dûre bi vî benî ber bi jor û jêr dibin û tînin.
Jojo lîstikeke gelek kevin e û nuha jî dem dem populer dibe.



## jûjî

Dema jûjî talûkeyekê bibîne, ser û lingên xwe dikşîne hev û dibe wek gogeke ji dirikan. Jûjî kurm û kêzikan dixwe. Jûjî zivistanan xwe di bin pel an jî qulikekê de vedişêre, heta biharê dikeve xewê û dernakeve.



## kakao

Meriv dendikên dara kakaoyê derdixe û hişk dike. Kakao li welatên germ hêşîn tên. Berê li Amerîkayê dihatin çandin lê nuha li gelek ciyên Afrîkayê jî tên çandin. Pelên darên kakaoyê gelekî dirêj in.
Dema em dibêjin kakao çokulad tê bîra meriv. Ji ber ku meriv çokulad jê çêdike.



Mêweyên kakaoyê dirêj in û dendik di nav de ne.


## kaktûs

Kaktûs li herêmên deşt û germ hêşîn tên. Bi piranî pelên kaktûsan tunene û bi darên wan ve sitriyên pan û sitûr hene. Ji bo ku pelên wan pan û dirêj in, gelek avê dikişînin. Gulên kaktûsan sipehî ne. Gelek cureyên wan ji bo xemlê li salonan datînin.



## kamera

Hundurê kamerayê reştarî ye. Lê dema meriv pêl li bişkoka fîlmkişandina wê dike, bi demeke gelek kurt ronahî diçe hundurê kamerayê û vedimire. Ronahiya ku ji laleyê tê, di merceka objektîfê re derbasî kamerayê dibe. Ew mercek ji bo fîlmê ku li dawiya kamerayê ye, ronahiyê kom dike. Wêne bi serberjêrkî dikeve ser fîlm.



## kangurû

Kangurû heywaneke bi tûrik e. Kangurûya mê tûrikek di bin zikê wê de heye. Dema çêlikên wê çêdibin, heta ku mezin dibin, di wî tûrikî de dimînin. Kangurû bi tenê li Australyayê hene. Bi keriyan digerin û giya dixwin. Hinek ji wan heta du metreyî bilind dibin. Lingên wan ên pêşîn kin û yên paşiyê gelek dirêj in.




## kanot

Ji kelekên sivik, zirav û dirêj re kanot dibêjin. Meriv dikare bi bêrikan bikişîne an jî bi baskebayê bajo. Kayak ji eskîmoyiyan, kanadenser jî ji îndîyaniyên bakurê Amerîkayê li cîhanê belav bûne.




## karawan

Karawan xaniyekî biçûk î li ser tekeran e. Meriv karawanê davêje pey otomobîlê û kuderê bixwaze dajo wê derê û li wir êdî pêwîstiya meriv bi xanî namîne. Ji ber ku piraniya tiştên ku di xaniyekî de hebin, di karawanekê de jî hene. Wek nimûne, ciyê razanê, kursî, mase, lampe, kalorîfer, sarincok û hwd.



## karê destan

Berê hemû firax û alav bi destan dihatin çêkirin. Nuha di fabrîkeyan de çêdikin. Lê hîn jî li gelek ciyan ev karê destan heye, wek mînak koşkarî û xeratî.
Jinika di wêne de, ferfûriyan dineqişîne.
Mêrik jî dartraş e. Bi çakûç û miqareke biçûk darekî vediroje.
Herdu jî karê destan dikin.



## kartol

Kartol ji Amerîka Başûr hatiye. Di salên 1800î de li her deverê Ewropayê belav bûye. Lem û kemên kartolan bi qasî metreyekê bilind dibin. Kulîlkên wan zer, sipî û mor in.
Kartol bi xwe di bin axê de ji reh û rîçikên lem û kema xwe çêdibin.
Kartol îro xwarinek ji xwarinên herî giring e.



## kelûk

Goştê masiyên kelûk xweş e. Kelûk dikare heta metre û nîvekê dirêj û bi qasî 35 kîloyan jî giran be. Di avên çeman de hêkan dikin. Hêk di avên çeman de dibin çêlik û piştî du sê salan derbasî deryayê dibin. Piştî çend salan dîsa vedigerin warê xwe û bi hev re dilîzin, bi gotineke din, ji bo çêlikên nû dîsa bi hev şa dibin.




## keman

Keman û kemançe înstrumentên têldar û kevanî ne. Meriv bi kevanekekê lêdixe. Çar têlên kemanê hene.
Kesê ku li kemanê dixe, kemanjen e. Keman yek ji wan înstrumentan e ku melodiya sitranên kurdî baş pê derdikeve.




## kember

Banî û pire dikarin kemberkî werin avakirin. Ew pir hindik dikarin kupikî bin. Kevir bi awayekî welê tên birîn û danîn ku di avakirinê de hevdu digirin û giranî vedikişe ser dîwar û sitûnan. Hinek pireyên bi kember hene ku ji hezar salan heta îro mane.
Li welatê me Pireya Mala Badê yek ji wan e.



## kemend

Meriv bi kemendê ajelan digire. Kemend werîsekî dirêj e û serê wî werîsî bi xilboq e. Bi piranî laponî û gavanên amerîkî bi kar tînin.
Ji bo ku meriv bikare kemendê bi kar bîne, divê meriv xwe baş hîn bike.




## kenişt

Mîna dêra xiristiyan û mizgefta muslimanan kenişt jî ciyê îbadeta cihûyan e. Li keniştan dolabek heye. Di wê dolabê de pirtûka pîroz, Tewratê diparêzin ku ew jî a cihûyan e. Li ber dolabê perdeyek heye, navê wê "perdeya bexşandinê" ye. Li her keniştekê şamdaneke heftşaxî heye.




## ker

Ker û hesp ji du malbatên nêzîkî hev in. Kerên kovî yan jî ên çolê li Asya û Afrîkayê hene. Kerên kedîkirî bi taybetî li welatên derdora Derya Sipî hene. Li Kurdistanê jî ker pir in. Hem ji bo siwarbûnê û hem jî ji bo bar bi kar tên. Ker ajelek bargir e û keda wê pir e. Ji kera mê re dibêjin manker. Ji çêlikê wan re jî dibêjin cahşik. Di çîrokan de ker ehmeq û rikebar e.



## kereste

Li daristanê daran dibirin, ji şax û guliyan rût dikin. Van darên gilover û dirêj li gor pîvanekê dibirin û jê re dibêjin kereste. Piştre van keresteyan dibin kerestexaneyê û li wir dikin text.
Piştî ku kereste tenik û pan hat jêkirin û bû text, meriv wan di avahî û mobîlyeyan de bi kar tîne.




**kerguh**
Kerguh ajeleke kojer e. Havînan giya û hêşînahiyan, zivistanan jî kelem û qaşilan dixwe. Lingên wan yên paşiyê dirêj in û bi lez baz didin.
Gelek cureyên kerguhan hene, herwekî kerguhên çiya, yên çolê, yên kedî. Li hinek deveran ji kerguh re dibêjin kîroşk.



**kerkedan**
Şaxek an du şax li ser pozê kerkedanan hene. Çermê kerkedanan sitûr e. Kerkedanek dikare ji sê metreyî dirêjtir û bi qasî otomobîlekê jî giran be. Kerkedan li Afrîka û Asyayê hene.



**kermêş**
Kermêşên normal bi derziya xwe xwînê dimijin û di zikê xwe de kom dikin, loma jî diwerimin.
Kermêşa ku xwînê dimije a mê ye.
Kermêş ji malbata mêş û megezan e.
Hinek cureyên kermêşan hene ku bi meriv ve didin û nexweşiyan belav dikin. Li hinek deverên welatê me ji kermêşê re dibêjin pêşû.



## keskesor

Carina dema baran dibare meriv dikare keskesorekê bibîne.
Ev tîrêjên rojê ne. Tîrêj di hewa re, di nav dilopên avê re derbas dibin û bi reng xuya dikin. Di tîrêjên tavê de hemû rengên keskesorê xuya ne: sor, porteqalî, zer, kesk, şîn û mor...
Û rêza rengan hertim weke xwe ye û nayê guhartin.



**keştî,** li rûpelên 100-101an binere

## keştîkêş

Ev curekeştî, keştiyeke gelekî mezin bi dû xwe ve dikişîne. Wek mînak, dema keştiyeke mezin tê benderê, ew wê li pey xwe dikişîne û dibe li îskeleyê bi cîh dike. Carina jî keştîkêş koma darên nav avê li dû xwe dikişîne.



## keştiya barkêş

Keştiyên barkêş di nav du benderan de bar dibin û tînin. Barên wan însan û otomobîl in. Li ciyên ku pire tunebin keştî diçin û tên.
Lê barkêşên mezin jî hene ku derdikevin deryayên mezin û di nav barên wan de trên jî hene.
Ji keştiya barkêş re ferîbot jî dibêjin.









Keştiya dûkelî ya pêşîn hem bi çerxê û hem jî bi bayî kar dikir.

**ba, dûkel û motor**
Berê keştiyên herî mezin, keştiyên bayî bûn. Di sedsala 18an de keştiyên dûkelî derketin û yên bayî jî hê bi kar dihatin. Di sedsala 19an de motorên dieselî îcad bûn. Îro piraniya keştiyan bi motoran kar dikin.


## keştî

Keştiya bayî cara pêşîn beriya 5000 salan hatiye avakirin. Keştiya bayî tenê dikare bi bayî biçe. Loma jî divê ew ji perav û qeraxên deryayê bi dûr nekeve. Di serdema antîkî de xelkê keştiyên bayî yên mezintir û baştir ava kirine. Di heman demê de keştiyên ji sed bêrikî zêdetir ava kirine.
Di salên 1800î de keştiyên dûkelî û yên bi motor hatin çêkirin.
Keştiyên rêwiyan ku ew jî di salên 1850î de hatin çêkirin, li ser Atlantê di navbera Amerîka û Ewropayê de dest pê kirin çûn û hatin. Bi hezaran kes li van keştiyan siwar dibûn, mîna bajarên ser avê bûn. Rêwîtiya navbera Amerîka û Ewropayê dûr û dirêj dajot. Herçendî nuha rêwîtiya bi keştiyê hefteyek be jî, lê piraniya xelkê bi balafirê rêwîtiyê dikin.
Îro keştiyên mezin ji bo bar û petrolê bi kar tên. Keştiyeke petrolkêş dikare 300 metreyan dirêj be. Curekeştiyên din jî hene ku li gel rêwiyan, otomobîl, otobus, kamyon û trênan jî li wan bar dikin.




Di vê keştiya barkêş a nûjen de, bar di qutiyên mezin de ne ku jê re dibêjin konteyn.






Di navbera salên 1850 û 1950î de, keştiyên dûkelî bi hezaran rêwî di ser Atlantîkê re dibirin û dihanîn.

Di vê keştiyê de, ji bo otomobîlan du qat dik hene. Li herî jêr, li odeya makîneyan tu du motorên mezin dibînî. Li qatên jora otomobîlan odeyên razanê, restorant, dikan, sînema, salonên dansê û hwd hene. Li qatê herî jor jî odeya kontrolê heye ku li wir keştî tê îdarekirin. Li pêş û paşiya keştiyê jî du dergehên mezin hene. Di van dergehan re otomobîl û hwd derbasî hundur dibin û derdikevin.




Bi perwaneyên kêlekan keştî bi hêsanî dikare xwe bide îskeleyê.

**keştiya bayî**

Keştiya ku tu di wêne de dibînî, keştiyeke bayî ye û di dawiya sedsala 17an de, ji bo ku çayê ji Çînê bîne Ewropayê, bi kar dihanîn. Lê îro hemû keştî bi motorê kar dikin. Nuha keştiya bayî tenê ji bo perwerdeya keştîvanî û deryavanan bi kar tînin.


Keştiya bayî ya herî kevin sê sitûnî bû. Bi serê sitûnan ve hin lolib hebûn û cawên çargoşeyî bi van loliban ve girêdayî bûn. Ji bilî van hinek cawên nivîştkî jî bi pêşî, paşî û di navbera sitûnên keştiyê de hatibûn girêdan. Bi cawên nivîştkî meriv dikaribû keştiyê ber bi bayî ve jî bajo.



Keştîvan bi çerxekê keştiyê îdare dike.



Deryavanên keştiya bayî pirî caran sandoqek jî bi xwe re digerandin ku hertim kinc û tiştên xwe tê de veşêrin.






keştîvan cawê keştiyê dipêçin

**keştiya nûh**

Di pirtûkên pîroz de tê gotin ku tofaneke mezin rabûye. Nebî Nûh, malbata wî û ji her cinsekî cotek lawir û ajel ji mirinê filitîne. Nebî Nûh keştiyeke mezin ava dike. Giştdikevin vê keştiyê û li ser avê dipekin vî alî û wî alî. Piştre av kêm dibe û Keştiya Nûh li çiyayê Agirî disekine. Li gor hin pirtûkên pîroz Keştiya Nûh li çiyayê Cûdî asê maye.



**kevir**

Kevir parçeyên zinar û çiya ne. Gelek cureyên çiya hene. Ruyê erdê û qalikê erdê bi xwe jî ji cureyên çiya û keviran e. Tebeqa binê qalikê erdê jî cureyek çiyayê helandî ye ku jê re dibêjin magma. Dema volkanek diteqe, magma jî dertê ruyê erdê. Hin cure çiya û kevir ji magmayê çêdibin ku granît jî yek ji wan e.




Ba û baran, xîz û sêlaxa çiyan dihêrifînin. Xîz û sêlax li binê gol û deryayan kom dibin. Ev komên xîz û sêlaxan piştî demekê bi hev ve dikelin, taht û zinar û kevir ji nû ve pêk tên.

## kevjal

Kevjal heywaneke kaşok e û di avê de dijî. Ew lawirên biçûk û yên mirî dixwe. Deh lingên kevjalê hene. Pişta wê pan û fireh e û qalikê piştê tenik e. Dûvikê wê biçûk e û di bin qaşilê wê de ye.
Kevjal dikare berwarkî jî bi rê ve biçe.



## kevjala dirêj

Kevjalên dirêj di kûrahiya çem û golan de dijîn. Bi alîkariya dûvê xwe berepaşkî ajnê dikin.
Rengê kevjalên çeman gewr e, lê dema tên kelandin rengê wan sor dibe.
Gelek kes ji goştê kevjala dirêj hez dikin.



## kevok

Bi kurdî jê re kotir û bewran jî dibêjin. Cureyên wan ên malovî û yên kovî hene.
Berê bi kevokên malovî name jî dişandin. Li bajaran xweş e gava ku kevok li her derê hebin, lê herweha dikarin bi rîça xwe derdorê qirêj bikin.



## kevoka nameber

Ev kevokeke kedî ye. Ji bo ku bikaribe were malê, ew tê perwerdekirin. Heger meriv wê bi dehan km li dûr berde jî, dîsa difire û tê warê xwe. Kevoka nameber dikare nameyeke sivik hilgire, bi xwe re bibe û bîne. Û di demên berê de ev jî babeteke ragîhandinê bûye.



## kew

Kew bi reng û dengê xwe çûkeke pir xweşik e. Kurd ji bo kêf û nêçîrê kewan di rikewan de xwedî dikin. Li rojavayê Asyayê, başûr û rojhilatê Ewropayê, bakurê Afrîka û li Yemenê kew hene. Şeş cure ne:


- kewê sor (alectoris rufa)
- kewê zinaran (alectoris graeca)
- kewê berberî (alectoris barbara)
- kewê gozel (alectoris chukar)
- kewê çolê (ammoperdix)
- kewê çîr (ammoperdix griseogularis)



Ji van şeş cureyan kewên gozel, kewên zinaran û kewên çîr li Kurdistanê hene. Kewên gozel û kewên zinaran mezin in û bi qasî 32-35 cm ne. Kewên çîr biçûk in û bi qasî 22-25 cm ne. Reng û nexşên wan jî ne wek hev in.
Kew zivistanan ref girêdidin û xwe didin qontar û naverastan. Hêlîna xwe li erdê çêdikin. Di mehên nîsan û gulanê de ji 8 heta 24 hêkan dikin. Kewa marî kurk dikeve. Kew kurm, kêz û giya dixwin. Dengê kewa gozel gelek xweş e. Dengekî weha derdixe: qib.. qib... qib... qaqibo... qaqibo... qaqibo... qib... qib... qib...


## kêç

Kêç kêzikeke biçûk e. Baskên wê tunene lê xwe baş hildavêje. Kêç parazît in û li ser pişta yên din dijîn. Cinsek ji wan jî xwîna merivan dimije.
Li ser kêçan gelek gotinên îronîk hene. Li vir, di wêne de kêç erebokekê li dûv xwe dikişîne. Skandinavî jê re sirkûsa kêçan dibêjin.




## kêzberû

Qaşilê kêzberûyan req û qop e. Kurmikên wan di nav axê de di çar salan de dibin kêzik û dikarin zerareke mezin bidin rehên dar û deviyan.
Tu di wêne de dibînî ku ji hêkê heta kamiliyê kêzberû çawa çêdibe.





## kêzik

Kêzik ji malbata kurm û kêzan e. Bi hejmara xwe lawirên herî zêde ne. Heta nuha 300 hezar cinsên wan hatine dîtin. Perikên wan gelekî tenik in, lê qalikên wan pir hişk in. Piraniya wan gezok in.



## kilît û kerseg

Li vir tu wêneyê kilît û kersegekê dibînî. Pêşî tu kilîtê dikî kersegê (1). Dema te zîvirand li "qulekê" rast tê (2). Heger te ew bêtir zîvirand zimanoka kersegê bi paş ve dikişe (3 û 4) û derî vedibe.
Kersegeke rast û durist gelek parçeyên xwe hene.




## kirîko

Bi alîkariya kirîkoyê zarokeke biçûk dikare otomobîleke giran bilind bike. Meriv kirîkoyê di binê otomobîlê de xweş bi cih dike û piştre badide an jî bi pompeyê bilind dike.



## kitabet

Bi hezaran sal berê li ser keviran bi miqaran nivîs hatine kolan. Ji nivîsên welê re dibêjin kitabet. Wek kevirên bedena Amed û Hewlêrê, li welatê me li gelek ciyan kitabet hene.
Di wêne de skandînaviyek kitabetekê dikole ku berê bi piranî ji bo bîranîna kesên mirî di erdê de dadiçikandin.



**klarnet**

Klarnet amûreke pifbar e û ji dar çêdibe. Pîpikeke wê heye û weke nikulê çûkan e. Li ser qulikên wê bişkok hene.
Bi alîkariya tiliyan, ji her qulikeke wê dengekî cuda derdikeve.
Klarnet jî yek ji wan înstrumentan e ku melodiya sitranên kurdî baş derdixe.



**kolan**

Kolan rêya nav gund û bajaran e.
Li kolanan kevir, qîr, peyarê û lampeyên elektrîkê hene. Di bin de jî lûle û kanalên av û gemarê hene.
Em ji van kanalan re dibêjin kanalîzasyon.
Dema baraneke zêde bibare, ava li kolanan diherike van kanalîzasyonan.
Herweha li gelek bajaran, xetên telefon û elektrîkê jî di bin kolanan de ne.





**kolîbrî**

Kolîbrî li dunyayê yek ji wan çûkên herî biçûk e. Hinek cureyên wan bi qasî mêşekê ne û giraniya wan jî du gram e.
Nikulê kolîbriyê dirêj e. Hinek ji wan mêş û megezên ser gulan dixwin.
Rengê yên nêr wek rengê metalên birqokî ye.
Kolîbrî li başûrê Amerîkayê hene.



## komputer


Komputer makîneyek e ku dikare bi lez bijmêre û hesaban ji hev derxe. Lê divê meriv berê programekê tê de bi cih bike. Ji bo zanyar û lêkolîneran komputerên mezin hene ku hesabên bi mîlyonan di nav çend sanîyeyan de çêdikin. Komputerên weha li fabrîke, daîreyên mezin û li bankeyan hene.
Komputera malan jî heye ku bi wê meriv dikare nameyan binivîse û hin hesaban çêbike, wêneyan çêke, bi rêya e-mailê nameyan bi rê bike, di nav tora înternetê de bigere, bi lîstikan bilîze û hwd.




**girêdana bi komputeran din re**
Komputer cot cot an jî bi mîlyonan bi hev ve têne girêdan. Dûre meriv dikare tekst û wêneyan jê werbigire an jî jê re bişîne.


## koremişk

Koremişk û jûjî ji malbatekê ne. Bi piranî di binê erdê de dijîn. Ew axa ku ew dikolin, di kunikê re davêjin der û li jor komrîşkan çêdikin. Koremişk kurm û kêzan dixwin. Pirça wan gur û birqokî ye. Çavên wan piçûk in û di nav pirça wan de xuya nakin.



## koral

Ji heywanên biçûk ên binê avê re dibêjin koral. Piraniya wan wek mircanan bi axa binê deryayê ve dizeliqin. Ew wek kolonî dijîn. Skeleta koralan ji kilsê ye. Dema ew dimirin skeleta wan dibe kils. Koral heywanên dirinde ne û giyayên binê deryayê û şeytanokan dixwin. Koral wek tûrikan in û devên wan bi jor ve ye.




çend babet ji koralan

## koro

Ji koma sitranbêjan re koro dibêjin. Endamên koroyê dikarin carina bi yekton û yekmeqamî bi hev re heman sitranê bibêjin. Carina jî hinek ji wan dikarin bi toneke bilind û sitûr, hinek jî bi toneke nizm û zirav bibêjin. Koro dikare li gel amûran, yan jî bêyî amûr bistirê. Gelek dezgeh koroyên xwe yên taybetî hene. Wek koroya belediyeyan, koroya kilîseyan an jî ya komeleyan.



## korsan



Korsan keleşên deryayê ne. Di demên berê de korsan bi qeyik û botên biçûk li ser deryayê digeriyan. Wan êrîş dibirin ser keştiyên barkêş û ew talan dikirin, kesên ku di keştiyê de bûn jî dikuştin.

Hemû kesên ku li ser deryayê rêwîtî dikirin, ji korsanan ditirsiyan.

## kowboy



Peyveke îngilîzî ye û tê wateya gavan. Di fîlmên kowboyan de, kowboy bêtir li dijî nijdevan û îndîyaniyan şer dike. Lê di bingehê xwe de karê wan ajotina garanê ye.

Di demên berê de li ser hespan bi karê xwe radibûn. Lê îro ew otomobîl û helîkopteran jî bi kar tînin.


## ksîlofon



Ksîlofon amûreke lêdanê ye. Ji parçetext û lûlikan pêk tê. Di lêdanê de meriv du darikan bi kar tîne. Gava ku meriv bi darikan li parçetextan dixe, tonên cuda derdikevin. Ev ton bi lûlikên binê parçetextan xurtir dibin. Ksîlofonên weha bi piranî di orkestrayên senfoniyê de bi kar tên. Orjînala navê wê 'xylophone' ye.


## kulî

Kulî kêzek e ku lingên wî yên paşîn dirêj û gir in. Qaşilê baskên wan hişk e. Dema lingên xwe yên paşîn di qaşilên xwe dide bîhnek jê tê.
Kulî giha dixwin. Ew li gelek ciyan zerarê didin dar, ber û zeviyan.



## kulîlk

Di gulê kulîlkan de zimanokên bi tov û nêrîk hene. Dema toza zimanokan dikeve nêrîkê, kulîlk ber digire, mezin dibe û dibe mêwe.
Toza kulîlkan piranî bi rêya mêşan belav dibe.




## kund

Kund çûkekî dirinde ye û bi şev nêçîra xwe dike. Kund gelekî baş dibîne û dibihîze. Periyên wî nerm in û loma jî bê deng difire. Gelek cureyên kundan hene.
Li Kurdistanê kundê kor û bûm bi nav û deng in. Rengê çavên piraniya wan bi ser zere ve ye.


sê cure kundên skandînavî

## kurebeşk


Kurebeşk ajelekî hov e û li gelek deveran heye. Bi roj di qulika xwe de dimîne. Gelek çaviyên qulikên wan hene. Bi şev derdikevin nêçîrê. Kurebeşk lawir, kêz, ber û kuvarkan dixwin.



**kurm,** li rûpela 115an binere

## kurm û kêz

Ji lawirên mîna mêşereş, minminîk, kulî, kêzik û yên wek wan re kurm û kêz dibêjin. Bi qasî mîlyonekî cureyên kurm û kêzikan hene. Kurm û kêzik şeşling in. Gelekên wan bi perik in. Laşê wan sê beş in: Ser, gewde û dûv. Yên mê hêkan dikin. Lê hemû wek hev mezin nabin. Hêkeke mêşê berê dibe kurmik, piştre dibe qoze û di dawiyê de jî dibe mêş. Lêbelê kulî wek çêlik mezin dibin.



## kurm

Gelek cureyên kurman hene. Wek nimûne gilover, zirav û dirêj. Kurm lawirên biçûk, dirêj û bêmovik in, hestî di laşê wan de tune. Hinek kurm û kêz jî hene ku bi şaşî ji wan re dibêjin kurm lê ew bi xwe kurmikên mêş û megezan in.




## kuvark

Li Skandînavyayê meriv payizan derdikeve nav daristanê û kuvarkan berhev dike. Li Kurdistanê bihar û havînan jî li erdên avî kuvark çêdibin. Beşê ku meriv berhev dike serê kuvarkê ye. Beşê din jî mîna têlan di bin erdê de ne. Li Swêdê nêzîkî 10 000 cure kuvark hene. Hinek ji wan tên xwarin, hinek jî bi jahr in û nayên xwarin. Hinek jî welê biçûk in ku meriv bi tenê bi mikroskopê dikare wan bibîne. Gelo te nanê kufikî dîtiye! Kufik bi xwe jî babeteke kuvarkan e. Li hinek deverên welatê me dibêjin, kuvong, kufkark.







Kk

## kûkla

Kûkla gelek kevin e û li gelek deverên dunyayê heye. Gelek cure kûkla hene. Kûklayên ku meriv wek lepik destê xwe dixe hundurê wan û pê dilîze, jê re dibêjin kûklayên destan. Kûklayên ku bi benikan tên lîstin, jê re dibêjin marîonet.





## kûsî

Kûsî li cî û warên germ hene. Laşê wan di hundurê qalikekî req de ye. Ev qalik laşê wan diparêze. Li hember talûkeyekê boçik, ling û serê xwe vedikişîne hundurê qalikê xwe.
Kûsî hêkan dikin.
Ew dikarin demeke dûr û dirêj bijîn.




## kûzeyê avê

Kûzeyê avê di avzêm û çeman de dijîn. Ew bi diranên xwe yên tûj qurmê daran dikojin û nemaze ji qurmê dara sor şikeft û sukran saz dikin.
Berî sed salan kûzeyên avê li Swêdê qelya bûn. Piştre carek din anîn û xwedî kirin. Anuha li seranserê vî welatî kûzeyên avê hene.




## kûçik




Kûçik ajelên malovî û herî kevin in. Di destpêkê de kûçik hov bûn. Guhên wan sivik in, bîhngirtina wan xurt û zêde ye, lê kêm dibînin.
Bi sedan cinsên kûçikan hene. Hin yên nav malê, hin yên suxre û nêçîrê ne, hinek jî rêberiya kesên kor dikin.
Kûçik zû tiştan ho dibin. Lê ji bo ku meriv wan ho bike, divê meriv kûçikan baş nas bike.
Di wêne de tu çend nimûneyan ji “zimanê” kûçikan dibînî.

## labîrent

Labîrent sîstemeke rêç û kanalan e ku pir tevlihev e. Meriv di wan rêçan de tenê di yekê de dikare derkeve der, yên din hemû korerê ne û rê li merivan wenda dikin.
Labîrenta herî bi nav û deng berî 4000 salan li girava Girîdê li Knossesê hatiye çêkirin.




## lampe

Îro li malên me hemûyan lampeyên elektrîkê hene. Zemanê berê çira û lampeyên don û gazê hebûn. Meriv fitîla wan vêdixist û bi rivîna agirê wan dora xwe ronî dikir.
Ji bo ku ronahiya wan çavên merivan nedelîne, piraniya lampeyên gazê û ceryanê bi şûşe û qapax in.





## lazût

Wek genim û birinc, lazût jî li cîhanê teneyekî girîng e. Seriyê lazût di nav qaşilê xwe de ye. Lazût li her deverê cîhanê, lê bi piranî li welatên germ tê çandin. Li Kurdistanê çandiniya lazût gelek e. Jê re genimok, genimê şamê an misir jî dibêjin. Ji ardê lazût nan çêdikin, di avê de dixaşînin û dixwin. Û jê çatpatikan jî çêdikin.





## legleg

Legleg bêtir ji avzêman hez dike. Di nav avzêman de bi nikulê xwe yê dirêj beq û kurmikan digire.
Leglega sipî bêtir li ser xaniyan û carina jî li ser rojinan hêlîna xwe çêdike.



**leopard**
Leopardê ku jê re panter jî tê gotin ajelekî hov e. Ew pir bi lez û sivik e û dikare bi daran ve hilkişe. Nêçîra leopardan bi piranî meymûn in. Lê ew ji mişkan bigire heta ajelên gir, ajelên mîna mange û xezalan jî digire û dixwe. Leopard ji malbata pisîkan e. Li Afrîka û başûrê Asyayê hene. Ew deqdeqî an jî reş in û dikarin bi qasî 1,5 metreyan dirêj bibin.



**ling**
Lingên hertiştî ne weke hev in. Wek mînak, piraniya çûkan çar pêçiyên wan tenê hene, bi gotineke din tiliya "qelîçkê" nemaye. Bi lingên ajelên kovî ve lapûşk hene. Piraniya ajelan li ser lingan dimeşin. Meriv li ser lingên xwe, pisîk û kûçik li ser pençên xwe, hesp û ker jî li ser simên xwe diçin. Di kurdî de ji ling re pê jî û nig jî tê gotin.



**lîmon**
Darên lîmonan li welatên germ çêdibin. Bi şînahî meriv wan berhev dike û li alîyekî datîne. Piştre distewin û zer dibin.
Lîmon pir bi fêde ye lê gelekî tirş e. Piçek ava lîmonê xwarinê xweştir dike.






## lîstik

Gelek cure lîstik hene. Kêm caran yên nû li wan zêde dibin. Lîstikên dem û welatên cuda cuda dişibin hev. Lê lîstikên li gor temenan, ne mîna hev in.
Tevî ku zarokên biçûk li tenişta hev rûdinin jî, her yek ji wan ji xwe re dilîze. Dema zarok hinekî mezin dibin, bi alîkariya lîstikan fêrî hevkarî û hevaltiyê dibin. Bi hin lîstikan, zarok balansê bi dest dixin û jêhatîtir dibin. Bi riya lîstikan zarok fêrî gelek tiştên mezinan jî dibin ku ev jî dûre bo wan dibe "tecrûbeyek".
Meriv dikare bibêje ku lîstik ji bo zarokan karek e. Lê karekî xweş e.








## lokomotîv

Lokomotîv vagonên trênê li dû xwe dikişîne. Li jora wêne tu lokomotîvekê dibînî ku cara herî pêşîn hatiye çêkirin. Wê demê li gor xelkê ew gelek bi lez diçû. Navê wê lokomotîvê Rocket bû û di 1829an de li Îngilîstanê saz bûbû. Vê lokomotîva hilm û gulmê, bi rejiyê kar dikir. Piştre lokomotîvên elektrîkî çêbûn. Di van lokomotîvan de motora elektrîkê heye. Di yên dieselî de jî motoreke navendî heye ku elektrîkê dide motorên tekeran. Peyva dieselê wek ’dîzel’ bi lêv dibe.




## lucia


Li Swêdê her sal di 13ê çileya pêşîn de cejna Luciayê tê pîroz kirin. Lucia bi xwe ezîzeyeka xiristiyanan e, ew berî çend sedsalan ji bo bîr û baweriyên xwe miriye.

Di pîrozkirina Luciayê de keçek dikeve şûna Luciayê, tacemûmekê dide serê xwe, li gel çend keç û kurên din bi hev re dimeşin û sitran û lawijan dibêjin. Li Swêdê piraniya xelkê roja Luciayê kulîçeyên bi safran çêdikin û dixwin. Bi kurdî weke ’Lûsiya’ bi lêv dibe.



## lûf

Lûf masiyekî mezin, dirêj û pan e. Pozê wî bel û diranên wî tûj in.
Li gol û deryayan dijîn. Lûf masiyekî çavbirçî ye.
Ew xwe di nav kevir û giyan de vedişêre û ji nişkê ve êrîşî masiyên din û heta lûfên ji xwe biçûktir jî dike.



## madalya

Madalya ji bo serketinê tê dayîn.
Herwekî di pêşbirkên sporê de.
Madalyayên bîranînê jî hene. Ji bo bîranîna hinek kes û bûyeran.
Madalya ji gelek metalan tên çêkirin û weke pelikan in.
Form û meziniya wan dikare cuda bin. Ji madalyayên çargoşe re plaket dibêjin.



## makyaj

Makyaj cureyên boyaxê ne ku meriv pê çav, rû û lêvên xwe boyax dike. Meriv dikare dora çavên xwe şîn an kesk, lêv û hinarikên rûyê xwe jî sor bike.
Şanoger, artîst û palyaço bêtir makyajê bi kar tînin.
Lê gelek kesên din jî xwe makyaj dikin û bawer dikin ku ew pê xweşiktir dibin.



## maloka bûkikan

Maloka bûkikan gelek xweşik û balkêş e. Gava ku meriv pê dilîze, wekî ku xaniyê merivan bi xwe be. Meriv dikare wê li gor dilê xwe raxe û ji bo bûkikan jî têde ciyekî çêke.




## mammût

Mammût ji malbata fîlan bûne. Ji hezar salan û vir ve êdî nemane. Pirça mammûtan dirêj, qîlên wan jî ber bi jor ve xwar û bi qasî pênc metreyî dirêj bûne.



## mange

Mange nêzîkî 10.000 salan berî niha cara pêşîn li Mezopotamyayê hatiye kedîkirin. Em şîr ji mangeyê digirin û goştê wê dixwin.
Ji çêleyên mangeyan re dibêjin golik.
Ya ku ji sê salan biçûktir e û hîn nebûye mange, jê re dibêjin nogin.
Ji yê nêr re jî ciwanga dibêjin.
Li hin deverên welatê me ji mangeyê re dibêjin çêlek.



## manken


Ew kesên ku kincên modeyê li xwe dikin û derdikevin pêş temaşevanan, ji wan re dibêjin manken. Mankenî karek e. Manken li ba fîrmayên modeyê kar dikin.
Ev fîrma bi xwe kincên modeyê dibirin û didirûn. Piraniya mankenan jin in. Li vir tu xwepêşandaneke mankenan dibînî.




## mar

Mar ajelekî kaşok e. Lingên mar tune û ew bi livdanê ber bi pêş ve diçe. Mar hêkan dikin. Piraniya cureyên maran li welatên germ hene. Diranên hinekên wan bi jahr in, wek kobra û kore-maran. Ew ji bo merivan gelek bi talûke ne.









Li welatê me Kurdistanê gelek cureyên maran hene: margîsk, marê giya, zengilok, şûremar, mertal, teyar, koremar, tîremar û hwd.

**marê boa**
Marekî pir mezin e. Bi qasî 10 metreyan dirêj e. Li Amerîka Latînî dijî.
Ew xwe li nêçîra xwe dipêçe û difetisine. Marê boa dikare însanekî jî bikuje.



**margîsk**
Margîsk marekî bi jahr e. Bi qasî 70 cm dirêj e. Li ser pişta wî xeteke reş û zîkzakî heye. Loma meriv vî marî bi hêsanî nas dike. Margîskên tenê reş jî hene.
Margîsk beq, mişk û cirdonan dixwin.




**marîonet**
Marîonet lîstikeke kûklayî ye. Bi gelek ciyên marîonetê ve ben tên girêdan û pê dilîzin. Dema ben tên kişandin marîonet dikare bilive, piyê xwe bavêje, serê xwe li ba bike û hwd. Bi marîonetê meriv dikare şanogeriya kûklayî jî bilîze.






## marmasî

Marmasî masiyekî wek mar e. Ew dikare bi qasî metreyekê dirêj bibe û heta 100 salan jî bijî. Marmasî li nêzîkî Amerîkayê li deryaya Sargassoyê gelek in. Ji wir dikevin ber pêlên avê û tên Ewropayê.
Marmasî li Kurdistanê di çeman de jî dijîn. Goştê marmasiyan tê xwarin.




## masî

Masî di avê de dijîn. Bi berkurkên xwe bîhna xwe digirin û didin. Laşê wan bi pûlik in.
Masî bi perikên xwe ajnê dikin. Piraniya wan gelekî bi lez ajnê dikin. Masiyên weha dirêj û newqa wan sitûr e. Forma hinekan pahn e.
Di zikê masiyan de pîstikek tijî gaz heye. Bi alîkariya pîstika gazê masî dikarin li ciyên kûr xwe ragirin. Piraniya masiyan hêkan dikin.
Navê hêkên masiyan xerz e.



**masiyê harengus**
Di nav masiyan de yê ku herî pir tê xwarin yek jî masiyê harengus e. Ew bir bi bir di bakurê Derya Atlantê û di Derya Pasîfîkê de dijîn. Li derya Baltikê jî hene.
Meriv masiyê harengus dike sûravkê, dûdanî dike an jî dadigire û dike konserve.



**maske**
Di hin şahiyan de hinek kes kinc û maskeyên curbecur li xwe dikin ku neyên naskirin. Meriv dikare cilên rojane jî li xwe bike.
Lê pirî caran di hinek şahiyan de meriv naxwaze were naskirin û loma meriv maske bi kar tîne.



**masûlke**
Di laşê me de gelek masûlke hene. Sîstema masûlkeyê di laşê meriv de wek tevnê ye. Masûlke laşê meriv dilivînin.
Masûlke du cure ne. Hinek ji wan di bin kontrola meriv de ne û hinek jî li derî kontrola meriv in: wek mînak masûlkeyên dil.




## mazat

Mazat, ciyê kirîn û firotinê ye. Buhayê alavên li mazatê têne firotin, ne diyar e. Li mazatê “delal” hene. Delal bang dikin û her tiştên ku bêne firotin nîşanî xelkê didin. Di mazatê de meriv buhayên tiştan li hev zêde dike. Yê ku buhayê herî zêde dide, alav li ser wî dimîne. Ango ew alavê dikire.




## med û cezîr

Di şev û rojekê de, du caran ava deryayê nizm û bilind dibe. Ji vê rabûn û daketina avê re med û cezîr tê gotin. Dema ku tava hîvê li rexekî rûyê dunyayê dixe, li wir avê ber bi xwe ve dikişîne û li ciyekî din jî av dadikeve. Li hin peravan meriv têdernaxe, lê li hin ciyan ferqa nizmbûn û bilindbûna avê dikare çend metre bin.



## mejî


Di kiloxê serî de mejî heye. Kiloxê serî mejî baş diparêze. Mejî bi xwe sê beş in: mejiyê mezin, mejîlok û mejiyê piştê. Mejî ji çav, guh, ziman û hwd sînyalan digire û vediguhêze hestên naskirinê. Mejî tevger û livên laşên însan bi rê ve dibe. Karê her beşekî mejî cuda ye.



**mertal**
Mertal çekekî gelekî kevin e. Meriv pê xwe diparêze. Ew ji text an jî ji metal tê çêkirin. Destikekî wî heye. Formên mertalan li gor deman guherîne.
Carina gilover, carina jî sêkoşe û hwd bûne. Bi piranî ruyê mertalan neqişandî ne.



**metro**
Li bajarên mezin gelek caran metro tên çêkirin. Ji ber ku kolan têra trafîkê nakin. Metro rêya trênê ye, rêya ku di bin erdê re diçe, jê re dibêjin metro.
Metroya pêşîn û mezin li paytextê Îngilîstanê li Londrayê hatiye çêkirin.



**mewij**
Ji tiriyê hişkkirî re mewij dibêjin. Mewij bi awayekî hêsan çêdibe. Tiriyên gihîştî li ber tavê radixin û hişk dikin.
Lê carina di firinan de jî tirî hişk dikin û jê mewijan çêdikin. Anuha bêtir ji tiriyên bêdendik mewijan çêdikin.
Dema tirî hişk dibe û diçilmise rengê mewijan zer û tarî dibe. Li welatê me tirî û mewij gelek in. Li herêma Mêrdînê mewijê Omeriyan bi nav û deng e.




## meymûn

Di nav ajelan de yê herî nêzîkî me merivan meymûn e. Bi sedan cureyên meymûnan hene. Ji cureyeke wan re “meymûnên mîna însanan” tê gotin. Orangutangê ku tu di wêne de dibînî yek ji wan e.
Meriv dikare di malên xwe de meymûnên biçûk xwedî bike. Û yek ji wan meymûnan jî markatan e.



## mêş

Mêş ji malbata kurm û kêzan in û li her aliyê dunyayê dijîn. Du perîkên wan hene. Lingên mêşan bi lapûşk in. Bi alîkariya lapûşkan dikarin bi binê zikê xanî ve serberjêr herin û werin.
Çavên wan gelekî beloq in. Mêş bi van çavên beloq, di heman demê de hawirdorê xwe dibînin.





**mêşhingiv,** li rûpela 132an binere

## mêweyên qaşilhişk

Hinek mêwe zuwa û qaşilhişk in. Piraniya wan yek dendikî ne. Wek nimûne bindeq, gûz, behîv û behîva brezîlî.
Li welatê me Kurdistanê behîv û gûz gelek in. Herçiqas ne zêde be, lê bindeq jî hene.



M m




## mêşhingiv

Mêşhingivên kedî di kewaran de dijîn. Li her kewarekê mêşhingiveke mê heye. Ew hêkan dike. Navê wê mêşhingivê, mak e. Mêşhingivên dergevan û yên karker jî di van kewaran de hene. Mêşhingivên karker di kewaran de şaneyên şimayê saz dikin. Di şaneyan de şanik hene ku tê de hêk dişikên, dibin kurmik û mezin dibin. Herweha mêşhingivên karker di van şanikan de hingiv kom dikin.


## mij

Gava ku mij dadikeve piçekî xof bi merivan digire. Lê şirovekirina daketina mijê hêsan e. Dema ku hewa bi nem be û dunya jî sar be, wê demê mij çêdibe: dilopên pir pir biçûk yên avê digihîjin hev, dibin wek telpekê. Ji ber ku gelekî biçûk û sivik in loma nakevin erdê. Ew li rûyê erdê dibin wek ewrekî.




## minminîk

Jiyana minminîkê seyr e. Ew pêşiyê hêk e. Piştre dibe kurm. Kurm jî dibe qoze. Dûre qoze dişikê û minminîk jê derdikeve.
Minminîk jî ji malbata kurm û kêzikan e. Çar perikên wan hene û rengîn in. Ji dêla devê wan ve bi piranî sîxikên wan yên mijînê hene. Li hin deverên welatê me jê re pinpinîk û pelatînk jî dibêjin.




## mirîşk

Ji 4000 salan vir ve mirîşkên kedî hebûne. Nêrê wan dîk e. Serê dîk bi kumik e. Kumikê dîk wek şeh e. Di binê nikulên wan de geldik hene.
Di jiyana wan de gelek mirîşk para dîkekî dikevin.
Di salekê de, mirîşkek dikare 250 hêkan bike.




## mirwarî

Mirwarî di nava mîdyeyê de çêdibe. Dema ku xîçeke deryayê bikeve hundurê mîdyeyê, bi alîkariya qaşilê mîdyeyê mirwarî çêdibe.
Di hundurê qaşilê mîdyeyê de tebeqeyeke biriqandî heye ku ew bi xwe jî wek mirwariyê diçirise. Mirwarî ji bo xemlê bi kar tê û gelek buha ye.



## mişk

Mişk û cirdon ji malbatekê ne. Ew ajelên kojer in û tiştan dikojin. Guhên mişkan mezin in û dûvê wan jî dirêj e.
Gelek cureyên mişkan hene.
Weke nimûne: mişkê malan, cirdon, poztûjik û koremişk ji van cureyan e.





## mişkê hîndî

Mişkê hîndî ji bo hogiriyê ajelên populer in. Ew bi hêsanî kedî dibin û sadiq in. Xwarina wan giya û hêşînayî ye. Di salekê de dikarin çar caran û her carê jî 2-3 çêlikan bînin.
Mişkê hîndî 4-5 salan dijîn.
Bi hinek zimanê biyanî jê re dibêjin 'kobay'.



## mizgeft

Ciyê ku musliman lê nimêj û îbadetê dikin jê re dibêjin mizgeft. Her mizgeftek yek an jî çend minareyên wê hene.
Mele rojê pênc caran diçe ser minarê û bang dide ku xelk here mizgeftê û nimêjê bike.



## mizirqe

Mizirqe amûreke biçûk e ku meriv bi pifê lêdide. Parçetextekî qulqulî û bi zimanokên metalî ye. Hinek ji wan qulik û kanalan di pifkirinê de û hinek jî di  kişandina nefesê de tonên cuda derdixin.
Mizirqe di salên 1800î de hatiye çêkirin.

Ev bişkoka ku di hinek mizirqeyan de heye, ji bo nîvdengan e.



## mîgfer

Ji bo parastina serê xwe meriv mîgferan bi kar tîne. Mîgfer dikarin ji pola, plastîk an jî çerm bin.
Di şer de şervanan hertim mîgfer dane serê xwe ku jê re dibêjin kumzirx. Ji van kumzirxan bi hinekan meriv ruyê xwe jî digire.
Îro gelek babetên mîgferan hene ku di kar û sporê de bi kar tên.




mîgfera polayî

kumzirxa siwariyan, ji sedsala 15an

mîgfera motorsikletan

## mîh


Yek ji wan kevintirîn ajelên malê mîh e. Mîh giya û şînahiyê dixwe û dikaye. Piraniya cinsên wan bi qiloç in.
Meriv ji goşt, çerm û hiriya mîhan fêdeyê dibîne. Navê yê nêr beran e û çêlikê wan jî berx e. Ji berxên dusalî re em bi kurdî dibêjin kavir.



## mîknatês

Mîknatês tiştên hesinî ber bi xwe ve dikişîne. Dema tiştên hesinî bi mîknatêsê ve bizeliqin, mîknatês derbasî wan jî dibe. Her mîknatêsek du seriyên xwe hene: yek cemsara bakur û ya din jî cemsara başur e. Cemsara serê bakur ya serê başûr dikişîne. Û cemsara serê başûr jî ya serê bakur dikişîne.

Ku meriv têlên sifir li perçeyekî hesin bipêçe û ceryanê bidiyê, elektromîknatês çêdibe. Wek nimûne, meriv elektromîknatêsê ji bo vînç û zengilên deriyan bi kar tîne.




## mîkrofon

Dema meriv di mîkrofonekê de dipeyive deng tê guhertin û dibe pêlên elektrîkî. Piştre ew pêlên elektrîkî bi rêya xetan diçin û vediguherin û dibin deng: wek mînak dema meriv di telefonê de dipeyive an jî dema weşanên radyoyê tê kirin, ev guherîn çêdibe. Meriv bi alîkariya amplîfikator û hoperloyan dikare dengê mîkrofonê bilindtir bike ku hemî kesên derdorê bibihîsin.



## mîkroskop

Tiştên gelek biçûk ku bi çavan nayên dîtin, meriv dikare bi alîkariya mîkroskopê bibîne. Mîkroskop wan tiştên biçûk çend sed caran mezin dike. Ku meriv tayek giya di nav ava şûşeyekê de dayne, piştî çend rojan hinek lawirên biçûk ê di nav avê de peyda bibin.

Heger meriv ji wê avê dilopekê bike ser parçeyek cam û bi mîkroskopê lê mêze bike, wê demê meriv ê lawirên şimikî bibîne.
Meriv bi mîkroskopê dikare li tiştên din jî binere. Ku meriv li tayek por mêze bike ew ê bi qasî tiliyekê sitûr xuya bike.




## mîx

Zînê bi çakûç mîxan dikute. Gelek cure mîx hene. Serê hin mîxan pahn û yên hinan jî girover in.
Ew mîxên herî naskirî ku tên bikaranîn, ji polayê çêdibin.
Meriv bi wan textan bi hev dixe. Loma jî navê wan mîxê textan e.







Mîro pir bi hêz e.
Ew dikare barekî hilbigire ku hezar carî jê girantir be.



Mîro sipiyên daran ji xwe re wek lawirên malê xwedî dikin û şîrava ku ji rodiyên wan tê dimijin.



Piraniya mîroyan ji bo ku xwe biparêzin avekê dipijiqînin.

## mîro

Mîro ji malbata kurm û kêzan e. Ji mala mîroyan re dibêjin morîstang. Mîro morîstanga xwe bi piranî li girik û li ber qurmên darên rizyayî, di binê erdê de ji ax û pûş çêdikin. Lê hemû mîro di morîstangê de najîn. Hinek ji wan morîstanga xwe di binê keviran de ava dikin. Morîstangên wan pirçavî ne.

Di wan çaviyan de şanikan çêdikin ku tê de hêk, kurmik û çêlik hene. Ew ji aliyê mîroyên xebatkar ve tên parastin.

Mîroyên nêr û mê herdu jî bi perik in. Dema dibin cot yê nêr dimire û ya mê jî perên wê diweşin. Ji bo nifşê xwe bidomîne ya mê heta dawiya jiyana xwe hêkan dike.

Hemû xebatên din mîroyên karker dikin ku ew jî mê ne, lê nikarin hêkan bikin û perên wan jî tunene.

Mîro palaxî ne, hertiştî dixwin. Xwarina wan bi piranî mêş û megez û tov in.

Mîro şerker in.

Hinek babetên mîroyan xwedî kole ne. Carina bi hev re êrîşê dibin ser cîyekî û talan dikin.



Mîroyên karker hertim karekî wan heye ku bikin. Xwarinê dikişînin, tînin û didine kurmikên xwe. Û divê morîstanga xwe jî ava bikin û biparêzin.



Wezîfeya mîroya mê ew e ku hêkan bike. Mîroyê karker ji hêkan diparêze.



Ji bo ku terk li hêkan bikeve û biderize ciyên wan tên guhertin.



Her ku diçe ji hêkên derizî kurmik derdikevin. Mîroyên karker wan dikişînin çaviyan.



Kurmik li vir qalikekî li xwe dipêçe û dibe qoze. Pirî caran bi çewtî ji vê qozeyê re dibêjin hêk.




Mîroyên karker alîkariya van çêlikên kamil dikin û xwarinê didin wan.





## morîna

Morîna masiyekî mezin e û li bakurê Atlantê û li Derya Baltikê heye. Dikare bi qasî metre û nîvekê dirêj be û nêzîkî 50 kîloyan jî giran be.
Ew palaxî ye û hertiştî dixwe. Pirî caran hevdu jî dixwin.
Goştê masiyê morînayê gelek xweş û bi çêj e.



## motorsiklet

Motorsiklet bi qasî sed salan berî nuha îcad bûye. Berê merivan di şûna otomobîlan de motorsiklet bi kar dihanîn. Carina tiştekî wekî selikê bi kêleka wê ve dikirin û sê meriv dikaribûn lê siwar bûna. Anuha xelk bi piranî motorsikletê ji bo kêf û sporê bi kar tînin. Li Swêdê ji bo girtina ehliyeta motorsikletên biçûk divê meriv bi kêmasî 16 salî be.



## moz

Gava moz li ser giya û kulîlkan li şîrava kulîlkan digerin, vingevingek ji wan tê. Loma meriv wan zû nas dike. Moz û mêşhingiv ji malbatekê ne. Ew ji mêşhingivan girtir û bêteşe ne. Moz bêtir di qulikên dîwar û di binê erdê de hêlîna xwe çêdikin.
Bi tenê yên mê dikarin xwe li ber zivistanê bigirin û bijîn. Lê mozên nêr zivistanê dimirin.





## mozeqirt

Kes ji mozeqirtan hez nake. Ji ber ku bi derzî ne û bi meriv ve didin. Hin ji wan bi tenê dijîn. Hin ji wan jî bi komê re û di kunê mezin de dijîn. Di van kunan de hêkan dikin.
Şanên wan şeşkenar in. Mozeqirt kêzikan dixwin, şîrika kulîlk û hêşînahiyan dimijin.




## muze

Muze ciyên hilanîna tiştên kevin û antîke ne. Wek nimûne: tablo, skeletên ajelên berê, çekên kevin, pûl, lîstok û tiştên din. Di muzeyan de tişt tên berhevkirin ji bo ku meriv herin û bibînin.
Herweha meriv dikare bi alîkariya lewhe û katalogan bizane ew tiştên li wir kengî û ji bo çi bi kar hatine.



**malbatên amûran**
Meriv li gor dengan, wan di komên cuda cuda de bi rêz dike: amûrên pifbar, darîn û metalîkî ne. Yên metalîkî jî tûnc û sifirî ne. Bêguman di pifkirinê de dengên wan jî hinekî ji hev cuda ne.




## muzîk


Muzîk bi xwe ton e, tonên ku di zik hev de dibin melodî, harmonî û rîtm. Melodî deng e. Harmonî lihevkirina dengan e. Rîtm jî dirêjiya dema di navbera tonên dengan de ye. Rîtm lerz û tevgera muzîkê ye: lerz û tevgera ku meriv guhdarî dike, govendê li ber digire.
Herkes dikare ji muzîkekê hez bike. Cureyên muzîkê gelek in: muzîka gelêrî, jaz, pop, klasîk û gelekên din.
Lê muzîk ne bi tenê ew tişt e ku meriv guhdarî dike. Lêdana wê jî gelek xweş e, nemaze dema ku bi hev re were lêdan.
Radyo, sêlik, kaset û CD îmkanên wusa çêkirine ku kengî û li kuderê meriv bixwaze, dikare guhdariya muzîkê bike.
Dema meriv muzîkekê çêdike, meriv deng ji amûran digire bandê û piştre bi dengê din re li hev siwar dike. Ji vêya re jî dibêjin, mîks.



AMÛRÊN TÊLDAR

AMÛRÊN LÊDANBAR





Dema meriv amûrên têldar bi mizrab, kevanek an jî bi tiliyan lêdixe, deng didin.
Amûrên lêdanê jî piraniya wan ji çermên şidandî ne û bi lêdanê deng derdixin.


Komeke popê, ji gelek amûran pêk tê û dengekî xurt derdixe. Wek elgîtar, elbas, amplîfikator û mîkrofona taybetî.



Muzîka klasîk gelek caran li salonên taybetî bi awayekî orkestrayî lêdikeve ku jê re dibêjin konser. Lê dema kesek bi tena serê xwe bi piyanoyê re bistirê ew jî konser e.

**navik**

Dema zarok hîn di zikê dêya xwe de ye, adana ku jê re pêwîst e, bi rêya navikê werdigire.
Navik zikê zarokê bi hevalzarokê ve girê dide. Dema zarok ji dêya xwe dibe, divê navik bê jêkirin.
Navika me hemûyan heye.





**newroz**


Newroz ji bo kurdan sembola rojeke nû û destpêka jiyaneke nû ye. Bi hezaran sal berê li Mezopotamyayê zilimkarekî bi navê Dehak hebûye û ew di 21ê adarekê de bi destê Kawa hatiye kuştin û kurd rizgar bûne. Ji wê rojê û heta nuha kurd di 21ê adarê de agir dadidin û şahiyê dikin. Meriv Newrozê li derve pîroz dike, lê li bajaran meriv dikare di salonan de jî pîroz bike.



**nexşe**

Nexşe wêneyekî ji parçeyekî erdê ye. Wek fotografekî ku meriv jor ve ji balafirê bikişîne. Ji jor ve erd nîşan dide lê wêneyekî basît e. Ji van wêneyên weha re nexşekêşanî dibêjin.
Gelek cureyên nexşeyan hene.
Wek mînak, di nexşeyên deryayan de ciyên lat û kûr bi alîkariya rengan ji hev cuda ne.





**nexweşxane:** li rûpelên 146-147an binere

**neynûk**


Di şûna neynûkan de piraniya ajelan bi penc û sim in. Lê însan û meymûn bi neynûk in. Neynûkên merivan pan û tenik in.
Neynûk di çerm de ye. Di tilî û bêçiyan de, di ber çerm re li ser koka xwe derdikeve.
Di avahiya laş de, neynûk û qiloç ji malbatekê ne.





---

**nêçîrvanî**

Merivên demên berê bi nêçîra heywanan jiyane. Ji bo xwarin û çermên wan nêçîr kirine. Piştre merivan zêdetir ji bo kêfê nêçîr kirine. Û îro jî nêçîrvanî ji cureyeke sporê tê hesibandin.
Di zemanê berê de merivan bi aletên basît wek tîr û kevan û dafikan nêçîr dikirin. Anuha bi tifingên bi gule û saçme nêçîrê dikin. Di roja îro de meriv nikare di her demê de û li her derê li gor dilê xwe nêçîrê bike.
Wek nimûne: li Skandînavyayê nêçîra gakoviyan û li başûrê Kurdistanê jî nêçîra kewan qedexe ye. Dem û qanûnên nêçîrvaniyê jî hene.







personalên nexweşxaneyê

personalên metbax û paqijiyê

## nexweşxane

Li nexweşxaneyê beşên nexweşiyên cuda cuda hene. Beşek jê ya qeze û nexweşiyên acil e. Li wir polîklînîk heye. Meriv li wê polîklînîkê muayene dibin, lê ne pêwîst e li wir razên. Yên ku divê li nexweşxaneyê bimînin, li beşên din radizên. Li her odeyekê ji bo nexweşan çend textên razanê hene. Li her beşekî doktor, hemşîre û karmendên din hene ku li nexweşan dinerin. Li nexweşxaneyan, odeyên doktoran, salonên emeliyatan, rontgen, metbax, pirtûkxane û dikan hene.




1. Rojekê Zozan ji [illegible] dikeve û lingê wê dişikê.

(Di rewşên weha de meriv telefonî 112an dike.)

2. Bi ambulansê diçe nexweşxaneyê.




3. Berê muayene dikin û rontgena wê dikêşin.




4. Li vir Zozanê emeliyat dikin.






Li nexweşxaneyekê gelek kes kar dikin. Herkes kar û fonksiyonek xwe heye. Ji bo nexweşxaneyeke tekûz pêwîstî bi van hemûyan heye.




5. Çîpa wê dikin cebsê. Dêya wê hertim tê seredana wê.



6. Piştî demekê Zozan diçe malê. Ew heta demekê jî bi cepsa xwe digere. Piştî vekirina cepsê ew dikare dîsa bisiklêtê bajo.



**nikul**

Diranên çûkan tunene. Lê di şûna diranan de nikulên wan hene. Nikulên wan hişk in û wek neynûk an jî qiloçan in.
Formên nikulan cuda ne. Çûk li kuderê çêbûne û çawan dijîn, ew formên xwe bi vî awayî digirin




**nivîsgeh**

Nivîsgeh ciyê kar e ku hinek kes li wir rûdinin û bi karê nivîsînê mijûl dibin. Ewropî ji nivîsgehê re buro an jî ofîs dibêjin. Dikare di nivîsgehê de ji bo herkesî jûrek hebe an jî gelek kes dikarin di saloneke mezin de bixebitin. Karê kesên li nivîsgehê ew e ku dinivîsin, dihejmêrin, bersivên telefonan didin û karên weha dikin.




**nivîskar**

Karê nivîskaran nivîsandin e.
Nivîskar mijarekê li gor fantaziya xwe an jî ji rastiya jiyanê şirove dike.
Roman, novel, helbest, pirtûkên zarokan, piyes, pirtûkên dersê û film ji hinek berhemên nivîskaran in.
Hin nivîskar bi daktîloyê, hin bi komputer û hinek jî bi pênûsê li ser kaxizan dinivîsin.



**noqav**

Noqav keştiyeke binê avê ye. Di noqavê de tank hene ku meriv dikare tijî av bike. Dema meriv van tankan bi avê dadigire, wê demê noqav giran dibe û diçe binê avê. Û gava ku meriv bi pompeyan avê ji tankan vala dike, noqav sivik dibe û derdikeve ser avê. Noqav bi tenê di şer de tê bikaranîn.



**nota**

Nota nîşandekên dengan e ku dide xuyakirin bê meriv çawa li amûreke muzîkê dixe û distirê. Her sitran notayên xwe hene ku li gor van notayan meriv li amûrê dixe.
Nota tam ne gilover e lê weke hêkê ye û li ser an jî li nav xêzikan tê nivîsîn.
Nota ton, kurtî û dirêjiya dengan diyar dikin.



**org**

Bi alîkariya pêlkirina kûrikekê an jî bi alîkariya ceryanê hewa pêk tê. Dema ev hewa di lûlikên metalî an jî darîn re derbas dibe, dibe deng.
Merivê ku li orgê dide, li ber wê rûdine û bi dest û pêyan lêdixe.



**orkestra**
Dema gelek muzîsyen bi hev re bixebitin, orkestrayekê ava dikin. Her yek amûrekê lêdide. Ji wan hinek têldar in, wek keman, hinek pifbar in, wek bilûr, hinek jî yên lêdanbar in, wek teplik û zeng. Kesê ku li pêş orkestrayê radiweste û bi rê ve dibe, jê re dibêjin şefê orkestrayê.



**otêl**
Li otêlekê jûr hene, meriv kirêya wan dide û lê radikeve.
Li resepsiyona otêlê meriv nav û navnîşana xwe dinivîse. Dûre kilîta jûra xwe digire.
Li gelek otêlan restorant jî hene.



**otobus**
Meriv di çûn û hatina navbera gund û bajaran de li otobusan siwar dibe.
Hinek otobusên nav bajêr duqatî ne.
Di otobusên nav bajêr de ciyên rûniştinê hene, lê meriv dikare li pêyan jî raweste.
Otobusên ku di navbera gund û bajaran de diçin û tên, di wan de ciyê rûniştinê rehet û fireh e.



**otomobîl:** li rûpelên 152-153an binere


## palmiye

Dara palmiyeyê li welatên germ heye. Qurmê wê rast û pelên wê tûjik in û wek hêlîneke bi serê darê ve ne. Bi piranî mêweyên wan tên xwarin, wek gûza hindî û xurme.
Ji bilî van ji don û êzingên wan sûd tê girtin. Di zimanê biyanî de ji bo gûza hindî dibêjin 'kokos'.




## pel

Di şînbûna dar û beran de rola pelan giring e. Gelek cure pel hene. Hin kulîlk bi xwe jî ji pelan pêk tên. Piraniya dar û deviyan, payîzan pelên xwe diweşînin. Lê darên ku pelên xwe naweşînin jî hene.




## pencere

Zemanê berê cam hewqas buha bû ku bi tenê di pencereyên dêr, koşk û serayan de hebû.
Nuha camên pencereyan bi makîneyan çêdikin. Ji bo ku germiya hundurê malê xwe ragire, îro piraniya camên pencereyan cot in.





Cugnotê fransî vagoneke hilmê ava kir: sal 1769



Benza almanî sal: 1885

## otomobîl


Otomobîlên bi benzînê kar dikin, 100 sal beriya nuha hatine çêkirin. Di destpêkê de yên ku otomobîl dajotin, hejmara wan kêm bû. Îro bi mîlyonan otomobîl hene. Di hemû awayên transportê de bi kar tên. Li bajarên mezin hejmara otomobîlan zêde ye. Otomobîl gelekî deng derdixin, gaz û dûxana gemarî berdidin.
Li fabrîke, benzînxane û tamîrxaneyên otomobîlan gelek kes kar dikin.



**cureyên otomobîlan**
Ji bo ku meriv barekî bibe ciyekî din kamyon divên. TIR bi hezaran km bar dibin û tînin. Kamyonên biçûk ji bo barên nav bajêr in. Otomobîlên biçûk di çûn û hatina kar û seyranê de bi kar tên. Otomobîlên racer jî ji bo pêşbirkan in.



TIR



racer




otomobîl



fordek-T ji sal: 1910



otomobîleke modern




**hundurê otomobîlekê weha ye**
Bi hezaran parçeyên otomobîlekê hene.
Di vî wêneyî de tu tenê hinekan ji wan dibînî.



kamyonet


**pengûen**

Pengûen çûkek mezin e. Ew nikare bifire lê baş ajnê dike. Pengûen li cemsara başûr hene. Yê herî mezin şahpengûen e û ji metreyekê dirêjtir e. Di nav pengûenan de yê nêr li ser hêkê kurk dikeve.




**penîr**

Penîr ji şîr çêdibe. Piranî ji şîrê mangeyan, lê ji şîrê mîh û bizinan jî penîr çêdikin. Gelek curepenîr hene. Gelek kes di taştê û paşîvê de nan û penîr dixwin.
Li hinek welatan piştî xwarinê weke paşxwarinî jî nan û penîr dixwin.



**pepûk**

Pepûk di destpêka biharê de ji Afrîkayê tê û payîzan vedigere.
Pepûk ji dûr ve dike pûkepûk lê xuya nake.
Pepûk di hêlînên çûkên din de hêkan dike. Dema hêkek wê diderize û çêlika wê çêdibe, pepûk çêlik û hêkên din ji hêlînê davêje.



**peqok**

Ji bo peqokê tasek û piçek av divê. Hinek dermanê firaxan têxe tasekê û li hev bixe. Serê têlekê an jî tayekî hesinî biçemîne û bike mîna xelekekê. Paşê xelekê hêdîka têxe avê û derxe. Dema tu pifî xelekê bikî peqok çêdibin. Hemû rengên keskesorê jî di wan de xuya dibin.




**perav**

Li peravê sêlax û av digêhin hev. Pêlên deryayê xwe li kaş û tahtên perê avê didin, wan diherifînin, dikin ax û sêlax. Paşê jî ava deryayê wê ax û sêlaxê bi xwe re dibe û davêje ciyekî din ku li wir peravên ji sêlaxê pêk tên.
Li peravan gelek cure giya hêşîn dibin û lawir dijîn. Ji xwe meriv li ciyekî din nikare rastî wan giya û lawiran were.



**perçem**

Perçem alek e ku bi darekê ve girêdayî ye. Meriv bi destan hildigire.
Perçem bêtir di warê leşkerî de bi kar tê. Her hêzeke leşkerî xwediyê perçemeke xwe û xas e.



**perdepenc**
Lingên çûkên nav avê bi perde ne. Ev perde tenik û rakişandî ye, pê avjeniyê dikin. Lingên van çûkan mîna pêtikên avê ne.
Werdek, qaz, quling û qû lingperde ne. Lawirên mîna beq û kûzeyên avê jî bi perdepenc in.



**pere**



Pereyên berê ji parçeyên zêr û zîv bûn. Carina buhayê du parçeyan ne wek hev bû. Dema meriv tiştek bikiriya diviya bû ku parçe bihata wezinandin. Lê îro gelekî hêsan bûye. Pereyên kaxizîn û yên madenî hene. Li hinek deverên welatê me ji bo pere, dirav jî dibêjin.

**perî**
Di zemanê berê de merivan bawer dikir ku perî hene û ew di xwezayê de dijîn. Bi şev meriv dikare bibîne ku ew şahî û govendê dikin. Lê di rastiyê de tiştekî welê tuneye.
Perî tenê di efsane, çîrok û xevroşkan de hene û figurên keçikî ne.



## petêx

Petêx ji malbata xiyaran e. Mezin û gilover e. Gelek cureyên petêxan hene. Wek hingivîn, tehlik, gindor.
Ji cureyên zer û şîrîn re hingivîn dibêjin. Welatê me Kurdistan ciyê petêxan e.



## peyamber

Kesê ku peyam û agahdariyê dibe, jê re dibêjin peyamber. Di zemanê berê de peyamberan ji derveyî welat agahdarî dihanîn û dibirin.
Di navbera mîrên kurdan de jî peyamber hebûn. Ji wan re qasid jî digotin.
Nuha jî peyamberî bi awayekî modern tê kirin.



## peyker

Di hin deman de meriv peykerên kesên bi nav û deng -wek şah û zanayên mezin- çêdikin û li meydan û kolanan dadiçikînin.
Gelek caran peykerê kesan bi qasî meziniya laşê wan e, carina jî dikare jê mezintir be. Peyker bi piranî ji kevir, bronz an jî ji metalên din tên çêkirin.



## pezkoviyê bakur

Pezkovî ajelên kovî ne. Qiloçên nêriyên wan şaxşaxî ne, hersal qalik davêjin û nû dibin.
Navê çêlikên wan karxezal e.




Di vî wêneyî de meriv dibîne ku ji bo hevîr çi pêwîst e.






## pijandin

Evîn lewaşeyekê dipêje. Pêşiyê hevîr distirê. Dûre bi paçekî dinixumîne. Hevîr tirş dibe. Ew girikê hevîr çêdike û datîne ser sêlê. Hevîr kêliyekê li ser sêlê nixumandî dimîne, hinekî din tirş dibe û diwerime. Vêca Evîn sêlê dixe firinê, lewaşe diqemire. Paşê Evîn nanê xwe ji firinê derdixe.
Li Kurdistanê, li hin gund û bajaran xelk nanê xwe li tenûrê jî dixin.




Li Kurdistanê, ji babetên pijandina nan yek jî ev e ku meriv hevîr li ser texteki bi tîrê pahn dike û dûre li ser sêlê dipijîne. Jê re dibêjin nanê sêlê.



## piling

Piling ajelekî ji malbata pisîkan e û mezin e. Ew li Asyayê û li gelek ciyên din jî hene. Lê mixabin neslê wan roj bi roj kêmtir dibe. Zemanê berê li Kurdistanê jî piling hebûne lê nuha nemane.
Piling bi tena serê xwe nêçîrê dike. Nêçîra wî berazên kovî, pezkovî û gelek ajelên din ên mezin in. Piling carina dikare êrîşî merivan jî bike.




## pire

Pireya herî hêsan ew e ku meriv beştekî an jî qalasekî dayne ser coya avê. Navê wê pirik e. Pireyên mezin bi awayên cuda têne avakirin. Pireyên ku herî zêde têne çêkirin yên li ser lengeran in. Lenger pireyê radigire.
Pireyên kevankî û yên hilawestî jî hene.




## pirika mil

Du pirikên milên meriv hene û di ser defa sîng re derbasî girmilan dibin. Dema meriv destê xwe dide wan, di bin çerm de bi hêsanî xuya dikin. Ku meriv bikeve erdê, dikare bi hêsanî pirika milê meriv bişikê. Heger pirik bişikê meriv dikare bi tiştekî girêde, di çend hefteyan de dicebire.



A a B b C c Ç ç D d E e Ê ê F f G g H h I i Î î J j K k L l M m N n O o P p Q q R r S s Ş ş T t U u Û û V v W w X x Y y Z z



Berî 5000 salan li Babilonê merivan li ser kîlan nivîsîne.



Li Misir, Yûnan û Romayê merivan li ser papîrûsan nivîsîne.



Li manastiran pirtûk li ser pergamentan dinivîsandin û bi hev ve dikirin.

**pirtûk**

Dîroka pirtûkan dûr û dirêj e. ”Pirtûkên“ pêşîn li ser deremên kîlan hatine nivîsandin. Dûre merivan dest pê kiriye li ser papîrûsê nivîsîne. Nêzîkî 2000 sal berê jî pergament hatiye bi kar anîn. Pergament ji çermê mîh an jî golikan bi rengekî taybetî çêdibû.
Cara pêşîn bi xêra pergamentê merivan rûpel çêkirine, bi hev ve dirûtine û pirtûk durist kirine. Diviyabû ku her nimûneyeke ji pirtûkekê bi destan bihata nivîsandin. Loma pirtûk kêm bi dest diketin û buhayê wan pir giran bû. Lê li Ewropayê berî 500 salî, Gutenberg hunera çapkirinê dît. Îcar merivan dev ji pergamentê jî berdan û dest pê kirin kaxiz bi kar anîn.





Li Ewropayê berî 500 salî, Gutenberg hunera çapkirinê dît.



Hunera çapê îro berfireh û nûjentir bûye.



## pirtûkxane

Li pirtûkxaneyê pirtûk tên komkirin. Li gora mijarê, bi rêz li teniştа hev tên danîn. Pirtûkên zarokan li aliyekî, yên fakta û ferheng li rexekî û yên din jî li aliyekî din in.
Tu dikarî pirtûkan ji pirtûkxaneyê deyn bikî û bibî malê. Lê divê tu baş li wan binerî.



## pisîk

Pisîk li her derê dunyayê hene. Wek kûçikan pisîk jî heywaneke kedî û dirinde ye. Pisîk ji malbata şêr û pilingan e. Ew gelek çalak û bêdeng e. Çavên pisîkê di tariyê de baş dibînin. Pencên wê tûj in û carina diseqîne û tûjtir dike. Lê ew pirî caran pencên xwe dide hev.
Gelek cureyên pisîkan hene. Meriv dikare hemûyan di du koman de bi cî bike: pirçdirêj û pirçkurt. Li welatê me pisîk pir in û ya herî bi nav û deng pisîka Wanê ye. Pisîka Wanê pirçdirêj e û çavekî wê şîn û yê din kesk e.




Dema pisîk hêrs dibin, pişta xwe xûz dikin û dikin qîjewîj.




Dema pisîk kêfxweş bin ew tên û xwe di meriv didin.





Bîbikên çavên pisîkan di ronahiyeke xurt de dibin weke xêzeke serejêr û di tariyê de jî dibin giloverên mezin.



Ev neynûkên tûj çekên pisîkan in. Û ew dikarin wan di nava pencên xwe de veşêrin.



pisîkeke Wanê


## pisûle

Di pisûleyê de derziyeke mîknatêsî heye û biçûk e. Ew derzî hertim berê xwe dide bakur. Dunya bi xwe mîknatêseke mezin e.
Derziya pisûleyê jî xwe li gor cemsarên mîknatêsiyên dunyayê sererast dike.




## pişemasî

Pişemasî di deryayê de dijîn û laşê wan gilover, tenik û zelal e. Devê pişemasiyan di binê wan de ye. Rîşikên wan dirêj û gezgezkî ne.
Dema ku meriv avjeniyê bike û ew bigêhîjin laşên meriv, laşê meriv dişewite.





## pişik

Di nav sînga merivan de du pişik hene. Bi wan em bîhna xwe digirin û berdidin. Bi saya pişikan xwîn oksîjenê distîne. Hewa di qirikê re, di lûleyên nefesê re digêhin kîsikên hewayê ku ew mîna gûşiyên tirî ne.



**pizirk**

Pizirk, girreke biçûk e ku di laşê merivan de dertê. Carina û nemaze di dema kamilbûnê de, li rûyê merivan pizirk derdikevin.
Pizirk weha çêdibin: Di çermên merivan de qul hene. Ew carina dixetimin. Heger mîkrop têkevin qulekê, ew nêmê digire, kul dibe û pizirk çêdibe.



**pîjame**

Cilên ku bi şevê meriv pê radikeve jê re dibêjin pîjame. Wek kiras û derpê du parçe ye.
Berê bi tenê mêran pîjame li xwe dikirin. Nuha jin jî pîjame li xwe dikin.



**pîlot**

Pîlot balafirê dajo. Ji odeya pîlot û hevkarên wî re kabîn an jî cockpît dibêjin. Li wir dîreksiyon, vîtes û gelek aletên din hene.
Pîlot û hevkarên xwe bi van aletan balafirê dajon. Bi alîkariya radyoyê pîlot bi radara erdê re têkiliyê datîne û alîkariyê werdigire.



## pîramîd

Tu di wêne de pîramîdên Misirê dibînî. Di demên berê de ji bo Firewnên Misirê wek gor hatine avakirin. Pîramîd berî 4000 salan hatine çêkirin. Piramîdên herî mezin ji 200 metreyî bilindtir in. Ji bo avakirina pîramîdan xebateke mezin û çetin hatiye kirin. Di hundurê pîramîdan de rê û tunelên veşarî hene: ji bo ku li gorê, zêr û emaretên wan bêne parastin, ev rê û tunel hatine çêkirin.




## pîrebok

Çîrokên pîrebokan herdem hebûne. Li gor hin çîrokan pîrebok meriv in û ew ji nû ve vejîyane. Ew xwedî sihr in. Li gor gotinê pîrebok çîlsipî, zelal û dikarin di dîwaran re jî derbas bibin.
Xerabiya wan ya herî mezin ew e ku bi xof in û meriv ji wan ditirsin. Tiştê herî baş jî ew e ku pîrebok nînin.



## pîvazok

Pîvazokên hin hêşînahî û kulîlkan di bin erdê de ne. Wek mînak lale yek ji wan e. Pelên pîvazokên wan qat bi qat li ser hev in û bi reh û qîvar in. Di van pelan de adan kom dibe.
Dema pîvazok zîl dide, rewayê ji wan distîne.



## piyano

Piyano amûreke têldar e. Têlên şidiyayî li ser çarçoveyeke hesînî hatine bicîkirin. Înstrumenta ku li ser pahnayiyê hatiye çêkirin jê re piyanoya bi bask dibêjin. Dema meriv li tûşên piyanoyê dixe, mîrkutên biçûk li têlên şidiyayî dikevin û deng dide.





## polîs

Karê polîsan gelek e. Divê ew trafîkê bi rêkûpêk bi rê ve bibin, li sûcdaran bigerin û pêşiyê lê bigirin. Polîs di gelek waran de alîkariya xelkê dikin. Wek nimûne, ew diçin zarokxane û dibistanan zarok û şagirdan di derheqê rê û qanûnên trafîkê de serwext dikin.



## ponî


Ji hespê biçûk re dibêjin ponî. Bilindiya wan ji metre û nîvekê kêmtir e. Piraniya cinsê poniyan ji herêmên çiya û giravan e. Ew bi hêz û ewletir in. Îro bêtir zarok û ciwan li poniyan siwar dibin û ji wan hez dikin.



## porteqal


Porteqal di destpêkê de li herêmên germ yên Asyayê şîn dibûn. Bi barên gemiyan porteqal gêhîştiye Ewropayê. Loma jî hin ewropayî ji porteqalê re dibêjin “sêva çînê.” Anuha li gelek welatên germ têne çandin. Porteqal meyweyek e, meriv ji wan rîçalê çêdike, diguvêşe û ava wan vedixwe. Porteqal ji malbata lîmon, mandarîn û greypfrutan e.





## postexane

Berfîn ji Rizgo re nameyekê dinivîse. Ew nameyê dibe davêje qutiya postê. Otomobîla postexaneyê tê û ji wir nameyê dibe postexaneyê.
Li postexaneyê name li gor navnîşanan ji hev tên cudakirin. Nameberek nameyê ji wir digire û dibe mala Rizgo. Herweha meriv dikare li postexaneyê, kartên pîroziyê, rojname û pakêtan jî bişîne. Ji bo şandina wan meriv pereyê pûlên wan dide.



## pûl



Ji bo ku postexane nameyê bişîne navnîşanekê, meriv pûlê li ser zerfê dixe. Pûlên herî pêşîn kêm zêde berî nuha bi 150 salî peyda bûne. Bi peydabûna wan re komkirina wan jî gelek populer bûye. Ev hobî karekî xweş û bi heyecan e.
Pûla kurdî ya pêşîn jî di 1923an de li başûrê Kurdistanê hatiye çapkirin.

## pûsel



Pûsel wêneyek e ku hatiye parçekirin. Di lîstika wê de divê meriv wan parçeyan li ser pahnayiyê bîne ba hev û wî wêneyî ji nû ve çêke.
Lîstika pûselê hinekî wextê divê, lê xweş e.

## qahwe




Di libeke berê qahweyê de du dendik hene.

Meriv qahweyê ji dendikên qahweyê çêdike. Dendikên wê jî bi deviyên wê ve ne. Piraniya qahweyê li Amerîka Başûr tê çandin.
Dendikên qahweyê berê tên hêrandin û piştre jê qahwe tê çêkirin.
Li Swêdê xelk pir qahweyê vedixwin.

## qaz

Ji çûkên nav avê, çûkên herî mezin qaz in. Qaz dikarin bifirin jî. Ew giya dixwin û li bejayiyê dimînin. Hustuyê wan dirêj û nikulên wan bi hêz e. Qazên bejî li gor demsalan li çiya û beriyê difirin. Refên qazan li dû hev cot bi cot an jî di forma "V" de difirin. Meriv goştê qazan dixwe û periyên wan bi kar tîne.



## qelereşk

Qelereşk ji malbata qirakê ye lê piçekî jê mezintir e. Reş û cûne ye û nikulê wê bi hêz e. Dengê wê bilind û sitûr e. Qelereşk heywanên zîrek in. Li her deverê qelereşk hene.




## qerase

Bi alîkariya qeraseyê meriv dikare gelek tiştên giran ji cî bilivîne û rake. Ev kurik bi qeraseyekê kevirekî mezin ji cî radike. Serê qeraseyê dike bin kevirê mezin û kevirekî biçûk wek destek dide bin qeraseyê.
Meriv çiqas ji destekê dûr pê li qeraseyê bike livandina kevirê mezin hewqas hêsantir dibe.




**qeşabir**
Zivistanan hinek derya qeşayeke sitûr digirin. Wê demê keştî nikarin di deryayê de herin. Hinek keştiyên taybetî hene ku qeşayê dişikînin û ji keştiyên din re rê vedikin. Ji van keştiyan re qeşabir dibêjin.
Qeşabir keştiyeke berfireh û bi hêz e. Li pêş û paşiya wê perwaneyên wê hene.




**qijik**
Ciyên ku însan lê dijîn, qijik jî hene. Qijik her çar demsalan li warê xwe dimîne. Hêlîna xwe ji qirşikan çêdike û bi salan wê terk nake.
Qijik hertiştî dixwe. Gelek caran hêlînên çûkên din hildiweşîne.




**qijnik**
Qijnik lawirên biçûk û bêcir in. Ciyê ku gez dikin pê ve dizeliqin. Heta ku diwerimin xwînê dimijin. Ji bo ku serê wan bi birînê ve nemîne, meriv wan bi mûçingê bi zorê radike.



## qiloç

Çi nêr û çi mê be, hinek ajel bi qiloç in. Ji wan hinek jî tenê yên nêr bi qiloç in. Qiloçên ajelên weke pez û dewaran heta ku dijîn nakevin. Lê qiloçên gakovî, pezkovî û xezalan hersal qalik davêjin û nû dibin.
Li hin deverên welatê me jê re şax û sitrû jî dibêjin.




## qulik

Hin ajelên mîna rovî, gur û kurebeşk di qulikan de dijîn. Ev qulik pirçavî ne.
Dema dijmin di çaviyeke qulikê re tê, ew di çaviyeke din re derdikevin der.



## quling


Ji çûkên mezin yek jî quling e.
Quling li çiya û zozanên Kurdistanê gelek in. Ew çûkeke koçer e.
Payîzê diçin Afrîka Bakur û biharê vedigerin. Ew carina direqisin, ji vê yekê re dibêjin reqsa qulingê: çog didin, hêz didin xwe û bi baskên vekirî xwe çeng dikin.



**qû**
Hustu û nikulê qûyê dirêj in. Giyayên nav avê dixwin. Qûyên gerdenxwar li ser avên şor û şêrîn dijîn.
Qûyên dengbêj li warên hênik an jî sar kurk dikevin.




**qûle**
Qûle di tariyê de rê nîşanî keştiyan dide. Qûle bilind in û ronahiya wan xurt e, ji dûr ve xuya dike.
Lampeyên her qûleyekê bi awayekî vedijene.
Berê li hemû qûleyan dergevan hebûn lê îro piraniya qûleyan otomatîk kar dikin.




**radyo:** li rûpela 173an binere

**rastkêş**
Meriv bi rastkêşê xêzê dikişîne an jî dipîve. Meriv li dibistanê bêtir rastkêşên plastîk bi kar tîne.
Lê ji bo planên bi rêk û pêk mase hene û rastkêşên wan jî bi wan maseyan ve ne.



## radyo

Bi alîkariya radyoyê meriv dikare axaftin, muzîk û hemû tiştên bi deng, bêyî têl û bêyî girêdan bişîne her aliyê dunyayê.
Dema keçik li vir dipeyive pêlên dengan pêk tên. Bi riya mîkrofonê pêlên dengan vediguherin û dibin pêlên elektrîkî. Ev pêl derbasî pêlweşa radyoyê dibin. Li wir pêlên elektrîkî dibin pêlên nependî û bi rêya antenekê belav dibin. Ev pêl nayên bihîstin lê dema digêhîjin radyoyekê li wir dîsa vediguherin û dibin deng û di hoperloya radyoyê de tên bihîstin.




Dema ku keçik di studyoya radyoyê de dipeyive, meriv dikare li malê di radyoyê de guhdariya wê bike.
Tu dikarî vê axaftin û muzîkê werbigirî kasetekê û piştre dîsa biweşînî.

Radyoyên gelek biçûk hene ku tu dikarî wan bikî bêrîka xwe. Di gelek radyoyan de teyp jî hene. Tu dikarî bi guhikan jî guhdariya radyoyê bikî.


## ren

Ren ji cûreyeke pezkoviyan e. Pirça wan gelek gur e û simên wan fireh in û dikarin bi hêsanî di nav berfê de herin.
Renên nêr jî û yên mê jî bi qiloç in.
Ren bi keriyan dijîn.
Laponiyên ku li bakurê Norveç, Swêd û Fînlandiyayê dijîn, renan xwedî dikin.
Ren ajelên laponiyan e, ajelên malê û kedî ne.



## rende

Rende aleteke xerat û dartiraşan e. Meriv bi rendeyê dikare ruyê text û daran rast û şayik bike.
Rende destikek e ku kêrikeke mîna gûzanê pê ve ye. Gelek cureyên wan hene, hinek darîn in, hinek hesinî ne.




## rêz

Tiştekî ne xweş e ku meriv di rêza tiştekî de zêde raweste. Lê pratîk e ku meriv di rêzeke dirêj de raweste û li bendî dora xwe be. Wek mînak, dema meriv li otobusê siwar be, zehmet e ku meriv hemû bi hev re di deriyê otobosê re têkevin hundur.
Ji aliyê mafdariyê ve jî weha ye. Yê ku pêşiyê hatiye divê berê têkeve hundur.



## rêzeçîrokên wêneyî

Ma te em nas nekirin?
Em figurên rêzeçîrokên wêneyî ne, ku wênekêşên cuda cuda em çêkirine. Gelek ji me ajel in, lê em mîna însanan dipeyivin.
Cara pêşîn, di sedsala 19an de rêzeçîrokên wêneyî di rojnameyên amerîkî de hatin weşandin û hejmara wan roj bi roj zêdetir bû.



## rîh

Li serûçavê mêran, li hinarikên rû, algûşik, çenge û li dora lêvan pirç der tê. Navê vê pirçê rîh e. Piraniya mêran rîha xwe kur dikin. Hinek ji wan rîha xwe berdidin.
Dema kesek rîha derewîn bi rûyê xwe ve dike, meriv hew dikare wî nas bike.



## robot

Di destpêkê de ji makîneyên mîna însanan re digotin robot. Lê îro robotên îndustriyê hene ku xwe bi xwe li fabrîkeyan karên cuda cuda dikin.



robota fantaziyê



robota îndustriyê

**roj:** li rûpela 176an binere


## rojbûn

Îro rojbûna Zînê ye. Ew dibe şeş salî. Ji bo wê tortayeke bi şeş findên pêketî hatiye xemilandin. Hevalên wê jê re diyarî kirîne.
Zînê pifî findên pêketî dike û şahiya rojbûna wê dest pê dike.




## roj

Roj sitêrkek ji sitêrkên li asîman e. Ji ber ku ji sitêrkên din bêtir nêzîkî me ye û loma ew ji me ve mezin xuya dike. Roj 15 hezar mîlyon km ji dunyayê dûr e. Dunya me û peykên din li dora rojê dizivirin. Roj gilokeke gazê ye û gelek û gelek mezin e. Derveyê wê 6000 û hundurê wê jî bi mîlyonan derece germ e. Tim û tim ronahî û tîrêjan dişîne. Bêyî tîrêjên rojê jiyan ê li ser ruyê erdê tune bûya.




## rojgîran û hîvgîran

Carina hîv dikeve ber rojê, wê demê roj tarî dibe. Ji vê re rojgîran dibêjin. Carina jî hîv dikeve ber siya dunyayê, wê demê wenda dibe û ji vê bûyerê re hîvgîran dibêjin. Girtina rojê bi tenê li hin cîhan tê dîtin. Di dema rojgîranê de heger meriv bixwaze lê mêze bike, divê meriv berçavkên tarî bide ber çavên xwe.



## rojname

Rojname her roj derdikeve û têde nûçe û reklam hene. Rojnameya heftane bi naveroka xwe bersiva daxwazên malbatekê dide. Têde serpêhatî, tarîfên xwarinê, zencîreçîrok, xaçepirs û hwd hene. Herweha kovarên li ser otomobîl, mal û xanî an jî babetên li ser agahdariyan didin jî hene. Kurdan cara pêşîn di sala 1898an de rojname derxistine û navê wê jî Kurdistan e.



## rojnamevan

Ew kesên ku di rojnameyan de dinivîsin ji wan re rojnamevan dibêjin. Karê rojnamevanan ew e ku nûçeyên bûyeran binivîsin û hevpeyvînan çêbikin. Rojnamevan piştre wan nivîsarên xwe didin rojnameyekê û ew di wir de diweşin.



## roket

Di şahî û pîrozbahiyan de roket tên avêtin û teqandin. Roketên ku dişînin asîmanan jî kêm zêde bi vî awayî ne. Di hundurê roketê de barût an jî madeyeke teqandinê heye ku zû agir digire û gazê çêdike. Dema ev gaz bi xurtî derdikeve der, wê demê roket ber bi pêş an jî ber bi jor ve diçe.



## ronahî

Roj, lampe û rivînên findan ronahiyê didin. Ronahî mîna pêlan e. Di ciyên bê hewa re jî derbas dibe. Dikare mîna topekê li erdê bikeve û rabe xuya bike. Di madeyên zelal wek av, cam û naylonê re derbas dibe. Rengên pêlên ronahiyê dikarin cuda bin. Ronahiya sipî ji hemû rengên din pêk tê.




## rontgen

Carina doktor bi rontgenê lênêrînan dike. Tîrêjên rontgenê heta binê çerm û masûlkan diçin lê baş di hestiyan re derbas nabin. Ji ber vê yekê ye ku meriv bi alîkariya rontgenê wêneyê hundurê laşê xwe dibîne ka çawa ye û çi heye. Wek nimûne dema hestiyekî meriv bişikê, meriv rontgena wî dikişîne.





wêneyê ku bi rontgenê hatiye kişandin


## rovî

Rovî yek ji ajelên dirinde ye. Rovî bêtir mişk û lawiran dixwe. Dema ew fersendê bibîne, êrîşî mirîşk û elokan jî dike. Rovî gelekî ji tirî û mêweyan hez dike. Bi roj di qulika xwe de dimîne û bi şev derdikeve nêçîrê. Rovî ajelekî fenek e.



## saet

Saet cara pêşîn berî zayînê li Mezopotamyayê ji aliyê Sumeriyan ve hatiye çêkirin. Bi alîkariya tav û saeta qûmê dem pîvane. Saeta mekanîk a pêşîn bi qasî 600 sal berî nuha hatiye çêkirin. Cara pêşîn nîşandeka saetê dîtine û piştre jî ya deqîqeyan.




## saksafon

Saksafon amûreke pifbar e. Girsbûna wan û dengê tonên wan herwekî soprano, tenor, barîton, bas û basbarîtonê ji hev cuda ne. Saksafon, bi taybetî di muzîka jazê de bi kar tînin.





## sarincok

Di hundurê sarincokê de, li jor qutiyeke sarkirinê heye û di hundurê wê qutiyê de madeyeke pir sar û ron heye. Ew madeya ron hewayê digire û sar dike. Wê gavê tiştên di sarincokê de pê sar dibin. Madeya ron bi alîkariya pompayê, hewaya germ dibe dawiya sarincokê û di wir re derdikeve der. Herweha hewa dewir dibe û sarincok sar dimîne.




**sauna**
Sauna pir germ û bi hilm e. Meriv tê de gelekî xwêdanê dide û herweha hêsantir jî paqij dibe. Sauna wek ya fînîyan têt naskirin lê tê gotin ku xweşûştina li saunayê dibe ku ya rûsan be.
Li Kurdistanê li şûna saunayê hemam û germav hene.



**sebze**
Sebze gelek cure şînahî ne ku meriv wan dixwe. Wek mînak xiyar û firingî, pelên xas û keleman sebze ne. Sebze dikarin wek bezelyeyê bi lib bin an jî wek tivir û gêzeran bi reh bin.





**semasî**
Semasî curemasîyekî bi talûke ye.
Di pişta wî de perikeke sêgoşe heye, loma jî meriv zû wî dinase.
Devê wî li jêr di binê serê wî de ye.
Diranên wî tûj û çend rêz in.
Semasî hov in. Ew bi piranî di deryayên germavî de dijîn.



**serdema kevirî:** li rûpelên 182-183an binere

## sêgoşe

Sêgoşe wek navê xwe, ji sê xetên rast pêk tê. Sê goşeyên wê hene. Di muzîkê de jî amûreke sêgoşeyî heye jê re dibêjin sêgoşe.
Ew ji pola ye û meriv bi şivikeke polayî lêdide.



## sêv

Dara sêvê hema hema li her aliyê dunyayê hêşîn tê. Gelek cureyên sêvan hene.
Meriv dikare şerbet û rîçala sêvan çêke. Herweha sêvan li ber tavê hişk bike û ji bo xwarinê bi kar bîne. Sêvên bejî jî hene, lê ew biçûk û tirş in.




## simore

Simore ajelên kojer in. Ew tiştan dikojin. Li gel ku ew ji malbata cirdon û mişkan in, lê dîsa jî kubar û xweşik in. Di qulikên daran de dimînin, qût û xwarina xwe li wir kom dikin.
Simore nok, gûz, berû, ber, xoze û dendikan dixwin.








## serdema kevirî


Berî ku hesin bi kar bînin, merivan alavên xwe ji kevir, dar, hestî û qiloçan çêdikirin. Loma jî ji vê serdemê re dibêjin: serdema kevirî.
Vê serdemê dûr û dirêj dom kir. Berî nuha bi çend mîlyon salan însan hebûne. Kêm zêde 3500 sal berî nuha li Skandînavyayê serdema kevirî bi dawî hatiye. Lê heta îro jî li hin deran, xelk hene ku hîn mîna merivên serdema kevirî dijîn. Ango alavên wan ne ji hesin in.
Di serdema kevirî de merivan bi nêçir, masîgirî û berhevkirina tiştên li erdê debara xwe dikirin. Pêşiyê kom bi kom li vir û li wir li xwarinê digeriyan. Dûre dest pê kirin zad çandin û ajel kedî û xwedî kirin. Tê zanîn ku cara pêşîn li Kurdistanê merivan dest bi çandin û xwedîkirina ajelan kirine. Di vê demê de xanî û gund hatine avakirin û merivan xwe dane ser jiyaneke dêmaniyê. Û êdî pêwîstiya wan bi guhertina cî û war nemaye.Wê çaxê dest pê kirine qahfik û hacetên din jî saz kirine.




**nêçîrvan û berhevkar**
Di wan deman de mêran nêçîr dikir û jinan jî mêwe, pel û pincar berhev dikirin. Merivên wê demê di berqef, şikeft û konên çermîn de diman.











**çandinî dest pê dike**
Di wêneyê jêrîn de ta çend nimûneyan **ji** çandinî û dêmaniyê dibînî ku 6000-7000 sal berê li Mezopotamyayê peyda bûye. Ew genim diçînin û dewar û bizinan xwedî dikin.

## simoreya avê

Simoreyên avê bi piranî di nav avê de dijîn. Pencên wan bi perde ne û ji bo ajnê gelek baş in.
Simoreyên avê nêçîra masî, beq û kevjalan dikin. Ew pir hez dikin ku di nav avê de bilîzin



## sipîndar

Sipîndar li erdê avî şîn dibe. Du cinsên wê hene: sipîndara zirav û dirêj û ya derbikan ku zû çêdibe, pel û şaxên wê fireh in. Ji textên sipîndaran meriv mobîlya û gelek tiştên din çêdike. Dema baran dibare û dûre jî tav derdikeve, pel û rêşiyên wê mîna bûkekê dixemile. Sipîndar li Skandînaviyayê pir in.



## siwarî

Siwarî şervanên serdema navîn bûn.
Li ser pişta hespan şer dikirin û bi zirx bûn.
Kumzirxek jî li serê wan hebû.
Herweha hespên wan jî bi zirx bûn.
Hinek hesp jî bi berenîk û carcim bûn.
Li rojavayê Ewropayê ji bo siwariyan dibêjin, şovalye.



## sî

Dema ronahî di tiştekî re derbas nebe, li pişt wî tiştî sî peyda dibe. Di wêne de hûn dibînin ku Zînê bi arîkariya lampe û tiliyên xwe li dîwêr fîguran çêdike. Ger perdeyeke ku ronahiyê derbas nake hebe, meriv dikare bi vî awayî ji siyê gelek fîguran çêke.




## sînema

Li sînemayê xelk rêz bi rêz rûdinin û li fîlm temaşe dikin. Fîlm bi xwe şerîteke dirêj e. Li pişt temaşevanan meriv fîlm dixe projektorê û li ser perdê nîşan dide. Fîlm li ser perdê mezintir xuya dike.



## sîrkus

Berî 2000 salan li Roma kevin sîrkus ciyekî pêşbirka erebeyên hespan bû.
Carina jî li sîrkusê huner û şanogeriyên balkêş pêşkêş dibûn. Sîrkusa modern îro bi canbaz, hunermend, qirdik û seyîsan ve di sedsala çûyî de forma xwe sitand.



**sîsalek**
Sîsalek balindeyên mezin û hov in. Bi piranî ser û qirikên wan rût in. Ji ber vê yekê jî ji wan re sîsalekên gurî jî dibêjin. Pencên wan xwar û bi hêz in. Sîsalek li welatên germ dijîn. Ew bêtir kelax û berateyan dixwin. Dema sîsalek kelaxekî dibînin li ser kom dibin. Di demeke kurt de goştê kelaxekî dirûçikînin û bi tenê hestî dihêlin. Herweha sîsalek siruştê paqij dikin



**sîsalekên keçel**
Sîsalekên keçel li dunyayê li du ciyan mane: li Bîracûga Ruhayê û li Fasê. Di van salên dawîn de her ku diçe neslê wan kêm dibe. Li Bîracûgê 75 sîsalekên keçel hene. Ew kêz û kurmikan dixwin. Anuha ji bo parastina neslê wan hêk û kartolên kelandî jî didin wan. Sîsalekên keçel li ser zinarên bilind hêlînên xwe çêdikin. Dema kurk dikevin 27-29 rojan li ser hêkên xwe dimelisin.
Ew dikarin 25-30 salan jî bijîn. Xelkên navçeya Bîracûgê jê re dibêjin, keleynax.



## sîwan û parasol

Meriv bi sîwanê xwe ji baran û tavê diparêze. Parasol jî ji bo tavê ye. Meriv parasolê li ber rojê di ser xwe re vedigire ku tav û tîrêja rojê meriv nerihet neke. Ev tişt ji zû ve hebûne lê bi qasî îro bi kar nedihatin.








## sîwêne

Sîwêne (siluet) wêneyê siya tiştekî ye. Ew di sedsala 18 û 19an de gelekî populer bû. Meriv wêneyê siya tiştekî ji kaxizeke reş dibirî û bi kaxizeke sipî ve dizeliqand. Ev kar bi serê xwe hunerek bû û di vî warî de gelek hunermendên jîr hebûn.



## skelet

Skelet sitûna ji hestî ye û hemû aliyên nerm ên laşên meriv radigire û diparêze. Skelet ji tevnên hestî û kirtikê pêk tê. Di laşê merivekî de 206 hestiyên skeletê hene.




## slalom

Slalom babetek ji sporên çiyayên Alpînê ye. Meriv di ser berferêyeke pirdergehî re bi palikan serberjêr dadikeve. Her dergehek ji cotek şivikan pêk tê. Bi serê van şivikan ve al hene. Cotek sor û cotek şîn li dû hev tên.
Babeteke din jî slaloma mezin e. Rêya wê dirêjtir, dergehên wê firehtir û leza wê zûtir e.



## sosina newalan

Sosina newalan ji cûreyeke sosinan e. Bi kulîlkên xwe yên mîna saetê û herdu pelên xwe yên pan, bi hêsanî tê nasîn. Bêhna wê jî xweş e.
Gihayê sosina newalan û berên wê yên sor ku dereng digêhîjin, gelekî bi jahr in. Li hinek deveran jê re dibêjin zembeq jî.





## sitêrka bi dûvik

Carina meriv li ruyê asiman ronahiyeke dirêj dibîne ku dişemite. Bi kurdî ji vê yekê re sitêrka bi dûvik dibêjin. Sitêrka bi dûvik li gerdûnê ketina kevir, xîç û qeşayê ye ku xîj dibe.
Dûvika wê bi gaz e û ji ber vê yekê tîrêjên rojê lê dixe û ew dibiriqe. Sitêrkên bi dûvik di rêgeheke dirêj de li dor rojê dişemitin.



**stetoskop**
Gava tu bêhna xwe didî û distînî, bi rêya stetoskopê doktor dikare guhdariya deng û lêdana dilê te bike. Stetoskop ji serikekî biçûk û du lûlikên zirav pêk tê. Doktor stetoskopê dike guhê xwe. Bi xêra pişkoke pişt serikê, deng bilindtir dibe.



**şah**
Li hinek welatan şah heye û ew serokê dewletê ye. Li hinek welatan jî serokdewlet an jî serokkomar heye. Her ku diçe li dunyayê şah û şahîtî kêm dibe. Di çîrokan de şah bi tac û kincên dirêj digere. Ji jina şah re em dibêjin şahbanû.



**hundurê şanoyê**
Di dema lîstinê de ne bi tenê şanoger, herweha gelek kesên din jî alîkar û hevkar in. Di warê materyalên wek cil û berg, ronahî, dekor, deng û hwd de alîkariyê dikin.

## şano

Şanoyên cidî û yên henekî hene. Şanoya trajedî merivan xemgîn dike û ya komedî jî dikenîne. Opera jî dikeve nav rengên şanoyê. Şanogerên wê di şûna axaftinê de distirên. Di şanoya nûjen de şanoger û temaşevan bi hev re dikevin nav lîstika piyesê.
Dibe ku tu huner bi qasî şanoyê li ser merivan bandorê nehêle. Piyesek dikare meriv kêfxweş an jî xemgîn bike. Herweha dikare merivan biqehirîne jî. Gelek formên şanoyan hene. Bi piranî şano li salonan tên lîstin ku dik lê heye. Şanoger li ser dikê dilîzin û temaşevan jî li salonê rûdinin. Lê şano dikare li kolan û meydanan jî bê lîstin. Şanoyên weha beriya 500 salî li Îtalyayê peyda bûne. Ji wan re digotin: *Commedia dell'arte.*




Di *Commedia dell'arte* de hin figur hene ku ew jî hertim beşdar in. Yek ji wan pîşekarek e ku jê re dibêjin Harlekîn.




maseya kontrola ronahiyê

şanoya kasper






şanoya marionet



Hamlet trajediyeke navdar e.



opera



**şanoya kasper**
Ev şano, şanoyeke bûkikan e. Ji ber ku fîgurê sereke şerûd û pozdirêjekî bi navê Kasper e, ji vê şanoyê re jî dibêjin şanoya Kasper. Şanoger destên xwe dikin nav bûkikan û li gor axaftinê wan dilivînin. Ev şanogeriyeke gelek hêsan û xweş e.



**şefê orkestrayê**
Şefê orkestrayê ew kes e ku rêvebiriya orkestrayekê an jî koroyekê dike. Ew nîşan dide ku ew ê çawa li muzîkê bixin an jî bistirên. Gelek caran di destê şef de şivikek heye. Deftereke şefê orkestrayê heye û li ber wî ye. Ew dikare di rêzên notayan de bibîne ku aletên muzîkê wê çawa lêkevin. Ev deftera notayê ye û jê re dibêjin partîtur.



**şekir**
Meriv dikare şekir ji gelek cure hêşînahiyan bi dest bixe. Lê piraniya şekirê îro ji silqan çêdibe. Silq li welatên germ û nemaze li Kubayê zêde tên çandin. Li welatê me jî çandiniya silqan gelek e û gelek fabrîkeyên şekir hene.



**şempaze**
Şempaze cureyek meymûnan e ku li Afrîkaya Navîn dijî. Pel û giya dixwin. Bi hejmareke kêm kom bi kom dijîn. Holikên xwe li ser daran çêdikin lê wekîdin hertim li erdê ne. Ew gelekî mereqdar in û zû fêrî tiştan dibin.



**şerîf**
Şerîf li Amerîkayê cureyekî polîsan e. Ew li navçeyekê an jî li bajarekî berpirsiyarê asayişê ye. Ji aliyê şêniyên navçe ve tê hilbijartin û ji 2-4 salan li ciyekî kar dike. Berê di filmên kowboyan de şerîf weha bûn. Lê îro hemû cil û bergên weha li xwe nakin. Nivîsandina navê şerîf bi zimanê orîjînal 'sheriff' e.



## şewqe

Li gor welat û serdeman şewqeyên cuda cuda hebûne û hîn jî hene. Şewqeyên jin û mêran ji hev cuda ne. Şewqe ji kum, ji koloz û ji kofiyan hişktir û berztir in. Kum û şewqeyên zarokan jî hene lê weke van şewqeyan e.




## şeytanok

Şeytanok grûbek ji lawirên şilekî ne. Piranî bi qalik in. Qalikên wan hişk e û xwe vedikişînin qalikê xwe. Ev qalik wan diparêze. Şeytanokên bêyî qalik jî hene ku bi piranî li daristanan dijîn. Bi serê wan ve du qiloç hene ku bi wan tiştan bîhn û nas dikin. Hin şeytanok di nav avê de û hin jî li bejayiyê dijîn. Şeytanok bi alîkariya masûlkên zikê xwe diçin ku ji wan masûlkan re dibêjin ling.




## şêr

Şêr ajelekî mezin û hov e. Ew nêzîkî du metreyan dirêj e. Şêra mê neçîrê dike. Em bi kurdî ji şêra mê re dibêjin şepal. Nêçîra wê bêtir zebra û xezal in. Îro şêr tenê li Afrîka û Asyayê hene.



**şikeft**
Li çîyan, di binê erdê de û di zinaran de qulên mezin hene ku em jê re dibêjin şikeft. Hinek ji wan çend deriyên wan hene. Şikeft bi gelek awayan dikarin pêk bên. Hin ji wan li peravan in. Pêlên avê zinar hirifandine û welê çêbûne. Ev şikeftên normal in. Av bi hêsanî di nav re dinizile, diçe xwarê û kilsa di nav de dihelîne. Ji van dilopan, kevirên kilsê çêdibin ku weke zembelîlkan in. Ev kevirên kilsê dikarin bi metreyan dirêj bibin.




**şivan**
Şivan xort an jî zilamek e ku pez diçêrîne. Ji bo keriyê pez li hev ragire, pêz ji diz û guran biparêze, gelek caran şivan kûçikan jî bi xwe re digerînin. Li gelek welatan şivan û şivantî hê jî heye.



**şîr**

Hemû zarokên ku nû ji diya xwe dibin hewcedariya wan bi adanê heye ku ew jî di şîrê dayika wan de ye. Lê zarok û kesên mezin jî şîr vedixwin. Şîr ji mange, mîh û bizinê tê dotin. Meriv ji şîr: firo, mast, nivîşk, penîr, toraq, jajî, dew û çortan çêdike.




**şofêr**

Şofêr ew kes e ku otomobîlan dajo. Jin jî û mêr jî dikare karê şofêriyê bike. Şofêr divê bikaribe otomobîlan baş bajo. Karê wan gelek caran dijwar e. Hin aletên ku di otomobîlan de tunene, di kamyonan de hene û ev jî gelekî alîkariya şoferan dikin.



**şopger**


Şopger tê maneya kesê ku li şopê digere. Keç û lawên ciwan di demên xwe yên vala de li çol û çiya û daristanan dimînin, ji wan re jî dibêjin şopger. Kinc û komeleyên wan ên taybetî hene. Ciwan di kampên şopgeran de hînî berpirsiyarî, haydarî û hevaltiyê dibin. Ewropî ji şopgran re dibêjin, ’scout’.



**şûl**

Şûl cûreyeke xezalan e. Ew li ciyên bi dar û devî dijîn. Bi tenê qiloçên nêriyên wan hene. Şûl li seranserê Ewropa û rojavayê Asyayê peyde dibin.

Di meha gulan an jî hezîranê de dizên. Karikekê an jî du karikan tînin. Wek ajelên din ne bi kerî lê bi tena serê xwe digerin.



**tac**

Tac xemla serî ye. Ji zêr, zîv û cewheran tê çêkirin. Şah, şahbanû û kesên esilzade tacê didin serê xwe. Ew nîşana malmeziniya wan e.

Çend sedsal berê dema mehra keçikan li dêrê dihat birîn, taca bûktiyê didan serê wan.



**taks**

Taks cureyek kûçikê almanî ye. Wek bonciyan e û dişibin tajiyan. Lingê wan kurt û navdirêj in. Taks ji bo hevaltî û nêçîrê tên xwedîkirin. Li gor pirça xwe taks sê cure ne: pirçkurt, pirçdirêj û pirçbijî. Taks bi rikotî û bi serbestiya xwe bi nav û deng in.



**taxûk**
Taxûk wek qeyikeke biçûk a ser berf û qeşayê ye. Meriv li ser berfê lê siwar dibe an jî bar lê dike û dişemitîne. Meriv dikare hinekên ji wan li pey xwe bikişîne. Li Kurdistanê li herêmên çiya dema berf pir dibare, barên êzing, çilo û tiştên din li taxûkan dikin û dikişînin. Carina nexweşan jî pê dibin bajêr ser doktor.




**teker**
Dibe ku teker, giringtirîn îcada merivan be. Ger teker tuneba, bisiklêt, otomobîl û gelek wesîteyên din ê jî tuneba. Îcada tekeran dikare weha çêbûbe: ji bo ku tiştekî giran, wek mînak kevirekî ji ciyekî bibin ciyekî din, kut danîne binî û lex kirine. Dûre ew kut bûye ramanek ku teker çêbin. Hemû tekrên îro xwediyê çîrokek welê ne. Cara pêşîn teker li Mezopotamyayê hatiye çêkirin.






tekera bisiklêtê



tekera trênê



çerx

## telefon

Dema tu di telefonê de dipeyivî, dengê te bi sînyalên elektrîkî tê guhertin û di kanalan de diçe telefona kesê ku guhdariya telefona te dike. Li wir sînyal dîsa vediguherin û dibin deng.
Çaxa meriv li hejmarên telefonekê dixe, otomatîk bi santralekê ve tê girêdan û piştre rasterast diçe telefona ku em lê digerin.




Ji bo telefonên mobîl têl ne pêwîst e. Deng bi sînyalên radyoyî bi nependî diçe stasyona navendî û ew jî ji wir sînyalan dişîne stasyona telefonê. Telefaks jî wek ku di wêne de xuyaye nivîs û wêneyan werdigerîne "sînyalên telefonî".

## teleskop

Teleskop aletek e ku meriv dikare pê li sitêrkan binere. Astronom teleskopên mezin bi kar tînin. Meriv dikare bi dûrbîneke normal jî li sitêrkên asîman binere.



## terazû

Meriv bi terazûyê dikare giraniya gelek tiştên cuda bipîve. Du sêniyên terazûyeke duçavî hene. Tiştên ku meriv bixwaze biwezinîne, datîne ser wan heta ku herdu alî wek hev bibin. Qapan terazûyeke herî kevin e û meriv bi destê xwe digire. Meriv loqa wê bi pêş û paş ve dibe heta ku li giraniya pîvanê rast bisekine. Giraniyên biçûk meriv dikare bi destan jî biwezinîne. Li hin deverên Kurdistanê ji terazûyê re dibêjin şihîn.




## termê maxîr

Li ruyê asîman heft sitêrk hene û ew bi hev re wek wêneyê erebeyekê ne. Bi kurdî ji wan heft sitêrkan re Termê Maxîr dibêjin. Heger asîman sayî be seranserê salê Termê Maxîr xuyaye.




## termos

Di hundurê termosê de şûşeyeke du qatî heye. Di nav van qatan de valahiyeke bêyî hewa heye. Gelek zehmet e ku germahî di nav wan qatan re derbas bibe. Ji ber vê yekê vexwarina germ, germ dimîne û ya sar jî sar dimîne.



## tewl

Tewl cî û malên hespan e. Hesp li wir dimînin. Ciyê her hespekî cuda ye. Êmên xwe di afiran de dixwin. Afir dikarin ji text an jî curn bin. Li erda tewlê dikare ka an jî pûş hebe. Divê tewl paqij bin û serkulên wan bên avêtin.




Seyis bi firçeyê hespan tîmar dike, xwêdan û gemara wan ji wan paqij dike. Nalbend simên wan dixeritîne û piştre nal dike.

---

## tevnepîrik

Tevnepîrik hov û kovî ye. Ew bêtir mêş û kêzikan dixwe. Nêçîra xwe bi jahra xwe pûç dike an jî dikuje. Hin ji wan jî tevnê datînin ku kêzik bikevinê. Tevenepîrika di wêne de dest pê kiriye tevnê çêdike. Heşt ling û du çengalên wê hene. Bi van çengalan tevnepîrik bi tiştan dihese.




Tt

**teyrê tawis**
Teyrê tawis ji ber reng, per û dûva xwe ya xweşik di nav çûkên kedî de bi nav û deng e. Ew dikare dûva xwe gij bike û wek sîwanê veke. Nexş û xalên dûva teyrê tawis mîna çavan diçirisin. Di dînê êzîdî de teyrê tawis pîroz e.



**tilîşop**
Dema ku tu tiliyên xwe bidî ser cameke nûşûştî, tu ê baştir şopa tiliyên xwe bibînî.
Heger tu baş bala xwe bidiyê, xêzên her tiliyekê ji yên din cudatir in. Şopa tiliyên her merivekî jî ne mîna hev e. Polîs bi rêyeke teknîkî dikare xwediyê şopa tiliyan nas bike



**tirî**
Ji dara tirî re mêw û ji hemû baxçeyê mêwan re jî dibêjin rez. Mêw û rez li welatên germ tên danîn. Gelek cureyên tirî hene. Wek: merzome, kerkûş û temûzî... Bi rengê xwe jî tiriyê reş, sor û zer hene. Ji bilî xwarina tirî meriv dikare ji şîreya tirî doşav, benî, kesme û bastêx çêbike. Ji tirî mey jî tê çêkirin. Li ber tavê tirî hişk dikin û ew jî dibe mewij. Li gelek deverên Kurdistanê tirî çêdibe




**tirîfiringî**

Darên tirîfiringiyê li gelek baxçeyan tê çandin û carina yên bejî jî li devê rêyan hene. Tirîfiringiyên kesk, zer û sor hene û bi gelemperî bi pûrtik in. Deviyên tirîfiringiyan bi qasî metre û nîvekê dirêj dibin. Guliyên wan bi sitirî û dirêj in. Tirîfiringî bi tezetî tên xwarin û meriv dikare jê krem û rîçalan jî çêbike.



**tîmseh**

Çermê tîmsehan gelek hişk û zexm e. Diranên wan gelek in û tûj in. Tîmseh ajelên kaşok in û li gelek germeciyên dunyayê hene. Ew di çem û golan de dijîn û ajelên hov û dirinde ne.



**tîmar**

Paqijî ne tenê ji bo merivan e. Herweha ajelên nav malê jî wek hesp û çêlek, divê paqij bin ku çermê wan hewayê bigire. Ji vê paqijkirina ajelan re dibêjin tîmar. Ji bo tîmarkirinê meriv aletên wek firçe û qeşawînê bi kar tîne.



**tîp**

Tîpek dikare bi gelek cureyan xuya bike. Yên mezin û yên biçûk hene. Awayên nivîsandin û çapkirina wan jî gelek in, yanî gelek stîlên wan hene. Di alfabeya kurdiya latînî de 31 tîp hene. 8 tîp ji wan dengdar û 23 tîp jî bêdeng in.





**tîrkevan**

Tîrkevan çekekî pir kevin e. Tîrkevan di şer û nêçîrê de hatiye bikaranîn. Piştre çekên barûtê îcad bûn.
Tîrkevan nuha di sporê de bi kar tê û wek lîstokekê jî zarok pê dilîzin.




**tîtav**

Tîtav cureçûkek e ku li Asyayê heye. Berî nuha bi sed salî ji bo nêçîrê ew anîne Ewropayê û xwedî kirine. Tîtav bêtir xwe li zeviyên nêzîkî daristanan û golên bi zil digrin. Meriv dîkên wan zû nas dike. Ew rengîn û gelekî sipehî ne.



## to

Dema meriv şîr bidoşe û dest nedê tebaqeyeke to bi ser dikeve. Ango rûnê şîr hildikişe jor. To bi serê xwe tê firotin û gelek kes to dikin nav qahwê û vedixwin. Meriv di çêkirina penîr de jî to bi kar tîne. Li hinek herêmên welatê me ji to re dibêjin qeymax.




## tombala

Lezgîn ji dolaba tombalayê hejmarekê digire. Ew girtî ne û hejmarên wan xuya nakin. Çendek ji wan bi xelat in û yên din hemû vala ne.
Hinek tombalayên din jî hene, piştî ku hemû hejmar hatin firotin wê demê hejmarên xelatgiran tên kişandin.



## tor

Meriv dikare bi torê masiyan bigire. Ji bo nêçîrê jî tor bi kar tê. Meriv tora masiyan davêje nav avê. Seriyek li ser ruyê avê dimîne, seriyê din jî dadikeve binê avê. Torikên tûrikî jî hene ku darikek bi serê wan ve ye, meriv bi wan jî masî û minminîkan digire.



**torik**
Torik toreke tûrikî ye. Bi serê darekî ve ye.
Bêtir ji bo girtina masiyan e, lê meriv dikare pê minminîk, mêş û mozan jî bigire.



**tov**
Di vê kulîlka tehliyê de tov hene. Keçik pifî wê dike. Sîwanekên wê difirin, her sîwanekek tovek e. Herweha her dar û hêşînahiyek tovek xwe heye.
Di simbilên zadan de her hebekî genim tovek e. Dendikê gêlasekê jî tov e. Dema tov dikeve bin axê, zîl dide û hêşîn dibe. Tov dikare bi gelek awayî belav bibe. Hinek jê diweşin û dikevin axê. Hinek ji wan li ber bayî belav dibin. Carina çûk û ajelên din jî beşek ji wan tovan dixwin, dûre bi rêx û zîrça wan re derdikeve û li dereke din hêşîn dibe.



## traktor

Traktor romorkê li pey xwe dikişîne û cot dike. Meriv dikare gîsin û kulvatorê bavêje paş û bêra berfê û kepçê jî bavêje pêş wê û bi kar bîne. Traktor bi hêz e lê giran diçe. Ew di saetekê de dikare tenê 30 kîlometreyî zû biçe.



## trampêt

Trampêt amûreke lêdanê ye. Tara wê heye. Li ruyekî an jî li herdu ruyên tarê çermek hatiye vekişandin. Gelek cureyên trampêtan hene.
Meriv bi du şivikên darîn an jî bi şivikên pola lêdide.





## trompêt

Trompêt amûreke pifbar e û ji madenê misê tê çêkirin. Tona deng li gor miştika dev dertê. Bi alîkariya sê bişkokan û lerza lêvan tonên cuda derdikevin.



**tunel, tûtî** li rûpela 210an binere




**Li studyoya televîzyonê**
Li vir meriv bernameyeke zarokan çêdike. Kamerayên televîzyonê wêneyan dikişînin û ji mîkrofonê jî deng digirin. Li odeya kontrolê wêne û deng dibin yek. Teyba televîzyonê sînyalan digire û qeyd dike an jî sînyal rasterast diçin pêlweşa televîzyonê û diweşe.


## tv

TV kurtkirina gotina televîzyonê ye ku tê maneya "dûrdîtin"ê. Bûyerek li ciyekî dûr an nêzîk bibe, meriv dikare di heman demê de di televîzyonê de bibîne. Kameraya televîzyonê wêneyan digire, vediguhere sînyalên elektrîkî û ew diçin weşangeheke televîzyonê. Li wir sînyal nependî dibin û bi riya pêlên radyoyê bi antenekê tên weşandin.
Aletên televîzyonê yên li malan pêlên radyoyê digirin û dîsa wan vediguherînin û dikin wêne.




Meriv dikare bi vîdeoyê bernameya televîzyonê bigire ser kasetekê. Dûre meriv kengî bixwaze dikare lê temaşe bike.


**Ji pêlweşê heta wergira televîzyonê**
Sînyal ji pêlweşa televîzyonê tên şandin. Ev antêneke gelek bilind e. Anten pêlên radyoyê werdigire û dişîne pêlgira televîzyonê.




**Wêneyên televîzyonê ji satelîteke li asîman tên**
Pêlên nependî yên radyoyê bi xwe re bernameya televîzyonê ji dibe. Lê ev pêl bi tenê dikarin sererast biçin. Dunya gilover e, loma jî meriv nikare wêneyên televîzyonê ji televîzyoneke dûr bigire. Meriv dikare pêlên radyoyê ji pêlweşekê bişîne satelîteke li asiman. Satelît wan pêlan bi şûn de dişîne dunyayê. Dema pêlên radyoyê digêhin ruyê erdê ew gelek sistopisto û belawela ne. Loma jî meriv anteneke mîna sêleke mezin bi kar tîne ku jê re dibêjin parabol. Ev parabol pêlên radyoyî komî ser hev dikin. Ev pêl bi rêya kanalan diçin televîzyonê.

A a
B b
C c
Ç ç
D d
E e
Ê ê
F f
G g
H h
I i
Î î
J j
K k
L l
M m
N n
O o
P p
Q q
R r
S s
Ş ş
T t
U u
Û û
V v
W w
X x
Y y
Z z

**tunel**
Ji riya binê erdê re dibêjin tunel. Bi taybetî ji bo rêya trênê gelek tunelan dikolin. Pirî caran van tunelan di çiyan de vedikin. Di şûna ku trên li dora çiyayekî bigere û rê dirêj bike, meriv çiya qul dike û şiva trênê lê datîne. Bi vî awayî rê kintir û erzantir dibe.



**tûtî**
Perikên tûtiyê bi reng in, nikulê wê kin û bi hêz e. Piraniya wan li welatên tropîkal di nav daristanên barangîr de dijîn. Gelek cureyên wan hene û yên qefesan populer in. Tûtî dikare bi zarê merivan bike û bipeyive. Herweha çûka evînê jî cureyeke ji tûtiyan e.



**unîforma**
Hemû cilên polîsan wek hev in. Meriv ji cilên wan re unîforma dibêje. Unîformayên eskeran jî hene, wek cilên pîlot û hostesan. Bi rêya unîformayê kar û komên merivan tên nasîn.



## vaftîz

Vaftîz navlêkirineke xiristiyanan e. Piraniya xiristiyanan di zaroktiyê de vaftîz dibin. Bi rêya vaftîzê herweha ew dibin endamên kilîseyê jî.
Li dêrê keşe zarok dike hembêza xwe û bi hinek ava ku di leganekê de ye, bi destan pê serê zarok şil dike. Li hin dêran bi mezinî jî meriv vaftîz dibe û ji bo wê jî carina meriv dikeve nav hewizekê.



## vampîr

Di zemanê berê de li başûrê rojhilatê Ewropayê tirsa vampîran li ser merivan hebû. Vampîr cureyekî pîrebokan e. Welê dihat bawer kirin ku ew bi şev ji gora xwe derdikevin û xwîna merivan dimijin.
Mîr Drakula vampîrekî bi nav û deng e. Di romaneke tirsê de nav û serpêhatiyên wî tên gotin.



## veterîner

Ji doktorê ajelan re dibêjin veterîner. Piraniya veterîneran li gundan dixebitin û li nexweşiya dewar û hespan mêze dikin. Ji wan hinek jî li nexweşxaneyên ajelan kar dikin. Beşek ji veterîneran jî li selexaneyan kontrola goşt dikin. Li hinek deverên welatê me ji veterîner re dibêjin beytar.



**veşartok**

Veşartok lîstikek e ku hemû zarok pê dizanin û dikarin bilîzin. Yek disekine, çavên xwe digire û dijmêre û yên din jî dest pê dikin û xwe li gelek ciyan vedişêrin.
Ev jî ji wan lîstikên kevin yek e û gelek zarok jê hez dikin.



**vîkîng**

Hezar sal berî nuha swêdî, danmarkî û kesên welatê bakur bi keştiyên xwe bazirganî û talankarî dikirin. Xelkê ji wan re digot Vîkîng. Vîkîngan baweriya xwe bi Oden û Tor dihanî ku ew Xwedayên wan bûn. Vîkîng şerker bûn û hertim bivirekî weke maskot bi xwe re digerandin.



**vînç**

Meriv bi vînçan tiştên giran radike û datîne. Di avakirina xaniyan û barkirina keştiyan de vînç bi kar tên. Vînç bi çengalê xwe bar radike û li ciyê pêwîst datîne.



**vîrus**

Wek bakteriyan vîrus jî dibe sedem ku meriv nexweşiyê ji hev bigire. Zarok bapêş û gelek nexweşiyên din ji hev digrin. Vîrus ji bakteriyê gelek biçûktir e. Li ser vê wêneya biçûk xuya dike ku vîrus çawa êrişî bakteriyekê dikin. Vîrus ne tenê dikevin laşê meriv, herweha dikevin yên ajelan jî.




**volkan**

Volkan di nava qeliş û qulên binê erdê de ne. Carina di van qeliş û qulan re ax û madenên helandî tev gaz, lav û keviran dipijiqin der û piştre dibin çamûreke agirî û wek avê diherikin. Di dema rabûna volkanê de lav û xwelî dikarin bajarekî nêzîkî xwe wêran bikin. Piraniya volkanan wek ku di wêne de jî xuya ye weha pêk tên: di serê çiyê de qulek vedibe, dora wê wek kortekê fireh e, ji wê kortê re ji krater dibêjin. Volkan ne tenê li çiya, dikarin di binê deryayê de jî biteqe.



**waha**
Çola ku xîz û qûma wê wek deryayeke mezin be, li hin ciyên wê av û hêşînahî hebe û meriv bikaribe lê bijî, ji ciyên weha re dibêjin waha.
Li van ciyan av nêzîkî ruyê erdê ye.



**xardoz**
Xardoz aletek e ku meriv pê ruyê tiştan şayik û rast dike. Dirank û xêzên wan tûj in. Gelek şiklên xardozan hene: xardoza metalan, xardoza daran, xardoza neynûkan û hwd.
Ji xardoza sitûr re dibêjin mivred.



**xewn**
Xewn tiştekî welê ye wekî ku meriv li fîlm binere. Di xewnê de herçendî meriv razabe jî çav dilîzin. Meriv welê his dike ku hemû tiştên di xewnê de rast in. Vê yekê meriv bêtir di kabûsan de ferq dike.



**xiyar**

Heger meriv lemê xiyaran girênede ew li ser erdê dirêj û fireh dibin. Xiyar li van leman dikevin û dirêj dibin.
Gelek cureyên xiyaran hene. Xiyar û ecûrên bi pirçik babetên herî naskirî ne.



**xoz**

Piraniya darên pelderzî xozan digirin. Di xozekê de gelek gulên biçûk hene û di nav hev de hatine hûnandin.
Dema gul dikemilin ew di nav hev de tên hûnandin. Piştre ew hişk dibin û formê xozê digirin.




**xwê**

Em her roj xwê davêjin nav xwarinê. Meriv xwê ji ava deryayê û latên çiyê bi dest dixe. Ji laşê me re xwê pêwîst e. Lê carina em xwê zêde dixwin ku ew jî ne baş e. Xwê baharatek e. Ji bo ku xwarin zû xera nebe goşt û masî û hwd tên xwêkirin.
Dema ava deryayê dadiwerive tenê xwê dimîne. Li hin çiyan jî kanên xwê hene.




## xwişk û bira

Zarokên ku dê û bavên wan yek in, xwişk û birayên hev in. Ne hertim lê bi piranî xwişk û bira dişibin hev. Ew zarokên ku ji dêyekê ne lê bavên wan cuda ne, an jî bavê wan yek e û dêyên wan cuda ne, ji wan re zirxwişk an jî zirbira dibêjin.



## xwîn

Di seranserê laşê merivan de xwîn heye. Dema tiştekî tûj derekî te bibire, xwîn jê tê. Bi sitandina hewayê re em oksîjenê digirin û bi xwarinê re jî em adanê distînin. Îcar xwîn wan li her deverên laşê me digerîne. Herweha xwîn gelaşên jahrî kom dike û dibe gurçikan. Dil xwînê pompe dike û wê li laşê însan digerîne. Bi rêya pişikan xwîn oksîjenê digire û paqij dibe. Piştre xwîn diherike û diçe, di laş de digere û dîsa vedigere tê pişikan.



## zad

Zad hin cinsên giyê ne ku libên wan têne xwarin.
Ji van zadên herî giranbuha hinek ev in: genim, ceh, cehdasî, lazût, garis û birinc.
Ev zadên ha hemû li Kurdistanê têne çandin.
Li hin welatên wek Skandînaviyayê bihar û payîzan çandinî dibe.
Li Kurdistanê payîzê zad tên çandin û havînê jî tên çinîn. Berê paleyan zad diçinîn lê îro makîne vî karî dikin. Hin zad dibin nan û xwarin û hin jî dibin qût û êmên ajelan. Li hinek deverên welatê me ji zad re tene jî dibêjin.

Li vir me lazût biçûk kiriye ku di wêne de bi cî bibe. Di rastiyê de serê lazût ji ceh û genim mezintir e.




## zarokxane

Dema ku dê û bav diçin kar, ew zarokan datînin zarokxaneyê. Li zarokxaneyê zarok hem dilîzin û hem jî fêrî hin tiştan dibin. Gelek dê û bav dixwazin zarokên xwe bişînin zarokxaneyê lê hertim ew îmkan nîne. Li hinek herêmên Kurdistanê ji zarokxaneyê re kreş jî dibêjin.



**zebra**

Zebra xizmê hespan e. Li deşt û naverastên Afrîkayê dijîn. Bi sedan û bir bi bir digerin.
Çermê wan xetxetî, bi şiviyên reş û sipî ne. Loma jî li nav darên fîrk û naverastan, ajelên hov wan bi hêsanî nabînin.




**zêr**

Zêr metalek e ku kêm peyde dibe û giranbuha ye. Zêr diçirise û giran e. Ew di çêkirina diranan de bi kar tê. Meriv zêr ji bo tiştên xeml û xêzê jî bi kar tînin.
Di zemanê berê de ji zêr pere û pûlik çêdikirin.




**zibil**

Ji bo ku berê zeviyan zêde be, pêwîstî bi zibil heye. Ji bo zad û şînahî baştir bibe, zibil davêjin zeviyan. Zibil adan û hêzê dide axê. Gelek cure zibil hene. Hin jê yên ajelan in û hin jî îro li fabrîkeyan çêdikin.



## ziman

Ziman ji masûlkan pêk hatiye û bê hestî ye. Ziman di cûtin û daqurtandinê de alîkariya meriv dike.
Di ziman de pîvazokên çêjê hene. Ew bi me didin diyarkirin ku çêja xwarinê çawa ye. Ziman ji bo axaftinê jî alîkariya me dike.




## zirfistiq

Zirfistiq ji malbata bezelyeyê ye. Bi piranî li Afrîka, Hîndistan, Çîn û bakurê Amerîkayê tê çandin. Di nav berê wê de du dendik hene.
Di binê axê de digêhîje.
Meriv ji dendikên wê rûn derdixe û dikare bi soravkê biqemirîne û bixwe.



**zirne û bilûr,** li rûpela 220an binere

## zirx

Zirx cureyek kincên şer e. Ji metal an jî ji çerm dihat çêkirin. Ji bo ku şervan xwe ji ber derbên tîr, rim, şûr, bivir û gurzan biparêze li xwe dikir. Kumê ku didan serê xwe jî jê re digotin kumzirx.



## zirne û bilûr


Zirne amûreke pifbar e, ji darê tû, gûz û ji qaşilên dara gêlasê çêdibe. Forma wê weke mastêrkeke dirêj e. Lê miştikek wê jî heye ku zirnevan di wê miştikê re pifî zirnê dike. Weke bilûrê 7 û 9 qulên zirneyê jî hene. Li welatên rojhilat bêtir di dawet û şahiyan de lêdidin. Zirneyê bi tenê lêdixin lê pirî caran bi def û daholan re jî lêdixin ku govend baş bigere.




Bilûr jî amûreke pifbar e, ji darê tû an jî gûzê çêdibe. Lê îro bilûrên metalîk jî hene. Bi qasî 40-60 cm dirêj e. Bilûra normal 7 qul li pêş, du qul li kêlekan û qulek jî li pişt heye. Bilûr amûreke şivanan e, lê di gelek odeyên mîrên kurdan de jî lêdidan. Kesê ku pifî bilûrê dike, em ji wan re dibêjin bilûrvan. Bilûrê bi tenê lêdixin lê carina bi erbanê re jî lêdixin. Bilûr yek ji wan amûran e ku melodiya dengê kurdî bêtir dihewîne.

## zîperdasî

Zîperdasî bi şiftên reş ên li pişta xwe masiyekî xweşik e. Zîperdasî dikare bi qasî nîv metreyî dirêj bibe.
Kom bi kom, lê ji hev dûr û bi hev re digerin.
Goştê wan xweş û çêjdar e.




**zîpik**
Li jorê di nav ewran de carina dilopên baranê diqerisin, dibin qeşayên mîna nokan û dibarin. Ji wan re dibêjin zîpik. Zîpik bêtir bihar û havînan dibare. Ji zîpîka libgir re dibêjin teyrok. Teyrok, di dema tavên xurt û birûskî de tên xwarê. Teyrok zerareke mezin didin sebze û mêweyên nûbişkivî.
Zîpika ku libên wê hûr in, jê re dibêjin gijlok an jî xilorîk.



**zoo**
Zoo baxçeyê heywanên kovî ye ku meriv diçe wir û li wan temaşe dike. Wekî ku li gelek welatan heye, li Swêdê jî gelek zoo hene. Wek nimûne, Skansena Stockholmê û Kolmorden.



**zurafe**
Qirik û çîpên zurafeyê gelek dirêj in. Li dunyayê ajela herî bilind e. Ew dikare heta şeş metreyan dirêj bibe. Zurafe tenê li Afrîkayê hene. Xwarina wan hêşînayî û pelên daran e.



# FERHENGOK

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| Abc | ABC-bok | ABC-book | Abcbuch n | ABC-kitabı |
| agir | feber | temperatureII | Fieber n | ateş |
| agirkujî | brandkår | fire-brigade | Feuerwehr f | itfaiye |
| ajel | djur | animal | Tier n | hayvan |
| ajelên kedî | husdjur | domesticanimal | Haustier n | evcilhayvanlar |
| akordiyon | dragspel | accordion | Ziehharmonika f | akordiyon |
| akvaryûm | akvarium | aquarium | Aquarium n | akvaryum |
| al | flagga | flag | Flagge f | bayrak |
| alerjî | allergi | allergi | Allergief | alerji |
| alfabe | alfabet | alfabet | Alphabetn | alfabe |
| amanên ji axê(pîrotkarî) | dreja | turn (pots) | drehen (Töpfe,Topf m) | çanak çömlek |
| ampûl | glödlampa | (electric) bulb | Glühbirne f | ampul |
| amûret | verktyg | tool | Werkzeug n | araç, alet |
| anfikator | förstärkare | amplifier | Verstärker m | amplifikatör, güçlendirici |
| anons | annons | advertisement | Inserat n | ilan, anons |
| asansor | hiss | lift (elevator) | Aufzug m | asansör |
| asîd | syra | acid | Säure f | asit |
| astronot | astronaut | astronaut | Astronaut m | astronot |
| aş | kvarn | mill | Mühle f | değirmen |
| aşît | lavin | avalanche | Lawine f | çığ |
| aşpêj | kock | chef | Koch m | aşçı |
| atolye | ateljé | studio | Atelier n | atölye |
| av | vatten | water | Wasser n | su |
| ax | jord | soil | Erde f | toprak |
| axtapot | bläckfisk | octopus | Tintenfisch m | ahtapot |
| axur | ladugård | cow-house | Kuhstall m | ahır |
| babîyan | babian | baboon | Pavianm | babiyan |
| bajar | stad | town | Stadtf | şehir |
| bakterî | bakterier | bakteries | Bakterie n(Bakterie f) | bakteri |
| balafir | flygplan | aeroplane | Flugzeug n | uçak |
| bale | balett | ballet | Ballett n | bale |
| balon | ballong | balloon | Ballon m | balon |
| bank | bank | bank | Bank f | banka |
| barkêş | gaffeltruck | fork-lifttruck | Gabelstapler m | çatalvinç |
| bask | vinge | wing | Flügel m | kanat |
| baterî | batteri | battery | Batterie f | bateri,pil |
| beq | groda | frog | Frosch m | kurbağa |
| beqbejî | padda | toad | Kröte f | karakurbağa |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| beqerî | abborre | perch | Barsch m | tatlısu levreği |
| beraz | gris | pig | Schwein n | domuz |
| berazêkovî | vildsvin | wildboar | Wildschwein n | yabani domuz |
| berf | snö | snow | Schnee m | kar |
| biharat | krydda | spice | Gewürz n | baharat |
| bilbil | näktergal | nightingale | Nachtigall f | bülbül |
| bilûr | herdeflöjt | shepherd'sflute | Hirtenflöte f | kaval |
| bircûkeleh | borg | castle | Burg f | burç |
| birek | såg | saw | Säge f | testere |
| birinc | ris | rice | Reis m | pirinç |
| birûsk | åska | thunder | Gewitter n | şimşek |
| bisiklêt | cykel | bike | Fahrrad n | bisiklet |
| bizin | get | goat | Ziege f | keçi |
| bîr | brunn | well | Brunnen m | kuyu |
| burxî | borr | drill | Bohrer m | burgu, matkap |
| bûkik | docka | doll | Puppe f | bebek |
| cadûkar | häxa | witch | Hexef | cadı |
| canbaz | akrobat | acrobat | Akrobat m | canbaz, akrobat |
| canbazêsertêlê | lindansare | tightropewalker | Seiltänzer m | telcanbazı |
| canî | föl | foal | Fohlen n | tay |
| ceps | gips | plaster(ofParis) | Gips m | alçı |
| cilûberg | kläder | clothes | Kleider | giysi,elbise |
| cilûbergêngelêrî | folkdräkt | nationalcostume | Volkstracht f | milligiysi, folklor elbisesi |
| cin | troll | troll | Troll m | masal cini |
| cirdon | råtta | rat | Ratte f | fare |
| çakûç | hammare | hammer | Hammer m | çekiç |
| çam | gran | fir | Fichte,Tanne f | çam |
| çamazer | tall | pine | Kiefer f | sarıçam |
| çav | öga | eye | Auge n | göz |
| çay | te | tea | Tee m | çay |
| çeleng | krans | wreath | Kranz m | çelenk |
| çiraxe | fackla | torch | Fackel m | meşale |
| çiya | berg | mountain | Berg m | dağ |
| çîlek | jordgubbe | strawberry | Erdbeere f | çilek |
| çîlekênbejî | smultron | wildstrawberry | Walderdbeere f | yaban çileği |
| çûk | fågel | bird | Vogel m | kuş |
| çûkênbiçûk | småfåglar | smallbirds | Kleinvögel(Vogel m) | küçük kuşlar |
| çûkênqefesan | burfåglar | cagebirds | Stubenvögel | kafes kuşları |
| dansûgovend | dans | dance | Tanz m | dans, halay |
| dar | träd | tree | Baum m | ağaç |
| darazeytûnê | olivträd | olive-tree | Ölbaum m | zeytin ağacı |
| darkutok | hackspett | woodpecker | Specht m | ağaçkakan |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
| --- | --- | --- | --- | --- |
| darmazî | ek | oak | Eiche f | meşe |
| darpêk | styltor | stilts | Stelze n | koltuk değenekleri |
| debançe | pistol | pistol | Pistole f | tabanca |
| dedektîf | detektiv | detective | Detektiv m | dedektif |
| delfin-yûnis | delfin | dolphin | Delphin m | yunusbalığı |
| demokrasî | demokrati | democracy | Demokratie f | demokrasi |
| deqandin | tatuering | tattooing | Tätowierung f | döğme |
| deqîqe | minut | minute | Minute f | dakika |
| dergûş | vagga | cradle | Wiege f | beşik |
| dermanxane | apotek | pharmacy | Apotheke f | eczane |
| derzî | nål | needle,pin | Nadel f | iğne |
| dest | hand | hand | Hand f | el |
| dêr | kyrka | church | Kirche f | kilise |
| dêw | jätte | giant | Riese m | dev |
| dibistan | skola | school | Schule f | okul |
| dil | hjärta | heart | Herz n | kalp, yürek |
| dingil | axel | shoulder | Schulter f | dingil, mil |
| diran/didan | tand | tooth | Zahn m | diş |
| dirîreşk | hallon | raspberry | Himbeere f | ahududu |
| dînosaur | skräcködla | dinosaur | Dinosaurier m | dinazor |
| doktor | doktor | doctorI | Doktor m | doktor, tabip |
| doktor/bijîjk | läkare | doctorII | Arzt m | doktor |
| domptor | domptör | tamer | Dompteur m | domptör |
| dorînckar | sotare | chimney-sweep | Schornsteinfeger m | baca temizlayicisi |
| dûrbîn | kikare | binoculars | Feldstecher m | dürbün |
| dûvmeqesk | svala | swallow | Schwalbe f | kırlangıç |
| ejdiya | drakeI | dragon | Drache m | ejderha |
| elok | kalkon | turkey | Truthahn m | hindi |
| emeliyat | operation | operation | Operation f | ameliyat |
| e-name | e-post | e-mail | E-Mail f | e-posta |
| endazyar | ingenjör | engineer | Ingenieur m | mühendis |
| epîdemî | epidemi | epidemic | Epidemie f | epidemi |
| erdgilor | jordglob | globe | Globus | küre, yeryuvarlağı |
| eskîmoyî | eskimå | Eskimo | Eskimo m | Eskimo |
| ewliya | helgon | saint | Heilige m | evliya |
| ewr | moln | cloud | Wolke f | bulut |
| eylo | örn | eagle | Adler m | kartal |
| êlekêavê | flytväst | life-jacket | Schwimmweste f | yüzme yeleği |
| fabel | fabel | fable | Fabel f | fabıl |
| feqîr | fakir | fakir | Fakir m | Hint fakiri |
| firfirok | drake | kite | Drache m | uçurtma |
| firina elektrîkî | ugn | oven | Ofen m | elektrikli fırın |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| firingî | tomat | tomato | Tomate f | domates |
| fîl | elefant | elephant | Elefant m | fil |
| fîlêavê | valross | walrus | Walross n | pasifikmorsu |
| flût | flöjt | flute | Flöte f | flüt |
| fok | säl | seal | Robbe f | fokbalığı |
| fotbol | fotboll | football | Fussball m | futbol |
| gakovîyê bakur | älg | elk | Elch m | Kanada geyiği |
| galaks(riyakadizan) | galax | galaxy | Galaxis f | samanyolu |
| gamasî | val | whale | Wal m | balina |
| geometrî | geometri | geometry | Geometrie f | geometri |
| gezgezok | brännässla | nettle(common nettle) | Brennessel f | ısırganotu |
| gêlaz | körsbär | cherry | Kirsche f | kiraz |
| gêzer | morot | carrot | Möhre f | havuç |
| gindor | ide | winter-quarters | Winterlager | in |
| girêk | knut | knot | Knoten m | düğüm |
| girî | gråt | crying | Weinen n | ağlama |
| gîtar | gitarr | guitar | Gitarre f | gitar |
| gog | krocket | croquet | Krocket n | kroke |
| golf | golf | golf | Golfspiel n | golf |
| gorîl | gorilla | gorilla | Gorilla m | goril |
| guh | öra | ear | Ohr n | kulak |
| guhandar | däggdjur | mammal | Säugetier n | memeli havan |
| gul | ros | rose | Rose f | gül |
| gulmêxik | nejlika | carnation | Nelke f | karanfil |
| gumgumok | ödla | lizard | Eidechse f | kertenkele |
| gur | varg | wolf | Wolf m | kurt |
| gurçik | njure | kidney | Niere f | böbrek |
| gurêx | schäfer | Alsatian | Schäferhund m | çobanköpeği |
| halet | plog | plough | Pflug m | sapan |
| hamburger | hamburger | hamburger | Hamburger | hamburger |
| hamster | hamster | hamster | Hamster m | hamster |
| hejîr | fikon | fig | Feige f | incir |
| hejmar | siffra | number,digit | Ziffer f | sayı, rakam |
| helalûk | lingon | lingonberry | Preiselbeere f | yaban mersini |
| helîkopter | helikopter | helicopter | Hubschrauber m | helikopter |
| hemşîre | sjuksköterska | nurse | Krankenschwester f | hemşire |
| hesinger | smed | blacksmith | Schmied m | demirci |
| hesp | häst | horse | Pferd n | at |
| hespêavê | flodhäst | hippopotamus | Flusspferd n | suaygırı |
| hevris | en | juniper | Wacholder m | ardıç |
| hewa | luft | air | Luft f | hava |
| hezimkirina xwarinê | matsmältning | digestion | Verdauung f | sindirmek |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| hêlekan | gunga | swing | Schaukel f | salıncak |
| hêştir | kamel | camel | Kamel n | deve |
| hêştirmel | struts | ostrich | Strauss m | devekuşu |
| hilm | imma | mist | Dampf m | buğu, pus |
| hilû | plommon | plum | Pflaume f | erik |
| hirç | björn | bear | Bär m | ayı |
| hirçasipî | isbjörn | polarbear | Eisbär m | kutupayısı |
| hirmî | päron | pear | Birne f | armut |
| hîv | måne | moon | Mond m | ay |
| hokirin | dressyr | dressage | Dressu rf | evcilleştirme |
| holik | hydda | hut | Hütte f | kulübe |
| hoqebaz | jonglör | juggler | Jongleur m | hokkabaz |
| huner | konst | art | Kunst f | sanat, hüner |
| îbadet | bön | prayer | Gebet n | ibadet |
| îglo | igloo | igloo | Iglumel. n | iglo |
| înfeksîyon | infektion | infectionI | Infektion f | enfeksiyon |
| îndîyanî | indianer | Americanindians | Indianer m | kızılderili |
| înstrumentên pifbar | blåsinstrument | wind-instrument | Blasinstrument n | üfleme aletleri |
| îshokey | ishockey | ice-hockey | Eishockey m | buz hokeyi |
| jeans | jeans | jeans | Jean s | jean |
| jeep | jeep | jeep | Jeep m | jip |
| jenîn | puls | pulse | Puls m | nabız |
| jockey | jockey | jockey | Jockey m | jokey |
| jojo | jojo | yoyo | Jo-Jo n | yoyo |
| jûjî | igelkott | hedgehog | Igel m | kirpi |
| kakao | kakao | cocoa | Kakao m | kakao |
| kaktus | kaktus | cactus | Kaktus m | kaktüs |
| kamera | kamera | camera | Kamera f | kamera |
| kangurû | känguru | kangaroo | Känguruh n | kanguru |
| kanot | kanot | canoe | Kanu n | sandal, kanot |
| karawan | karavan | caravanII | Karawane f | karavan |
| karê destan | hantverk | craft | Handwerk n | elsanatı |
| kartol | potatis | potato | Kartoffel f | patates |
| kelûk | lax | salmon | Lachs m | sombalığı |
| keman | fiol | violin | Violine f | keman |
| kember | valv | arch | Gewölbe n | kember |
| kemend | lasso | lasso | Lasso m | kement |
| kenişt | synagoga | synagogue | Synagoge f | sinagog |
| ker | åsna | donkey | Esel m | eşşek |
| kereste | timmer | timber | Holz n | kereste |
| kerguh | kanin | rabbit | Kaninchen n | tavşan |
| kerkedan | noshörning | rhinoceros | Nashorn n | gergedan |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| kermêş | mygga | mosquito | Mücke f | sivrisinek |
| keskesor | regnbåge | rainbow | Regenbogen m | gökkuşağı |
| keştî | fartyg | ship | Schiff n | gemi |
| keştîkêş | bogserbåt | tug | Schlepper m | römorkör |
| keştîya barkêş | färja | ferry | Fähre f | feribot |
| keştîya bayî | segelfartyg | sailing-ship | Segelschif f | yelkenli gemi |
| keştîya Nuh | Noaksark | Noah'sArk | DieArcheNoahs | Nuhun gemisi |
| kevir | sten | stone | Stein m | taş |
| kevjal | krabba | crab | Krabbe | yengeç |
| kevjala dirêj | kräfta | crayfish | Krebs m | kerevit |
| kevok | duva | pigeon | Taube f | güvercin |
| kevoka nameber | brevduva | carrier pigeon | Brieftaube f | posta güvercini |
| kew | rapphöna | partridge | Rebhuhn n | keklik |
| kêç | loppa | flea | Floh m | pire |
| kêzberû | ollonborre | cockchafer | Maikäfer m | palamut |
| kêzik | insekt | insect | Insekt n | böcek |
| kilîtûkerseg | lås | lock | Schloss n | kilit |
| krîko | domkraft | jack | Wagenwinde f | kriko |
| kitabet | runsten | runicstone | Runenstein m | kitabe, anıttaşı |
| klarnet | klarinett | clarinet | Klarinette f | klarnet |
| kolan | sjörövare | pirate | Seeräuber m | korsan |
| kolîbrî | kolibri | humming-bird | Kolibri m | kolibri |
| komputer | dator | computer | Computer n | bilgisayar |
| koral | koraller | coral | Korall e | mercan, koral |
| koro | kör | chorus | Chor | koro |
| koremişk | mullvad | mole | Maulwurf m | köstebek |
| korsan | pirat | pirate | Pirat m | korsan |
| kowboy | cowboy | cowboy | Cowboy m | kovboy |
| ksîlofon | xylofon | xylophone | Xylophon n | ksilifon |
| kulî | gräshoppa | grasshopper | Heuschrecke f | çekirge |
| kulîlk (çîçek) | blomma | flower | Blume f | çiçek |
| kund | uggla | owl | Eule f | baykuş |
| kurebeşk | grävling | badger | Dachs m | porsuk |
| kurm | daggmask | earthworm | Regenwurm m | solucan |
| kurmûkêz | insekt | insect | Insekt m | böcek |
| kuvark | svamp | mushroom | Pilz m | mantar |
| kûkla | dockteater | puppet-show | Puppentheater n | kukla |
| kûsî | sköldpadda | tortoise | Schildkröte f | kaplumbağa |
| kûzeyêavê | bäver | beaver | Bibe r | kunduz |
| kûçik | hund | dog | Hund m | köpek |
| labîrent | labyrint | labyrinth | Labyrinth n | labirent |
| lampe | lampa | lamp | Lampe f | lamba |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| lazût | majs | corn | Mais m | mısır |
| legleg | stork | stork | Storch m | leylek |
| leopard | leopard | leopard | Leopard m | leopard |
| ling | ben | leg | Bein n | bacak |
| lîmon | citron | lemon | Zitrone f | limon |
| lîstik | lek | play | Spiel n | oyun |
| lokomotîv | lokomotiv | locomotive | Lokomotive f | lokomotif |
| lucia | Lucia | Lucy | Lucia f | Lusia |
| lûf | gädda | pike | Hecht m | turna balığı |
| madalya | medalj | medal | Medaille f | madalya |
| makyaj | smink | make-up | Schminke f | makyaj |
| maloka bûkikan | dockskåp | Dolls-hous | Puppenstube f | oyuncak dolabı |
| mammût | mammut | mammoth | Mammut n | mamut |
| mange | ko | cow | Kuh f | inek |
| manken | mannekäng | model | Mannequin m | manken |
| mar | orm | snake | Schlange f | yılan |
| marêboa | boaorm | boa | Boa f | boa yılanı |
| margîsk | huggorm | viper | Kreuzotte r | engerek yılanı |
| marîonet | marionett | puppet | Marionette f | kukla |
| marmasî | ål | eel | Aal m | yılan balığı |
| masî | fisk | fish | Fisch m | balık |
| masîyê harengus | sill | herring | Hering m | ringa balığı |
| maske | mask | mask | Mask m | maske |
| masûlke | muskel | muscle | Muskel m | kas |
| mazat | auktion | auction | Auktion f | açıkarttırma, mezat |
| medûcezîr | ebbochflod | tide | Ebbe und Flut | gelgit |
| mejî | hjärna | brain | Gehirn n | beyin |
| mertal | sköld | shield | Schild | kalkan |
| metro | tunnelbana | underground | U-Bahn f | metro |
| mewij | russin | raisin | Rusine f | üzüm |
| meymûn | apa | monkey | Affem | maymun |
| mêş | fluga | fly | Fliege f | sinek |
| mêşhingiv | bi | bee | Biene f | balarısı |
| mêweyên qaşilhişk | nötter | nuts | Nüsse(Nuss m) | kabuklu yemiş |
| mij | dimma | fog | Nebel m | sis |
| minminîk | fjäril | butterfly | Schmetterling m | kelebek |
| mirîşk | höna | hen | Henne f | tavuk |
| mirwarî | pärla | pearl | Perle f | inci |
| mişk | mus | mouse | Maus f | sıçan |
| mişkê hindî | marsvin | guinea-pig | Meerschweinchen n | kobay |
| mizgeft | moské | mosque | Moschee f | cami, mescit |
| mizirqe | munspel | mouth-organ | Mundharmonika f | ağız armonikası |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| mîgfer | hjälm | helmet | Helm m | miğfer |
| mîh | får | sheep | Schaf n | koyun |
| mîknatês | magnet | magnet | Magnet m | mıknatıs |
| mîkrofon | mikrofon | microphone | Mikrofon n | mikrofon |
| mîkroskop | mikroskop | microscope | Mikroskop n | mikroskop |
| mîx | spik | nail | Nagel | çivi |
| mîro | myra | ant | Ameise f | karınca |
| morîna | torsk | cod | Dorsch m | morina balığı |
| motorsiklet | motorcykel | motorcycle | Motorrad n | motorsiklet |
| moz | humla | bumble-bee | Hummel f | eşşekarısı |
| mozeqirt | geting | wasp | Wespe f | yabanarısı |
| muze | museum | museum | Museum n | müze |
| muzîk | musik | music | Musik f | müzik |
| navik | navel | navel | Nabel m | göbek |
| newroz | nyår | NewYear | Neujahr n | Nevroz |
| nexşe | karta | map | Kartef | harita |
| nexweşxane | sjukhus | hospital | Krankenhaus n | hastahane |
| neynûk | nagel | nail | Nagel | tırnak |
| nêçîrvanî | jakt | hunting | Jagd f | avcılık |
| nikul | näbb | beak | Schnabel m | gaga |
| nivîsgeh | kontor | office | Büro n | yazıhane, ofis |
| nivîskar | författare | author | Schriftsteller m | yazar |
| noqav | ubåt | submarine | U-Boot n | denizaltı |
| nota | noter | note | Note f | nota |
| org | orgel | organ | Orgel f | org |
| orkestra | orkester | orchestra | Ochester n | orkestra |
| otêl | hotell | hotel | Hotel n | otel |
| otobus | buss | bus | Bus m | otobüs |
| otomobîl | bil | car | Auto n | otomobil |
| palmiye | palm | palm | Palm e | palmiye |
| pel | blad | leaf | Blatt n | yaprak |
| pencere | fönster | window | Fenster n | pencere |
| pengûen | pingvin | penguin | Pinguin m | penguen |
| penîr | ost | cheese | Käse m | peynir |
| pepûk | gök | cuckoo | Kuckuck m | guguk kuşu |
| peqok | såpbubbla | soap-bubble | Seifenblase f | sabun kabarcığı |
| perav | strand | shore | Strand m | sahil |
| perçem | fana | banner | Fahne f | sancak |
| perdepenc | simhud | webt | Schwimmhaut f | perdeayaklı |
| pere | pengar | money | Geld n | para |
| perî | älva | fairy | Elfe f | peri |
| petêx | melon | melon | Melone f | kavun |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| peyamber | kurir | courier | Kurier m | ulak |
| peyker | staty | statue | Statue f | heykel |
| pezkûvîyê bakur | hjort | deer | Hirsch m | ceylan |
| pijandin | baka | bake | backe n | pişirmek |
| piling | tiger | tiger | Tiger m | kaplan |
| pire | bro | bridge | Brücke f | köprü |
| pirika mil | nyckelben | collar-bone | Schlüsselbein n | köprücük kemiği |
| pirtûk | bok | book | Buch n | kitap |
| pirtûkxane | bibliotek | library | Bibliothek f | kütüphane |
| pisîk | katt | cat | Katze f | kedi |
| pisûle/qiblename | kompass | compass | Kompass m | pusula |
| pişemasî | manet | jelly-fish | Qualle f | denizanası |
| pişik | lunga | lung | Lunge f | akciğer |
| pizirk | finne | pimple | Pickel m | sivilce |
| pîjame | pyjamas | pyjamas | Pyjama m | pijama |
| pîlot | pilot | pilot | Pilot m | pilot |
| pîramîd | pyramid | pyramid | Pyramide f | piramit |
| pîrebok | spöke | ghost | Gespenst n | hortlak |
| pîvazok | lök | bulb | Zwiebel f | soğan |
| pîyano | piano | piano | Klavier n | piyano |
| polîs | polis | policeforce | Polizei f | polis |
| ponî | ponny | pony | Ponym n | midilli |
| porteqal | apelsin | orange | Apfelsine f | portakal |
| postexane | post | post | Post f | postane |
| pûl | frimärke | stamp | Briefmarke f | pul |
| pûsel | pussel | jig-sawpuzzle | Puzzle n | bozyap |
| qahwe | kaffe | coffee | Kaffee m | kahve |
| qaz | gås | goose | Gans f | kaz |
| qelereşk | korp | raven | Rabe m | kuzgun |
| qerase | hävstång | lever | Hebel | kaldıraç |
| qeşabir | isbrytare | ice-breaker | Eisbrecher m | buzkıran gemisi |
| qijik | skata | magpie | Elster f | saksağan |
| qijnik | fästing | tick | Zecke f | kene |
| qiloç | horn | horn | Horn n | boynuz |
| qulik | gryt | burrow | Höhle f | delik |
| quling | trana | craneII | Kranich m | turna |
| qû | svan | swan | Schwan m | kuğu |
| qûle | fyr | lighthouse | Leuchtturm m | fener kulesi |
| radyo | radio | radio | Rundfunkgerät n | radyo |
| rastkêş | linjal | ruler | Lineal n | cetvel |
| ren | ren | reindeer | Renntier n | ren |
| rende | hyvel | plane | Hobel m | rende |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| rêz | rad | raw | Reihe f | satır, sıra |
| rêzeçîrokên wêneyî | serier | comicstrip | Comicstrip m | seri hikaye |
| rîh | skägg | beard | Bart m | sakal |
| rohot | robot | robot | Roboter m | robot |
| roj | sol | sun | Sonne f | güneş |
| rojbûn | födelsedag | birthday | Geburtstag m | doğumgünü |
| rojgîran û hîvgîran | förmörkelse | eclipse | Finsternis f | ay ve güneş tutulması |
| rojname | tidning | newspaper | Zeitung f | gazete |
| rojnamevan | journalist | journalist | Journalist m | gazeteci |
| roket | raket | rocket | Rakete f | raket |
| ronahî | ljus | light | Licht n | aydınlık |
| rontgen | röntgen | x-ray | Röntgendurchleuchtung f | röntgen |
| rovî | räv | fox | Fuchs m | tilki |
| saet | klockaI | clock,watch | Uhr f | saat |
| saksafon | saxofon | saxophone | Saxophon n | saksafon |
| sarincok | kylskåp | refrigerator | Kühlschrank m | buzdolabı |
| sauna | bastu | sauna | Sauna f | sauna |
| sebze | grönsaker | vegetables | Gemüse n | sebze |
| semasî | haj | shark | Hai m | köpekbalığı |
| serdema kevirî | stenåldern | stoneage | Steinzeit f | taşdevri |
| sêgoşe | triangel | triangle | Dreieck n | üçgen |
| sêv | äpple | apple | Apfel m | elma |
| simore | ekorre | squirrel | Eichhörnchen n | sincap |
| simoreya avê | utter | otter | Otter m | susamuru |
| sipîndar | björk | birch | Birke f | kavak |
| siwarî | riddare | knight | Ritter m | atlı,süvari |
| sî | skugga | shadow | Schatten m | gölge |
| sînema | bio | cinema | Kino n | sinema |
| sîrkus | cirkus | circus | Zirkus m | sirk |
| sîsalek | gam | vulture | Geier m | akbaba |
| sîsaleka keçel | eremitibis | baldibis | Waldrapp m | kelaynak |
| sîwan û parasol | paraply och parasoll | umbrella | Regenschirm m | şemsiye ve parasol |
| sîwêne (sîluet) | silhuett | silhouette | Silhouette f | siluet |
| skelet | skelett | skeleton | Skelett n | iskelet |
| slalom | slalom | slalom | Slalom m | slalom |
| sosina newalan | liljekonvalj | lilyofthevalley | Maiglöckchen n | zambak |
| sitêrka bidûvik | komet | comet | Komet m | kuyruklu yıldız |
| stetoskop | stetoskop | stethoscope | Stethoskop n | stetoskop |
| şah | kung | king | König m | kıral |
| şano | teater | theatre | Theater n | tiyatro |
| şanoya kasper | kasperteater | Punch and Judy show | Kasperle theater n | kukla tiyatrosu |
| şefê orkestrayê | dirigent | conductor | Dirigent m | dirijent, orkestra şefi |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| şekir | socker | sugar | Zucker m | şeker |
| şempaze | schimpans | chimpanzee | Schimpanse m | şempanze |
| şerîf | sheriff | sheriff | Sheriff m | şerif |
| şewqe | hatt | hat | Hut m | şapka |
| şeytanok | snäckor och sniglar | snails and slugs | Schnecken (Schnecke f) | salyangoz |
| şêr | lejon | lion | Löwe m | aslan |
| şikeft | grotta | cave | Grotte f | mağara |
| şivan | herde | shepherd | Hirt m | çoban |
| şîr | mjölk | milk | Milch f | süt |
| şofêr | chaufför | driver | Chauffeur m | şoför |
| şopger | scout | scout | Pfadfinder m | izci |
| şûl | rådjur | roe | Reh n | karaca |
| tac | krona | crown | Krone f | taç |
| taks | tax | dachshund | Dackel m | taks köpeği |
| taxûk | kälke | sledge | Schlitten m | kızak |
| teker | hjul | wheel | Rad n | tekerlek |
| telefon | telefon | telephone | Telefon n | telefon |
| teleskop | teleskop | telescope | Teleskop n | teleskop |
| terazû | våg | scales | Waage f | terazi |
| termê maxîr | Karlavagnen | Charles's Wain | Der Grosse Wagen | Büyükayı |
| termos | termos | thermosflask | Thermosflasche f | termos |
| tewl | stall | stable | Stall m | hara |
| tevnepîrik | spindel | spider | Spinne f | örümcek |
| teyrê tawis | påfågel | peacock | Pfau m | tavuskuşu |
| tilîşop | fingeravtryck | finger-print | Fingerabdruck m | parmak izi |
| tirî | vindruva | grape | Weintraube f | üzüm |
| tirîfringî | krusbär | gooseberry | Stachelbeere f | frenk üzümü |
| tîmseh | krokodil | crocodile | Krokodil n | timsah |
| tîmar | rykta | groom | striegel n | tımar |
| tîp | bokstav | letter(of the alphabet) | Buchstabe m | harf |
| tîrkevan | pilbåge | bow | Bogen m | \|ok\|yay |
| tîtav | fasan | pheasant | Fasan m | sülün |
| to/qeymax | grädde | cream | Sahne f | kaymak |
| tombala | lotteri | lottery | Lotterie f | tombala |
| tor | nät | net | Netz n | ağ |
| torik | håv | landingnet | Kescher m | av kepçesi |
| tov | sädesslag | cereal | Getreideart f | tohum |
| tov/toxim | frö | seed | Samen m | tohum |
| traktor | traktor | tractor | Traktor m | traktör |
| trampet | trumpet | trumpet | Trompete f | trampet |
| tunel | tunnel | tunnel | Tunnel m | tunel |
| tûtî | papegoja | parrot | Papagei f | papağan |

| Kurdî | Swêdî | Îngilîzî | Almanî | Tirkî |
|---|---|---|---|---|
| tv | teve | television | Fernsehen n | tv |
| unîforma | uniform | uniform | Uniform f | üniforma |
| vaftîz | dop | baptism | Taufe f | vaftiz |
| vampîr | vampyr | vampire | Vampir m | vampir |
| veterîner | veterinär | veterinairian | Tierarzt m | veteriner, baytar |
| veşartok | kurragömma | hide-and-seek | Versteck m | saklambaç |
| vîkîng | viking | viking | Wiking m | Viking |
| vînc | lyftkran | craneI | Kran m | vinç |
| vîrus | virus | virus | Virus n | virüs |
| volkan | vulkan | volcano | Vulkan m | volkan |
| waha | oas | oasis | Oase f | vaha |
| xardoz | fil | file | Feile f | eğe |
| xewn | dröm | dream | Traum m | rüya |
| xiyar | gurka | cucumber | Gurke f | hıyar, salatalık |
| xoz | kotte | cone | Zapfen m | kozalak |
| xwê | salt | salt | Salz n | tuz |
| xwişk û bira | syskon | brothers and sisters | Geschwister | kız ve erkekkardeş |
| xwîn | blod | blood | Blut n | kan |
| zad | sädesslag | cereal | Getreideart f | tohum türü |
| zarokxane | dagis | daynursery | Kindergarten m | kreş, çocukyuvası |
| zebra | sebra | zebra | Zebra n | zebra |
| zêr | guld | gold | Gold n | altın |
| zibil | gödsel | manure | Mist m | gübre |
| ziman | tunga | tongue | Zunge f | dil |
| zirfistiq | jordnöt | peanut | Erdnuss f | yerfıstığı |
| zirneûbilûr | zurna(flöjt) | zurna(flute) | Zurna (Flöte f) | zurnavekaval |
| zirx | sköld | shield | Schild m | zirh |
| zîperdasî | makrill | mackerel | Makrele f | uskumru |
| zîpik | hagel | hail | Hagel m | dolu |
| zoo | zoo | zoo | Zoo m | zoo, hayvanat bahçesi |
| zurafe | giraff | giraffe | Giraffe f | zürafa |

# Ansîklopediya Zarokan



Di vê Ansîklopediya Zarokan de nêzî 500 peyv û gotin hene ku li gor rêza alfabeyê hatine rêzkirin. Hemû peyv û gotin jî li gor cîhan û fantaziya zarokan hatine hilbijartin. Di her rûpeleke vê ansîklopediyê de rêza alfabeya kurdî heye û tîpa aktuel li ser vê rêzê bi rengekî din hatiye nîşankirin. Ev jî ji bo zarokan hêsan dike ku tîpa alfabeyê baştir bibînin û nas bikin. Girêdana wêne, peyv û tîpan alîkariyê dike ku zarok zûtir serwextî zanînê bibin.







Ansîklopediya zarokan berî herkesî ji bo zarokên dema dibistanê ye, bi taybetî jî yên salên destpêkê.



ISBN 91-89675-32-0